


Çirûsk

ISSN 1307-637X

kovara hunerî û ramanî
sal: 4, hejmar: 11, buha: 5 tl.
Çile-Sibat-Adar-Nîsan 2011



**Bi Keça Mîr Celadet'î Sînemxan'ê Re
Li Ser Bayê Wê Hevpeyvînek**



**Li Ser Wêjeyê bi Nivîskar
Ferhad Pîrbal'î re Hevpeyvînek**

Kelegiriyên ji bo Simbilên Neserridî/Hamid Omerî
Piyesa Çîrokekê/Hesenê Metê
Bîr-Çîroka Metoyê Dîn-/Bawer Ronahî
Di Helbestê de Çirûskîzm/Janez Sar
Medos û Maçên Mîtolojîk/Cîhan Roj



RONAHÎ



*Xwedî û Gerîndeyê Berpirsiyar Mîr Celadet Alî Bedir-Xan
Directeur Propriétaire Emir Djêladet Aali Bedir-Khan*

belkî

"Weşanên Belkî"yê
Ronahî, dîrok, 584 rûpel - edîsyona taybet 55 tl

Kooperatifler Mah. Tren Yolu Sk. Bağiran Apt. No: 1 Ofis/Diyarbakır
Tel&Fax: (0412) 224 47 72 e-mail: cirusko@hotmail.com
www.wesanbelki.com



Beytik
Yeqîn h.
"Helbest"

Ûbelkî

Çirûsk

Kovara Hunerî û Ramanî ya Çar Mehanê
Sal: 4 Hejmar: 11
ISSN 1307-637X

Li ser navê 'Belki Basın Yayın Dağıtım'ê
xwedî û berpirsiyarê karê nivîsan:
Mehmet Vahit Güneş

Direktor: Rênas Jıyan

Redaksiyon: Kovara Çirûskê
Şewirmendê Hunerî: Serkeftî Botan
Belavkirin: Rojîn Xewn
Berg-Grafik: Asya Genim
Wêneyê Berga Paşin: Marcel Duchamp

Çap: Kayhan Matbaacılık,
Davutpaşa Cad. Güven San.
Sit. C. Blok No: 244
Topkapı İstanbul Tel: (0212) 612 31 85
Navnîşana Kovarê: Kooperatifler Mah.
Tren Yolu Sk. Bağrın Apt.
No: 1 Ofis-Diyarbakır
tel&faks: (0 412) 224 47 72
e-mail: cirusko@hotmail.com
www.kovarcirusko.com

Mercên Abonetiyê: Ji bo salekê,
li nav welêt: 30 tl,
li derveyê welêt: 30 Euro.
Buhayê li welêt 5 tl,
yê li Ewropayê 5 Euro.
Hesabê Banqeyê: Ziraat Bankası,
Diyarbakır- Ofis Şubesi,
No: 1150 11055747-5002
Hesabê Posteyê:
E. Avcı, Hesab No: 1276608

Ji bo kovareke biqalîte û bedew
"Çirûsk" her ji çar mehan
carekê tê weşandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe
berpirsiyar e.
Ji xeynî nivîsên ku
li ser rêzimanîya wan
bi nivîskarên wan re
şewr hatiye danîn
hemû nivîs li gorî
pîvanên kovarê tên redaktekirin.
Nivîs û alavên ku
ji kovarê re hatibin şandin
biweşîn neweşîn ji
bi şûnde nayên vegeandîn.
Bi şertê ku çavkanî
bê diyarkirin
jêgirtina ji kovarê serbest e.




"Weşanên Belkî"yê
Çile-Sibat-Adar-Avrêl 2011

4/Kelegiriyên ji bo Simbilên Neserridî/Hamid Omerî
5/Kî Dizane Huner Çi ye?/Fewzî Bîlge
9/.../Diyarî Asur
10/Hestên Naylonî/Feratê Dengizî
13/Betalî/Bêzar Germ



14/Piyesa Çîrokekê/Hesenê Metê



17/Marcel Duchamp û "Ready-Made"/
Asya Genim

23/Hevdîtineke Kaotîk/Robîn Şerna
24/Çirûskên Nûjeniyê di Helbesta Bakur de -Mem
Ronga-/Berken Bereh



28/Bi Keça Mîr Celadet'î Sînemxan'ê
Re Li Ser Bavê Wê Hevpeyvînek

32/Xerîbek li Gundê Me /Yunus Eroğlu



Paul Eluard

37/Hêvî/Paul Eluard

38/Bîr-Çîroka Metoyê Dîn-/Bawer Ronahî
42/Li Malê.../Marîn Rehman
43/Şeva ku ji Her Şevan Reştir/Çîdem Baran
48/Karwanên Stêrkan /Jan Ziryan
49/Kuşîna Cerdonekî/Şengul Oğur

52/Modernîzm 2/Sîdîq Gorîcan

54/Ravek/Bahoz Baran

60/Bûka Qelen Qelew/Bîrbir Birûsk Aryan

61/Di Helbestê de Çirûskîzm/Janez Sar

63/Xew(n)a Li Berojka/Înan Eroğlu

65/Xalê Zilfo/Wehab Mistefazade

68/Xanax/Janbijan Ar

69/Girrê Xwedê/Bajar Mîrzeman



71/Li Ser Wêjeyê bi Nivîskar Ferhad
Pîrbal'î re Hevpeyvînek

75/Medos û Maçên Mîtolojîk/Cihan Roj

78/Anatomiya Aciziyekê/Rojîn Xewn

81/Xezo/Seydo Ozkan

82/Kurdîaxivîn/Sadiq Şen

84/Jarê/Umît Esen

85/Dê û Kur/Ehmed Osman

87/Bi Nêta Cenabet-hildanê Berê'm li Şî'îrê/
Kenanê Nado

88/Otmeyên Hêviyê /Ar-da Janxwar

91/Çavê Mirinê/Nazê Yerlîkaya

92/Tu û "Xwe" ya Te/Hecî Nehsan

94/Marka/Rênas Jiyan

Kelegiriyên ji bo Simbilên Neserridî

Hamid Omerî

çavên bira û xwişkên min
ji bo simbilên
ku ji devên mekîneya çinî nê xelas dibûn
digeriyan li ber destarê aşê
dayika min şekir wer dikir bi ser nanê birûn de


Çirîşk
4

ji ber ku bi vê yekê zanibûn
zikê patosan têr nedibû
zarokan ew nedidane ber kevîran
lê mekîneyên çinî nê direviyan
û bav li pey wan zarokên xwe
yên hê ji dayiknebûyî
li rêya esfalt dinihêrî

cêrrekê, têra şev û sibehê dikir
lê ji bo xwînêrêta dûşîzeyên
di goran de her dayik
li derbasokê bi destên xwe yên
ku patosan xwaribû ji bo simbilên neserridî digiriyan

qenewîçe çênedikirin
wan keçên ku li ser xaniyan tepik çêdikirin
û tevrikên wan ên tûnc ku li erdê diketin
ew cêrra ku bi aliyê xwe yê şil ve botav dimijand digiriya

ê de ka bibêjin ji min re
çavê kîjan keça ku ji bo çawîşan zebeşî hûr dike
êrîşî etaran nekir
û wan bavên ku li esfaltan dinihêrî
bi piştre çend caran fistanên sor li çavên xwe kirin



Kî Dizane Huner Çi ye?

Fewzî Bîlge

Alavên jêner çên wêneyî -wênesazkirinê; xêz, form, reng, şewq, giyan, hest, tevn û vehûnck in.

Ev alav ji bo wêneyekî giş ji girîng in. Heger di wêneyekî de xêz tune be -êşkere an bi dizî- bi form jî nabe, heger form tune be boyax bêkêr e, boyax tune be şewq jî pêk nayê û wênesazek bêtî wan nikare tevnan bike. Heger tevn -kompozîsyon- jî tune be hest xwe berra nava wan nade û bê giyan dibe. An jî mirî dizê.

Çirîşk

5

Wênesazan di pêvajoya hunerên şewekarî de gellek şewaz afirandine û di wan şewazan gişan de ne ewqasî êşkere be jî ji wêneyên klasîk heya yên kubîk ev alav bi kar anîne.

Di çend şewazan de weke ku ev alav tune ne xuya bibin jî di bingehê de wan ev peywirên xwe spartine çavî. Di vê nêzîkdayîna wêneyan de xêz ne xuya bin jî çav wan çêdike, li ber çavên mirovan weke ku hebin xuya dibin. Wênesazên Abstraksiyonîst (Razberparêz) ji bo ku forma heyberan li wêneyan bifesilînin wan xwe avêtiye deformasyonan. Heyber herku çûne razber kirine. Wan bi tenê şûna heyberan hiştiye, lê ev şûnên ku mane jî biqasî wan, belkî ji wan bêhtir jî rola xwe pêk aniye; razberparêzan nexwestiye ku wêneyên heyberan bi hêsanî bê fahmkirin an jî siruştê weke ku tê xuyanî biwênin. Loma jî ji xêzan dûr ketine. Lê ev nayê wateya ku wan xêz red kiriye. Wan wêneyên xwe dîsa bi saya wan alavên din wêrandine, bi tenê wan xêz spartiye çavên temaşevên. Çav jî -çavên perwerdekirî- bi alîkariya êqîl ev bi ruh kirine û ji loma jî wêneyên razber jî biqasî wêneyên klasîk bandor li bîneran kiriye.

Di pêvajoya hunerên şewekarî de wênesazan herdem şewazên nû afirandine. Her şewazek bi felsefeyekê jiyaye, heya demekê li ser civakan wan bandora xwe kiriye û wan dewsa xwe daye şewazeke din. Heger em xêzan red bikin, an wêneyên serkeftî bi tenê weke yên bê xêz bibînin, an jî em xêzan weke asêbûnê binirxînin ev tê wateya ku çî şewazên ku hatine afirandin -bikaranîn- û rola xwe ya li ser civakê listine red bikin. Wêne an jî wêneyê bikêrhatî heger em bi tenê yên piştî salên 1911'ê, ango piştî razberparêzan bihesibînin. Ev ne rast e, têkçûyîna êqîl e. Ji ber ku divê em şewazên gellekî girîng ên ji -Klasîzmê, heta Empresyonîzmê, Kubîzmê, Ekspresyonîzmê, Realîzmê û hwd gişan tune an têkçûyî bihesibînin.

Her şêwazek li gorî şert û mercên civakê -ûîrokê- dertê û bandora xwe li gişî beşên hunerê yên din dike, ev beşên hunerê yên din jî bandora xwe li civakê dikin. Mesele meseleya diyalektîka civakê ye. Her civak -hunermend- li gorî pêşketinên xwe, ji gel-lek bizavan sud werdigire an diafirîne.

Huner jîndar e. Ji roja ku mirovatiyê dest pê kiriye û heya niha herdem li gorî şert û mercên ku dijîn mirovan pênasêya hunerê kiriye. Weke encam mirov dikare bibêje ku a niha -di hunerên roja me de- ne tenê xêz, hema hema alavên hunerên şêwekarî ji teref hunermendên têgehparêz ve giş paşguh tê kirin. Ev jî helwestek e û jixwe tukes nikare rê li ber bigire, ji ber ku ev êdî hunereke din e, ne hunera şêwekarî ye. Hunera şêwekarî wê lêgerînên xwe yên xêz, form û rengan bidomîne, ew ê bi tumerî dev ji alavên xwe yên xwe pê heyî kiriye bernede. Wê carinan ji wan alavan hinekan derxin pêş, hinekan biavêjin paş. Huner razber be jî, şênber be jî wê xêz hebe. Heger mesele bi tenê fikr be di vegotina fikran de heger alav ne girîng bin û ewqasî guherbar bin wê dema wateya beşên hunerên ku wan ji hev du cuda dikin jî namîne.

Tu beşên hunerê, alavên ku xwe pê heyî dike nikare bi tumerî paşguh bike, lê dikare forma wan alavinan biguhere. Armanc heger bi tenê ragihandina fikran be wê çaxê em dikarin bêjin ku tu alavên tu beşên hunerê din jî ne girîng in. Weke mînak; hunerên têgehî dikare ji alavên beşên hunerê yên din xwe xwedî bike û dike jî.

Girav
6

Bê çawa sînema demekê ji bo ku bigihîje rêjeya wêje an hunerên şêwekarî xwe diçirrand û dawîya dawiyê gihîşt wê rêjeyê û jê gellekî bihurand. A niha jî hunerên şêwekarî û wêje dixwaze ku qet ji tunc de ewqasî di bin siya sînemayê de nemîne. Xetereya herî mezin ya hunermendên şêwekar ne jî bo ku bigihîjin sînemayê hewl didin, berovajiyê wê jî bo ku bibin sînema hewl didin. Ev jî tê wateya ku xwe, ango beşên ku xwe pê heyî dikin red bikin. Ji ber ku li holê êdî wêne namîne, ya ku xuya ye êdî sînema, tv an beşeke din a hunerê ye.

Sînemayê weha nekir, gişî alavên beşên hunerê yên din -wêje, muzîk, wêne, şano-di nava xwe de mehand an jî mirov dikare bêje ku hêza wan xist nava hêza xwe û bi hêztir bû. Ewqasî bi hêz bû êdî bûye sedemeke herî girîng ku di roja me de -bi taybetî jî li welatên bişûndemayî- bibe sedema wêne neyê temaşekirin, wêje -pirtûk nayên xwendin - neyê kirin. Li welatên bişûndemayî ne temaşekirin- ne şopandin û ne pêşketina hunerên şêwekarî û wêjeyê sedema herî girîng pirr û ne rast temaşekirina televîzyonê ye. Ji ber ku televîzyonê jî sînemayê behtir zergava xwe fireh kir, ji bilî beşên hunerê gişî beşên hunerên din jî û sînema jî di nava xwe de mehand û bê çawa sînemayê wêne û wêje ji desthilanîn de xistin hema hema televîzyonê jî yek tişt anî serê sînemayê û bû amûra herî serdest, ket her qul û qefesê. Gellek bernamêyên ku naveroka wan vala mirovên ku lê temaşe dike wan -hem giyanî, hem fizîkî- ditevizî-ne; ji hunerê, ji xwe û ji pirsgirekên xwe û civakê bi dûr dixê, mirovên klîşe û tirral diafirîne.

Welatên pêşketî bela ku hîn berî tv bikeve navenda jiyana wan çanda wêje, wêne û wênesaziyê baş xerab ketibû jiyana wan; temaşekirina wan ya tv û siruştîye bandora wê ne biqasî ya welatên bişûndemayî be.

Ji sedemên tv li welatên mîna yên me bêhtir neyînî bandorê dike çend jê;

-Naveroka bernameyên televîzyonê.
 -Nêzikdayîna serdestan a li girseyan.
 -Pêşketin an pêşneketina kesayetên mirovan, angû zergava têkiliyên wan ên bi hunerê re dibe sedem ku girse an kes bitevizin

Bandora televîzyonê li ser welatên ku diyalektîka wan nehatiye şikenandin -pêvajoyên hunerê normal jiyane- li ser wan evqasî bandoreke neyînî nake. Lê ji bo yên din bi tumerî sedemeke herî girîng a têkçûyîn, bişûndemayîn, ne şopandin, pêşneketina wêje û hunerên şêwekariyê ye. Gellek beşên hunerên din jî ev aqûbet jiyane yên mîna şano, dans û hwd.

Li welatekî bişûndemayî bandora televîzyonê ya neyînî herî hindik li ser rewşenbîr û hunermendan dike. Ji ber ku rewşenbîr û hunermend ji derveyî klîşeyan ji hêla zanebûna hunerê ve ne weke kesekî jirêzê ne. Lê di şa jî bandoreke pirr neyînî li wan dike; ji ber ku girseya ku pirtûkan bixwînin an wêneyan bişopînin nabînin. Bi kurtasî tv bûye amûra neyînî a herî girîng ku nahêle wêje û wêne rola xwe bilize, pêş bikeve û bandora xwe li civakê bike. Ev bandor dawîya dawîn li ser wêjekar û wênesazan jî bandoreke neyînî dike; berî hertiştî wan demoralîze dike. Ji ber tunebûna xwîner û bîneran gazinan dikin û berhemên wan bê bandor dibin. Di pêvajoya dirokê de pêşneketina hunerên şêwekarî gellek sedemên wê yên weke siyasî, olî, neteweyî, civakî, aborî hene. Ev giş jî bi rastiya xwe ve rast in, lê di roja me de sedema pêşneketina hunerên şêwekarî û wêjeyê pirr çêkare mirov dikare bibêje ku tv ye.

Çirîk
7

Tv heger ji teref, kes û sazûmanan ve baş bê bikaranîn amûreke baş e, lê heger ne baş bê bikaranîn amûreke huner kujer, raman kujer, liv kujer, hest kujer, kesayet kujer e. Angû bêhtir li welatên bişûndemayî hêza hunerên din gişî di xwe de dicivîne û wan jî hêz de dixê.

Hunermend di welatekî normal de hêza tv'yê ji bo pêşketina beşên xwe bi kar tînin, lê ev yek ji bo me îroj ne gengaz e. Siyasetmedar, pîrsgirêkên siyasî û aborî ewqasî pirr û di rojevê de ne zû bi zû dor nagihîje hunermend û berhemên wan. Angû hunermend nikarin berê çeka tv'yê bidin wê.

Di hêla tê xuyanî de tv weke amûreke politîzebûn, hunerhezî, civakîbûn û hwd pêk tîne xuya dibe lê ne rast e. Berî tv bikeve navenda jiyana mirovan girseyan hinekî din zor dida xwe ku hunerê bişopînin. Ji bo pêdiviya ruh, fikr û ramanên xwe baş xerab li hunerê digeriyan. Di pêvajoyeke weke a niha de divê bêhtir lê bigeryana! Lê, lê nagerin. Di demên herî dawîn de jî vê mîsyona xerab amûrên teknolojîk û ragihandî-nê yên weke înternetê girtiye ser milên xwe û ew jî gişî beşên hunerê -wêne, wêje, sînema, tv, radyo, telefon, rojname û hwd gişî di nava xwe de mehandiye û mîna tv'yê jî alî girseyên wê bêhtir ne baş tê bikaranîn. Ew jî mîna tv'yê dikare pirr baş jî bê bikaranîn.

Heya niha tukesî huner biqasî ku herkes li ser pênasayên ku hetine kirin sedîsed li hevdu nekiriye. Ev pênasayên ku hatine kirin heger çend kesan pejirandibe jî çend kesan jî nepejirandiye. Xuya ye ku wê tucarî û tukes nikaribe hunerê weke ku herkes

pê têr bibe pêname bike. Gellek sedemên vê yekê hene, mirov dikare gellek xalan di binê hevdu de rêz bike û sedemên wê an jî çend sedemên girîng bipeyitîne lê peyitandina girîng û sereke; jîndarbûna hunerê ye. Bela ku huner weke her tiştên li gerdûnê yên jîndar kêlî bi kêlî diguhere nêzîkbûyîna hunerê jî ji roja ku hunerê dest pê kiriye û heya niha guheriye û wê her biguhere. Ji ber wê jî mirov dikare bêje;

Pênaseyên hunerê demdemî ne, herku dem digere pêname jî diguhere. Ev pênaseyên ku heya niha hatine kirin giş jî bo demekê ne. Belkî jî bo wan deminan derbasdar bûn jî. Pênaseya hunerê çawa ku herdem diguhere —lênêrîna— nêzîkdayîna mirovekî jî diguhere. Kesekî ku demekê berhemeke hunerî pirr bipejirîne di demên pêş de dikare wê berhema ku pejirandibû nepejirîne. Ev rewşa hanê li gorî zergava têgihîştina mirovan diguhere, kesekî ku xwe bi pêşde nebiribe heya û heya dikare yek berhemê, berhemek nebaş jî bipejirîne.

Pênaseyên hunerê yên ku ji alî hunermendan ve bi xwe hatine kirin û pênaseyên ku ji bilî hunermendan hatine kirin ferqên beloq hene. Pênaseyên ku ji alî hunermendan ve hatine kirin; hest û helwestên wan ên li hemberî jiyane bêtir giraniya xwe rê dide, pênaseyên hunerê ku kesên ji derveyî hunermend —rexnegir, siyasatmedar, hunerhez û hwd— hatine kirin jî; bêtir daxwazên wan yên li hemberî guherînê jiyane an berjewendiyên wan hene.

Çirast
§

Carinan jî bo berhemekê kesek dikare bibêje ku ev bêhempa ye, lê hinek an jî kesek napejirîne. Carinan jî jî bo berhemekê jirêzê jî gellek mirov dikevin nava kelecaneke û gellekî dipejirînin.

Heger mirov mînamekê jî wêjeyê bide; çîrokeke baş ne bi tenê li gorî naveroka mijara ku bi kar aniye baş an jî ne baş e. Çîrokek di hêla mijarê de dikare pirr sivik xuya bibe, weke mînak; mijar dikare bi tenê moristaneke, pelek daran, an tiştêkî mîna wan be lê heger tevî, teknîk, ziman, derûnî, karakter baş hatibin danîn û hûnandin dikare pirr baş be. Carinan tiştêkî pirr girîng gellek mirov nabinin û heger nebînin wê berhemê tune dihesibînin. Di wêneyekî de ev dikare şewê, teknîk, reng an jî transên rengan bin. Gellek kes di her tabloyê de tenê li mijarê digerin. Xurtbûna mijarê wêne xurt nake û divê xurtbûna mijarê tucarî nebe sedem ku hêlên wê yên din neyên xuyani.

Weke encam; kes tam nizane ku huner çi ye, lê gellek kes baş dizanin ku tiştêkî baş û hewce ye. Wê hîn gellek pênaseyên hunerê bêne kirin. Rast an jî ne rast têr an jî netêrbûna wan nîqaş bibin.


Heger rojekê mirov karibin pênaseya hunerê bikin û ew pênase mayînde bibe divê bê fahmkirin ku êdî huner mirî ye, an jî jiyana rawestiyaye.

...

Diyarî Asur

trajediyeke mezin e jiyan û em mecbûr in ku tê de bilîzin. absurd e. bêcîrr e. serhişk e. weke simbilên geniman e. rasthatinî ye. helbesteke dirêj û romaneke bêdawî ye.....

jineke bêçare, mêrekî bêwijdan e. zarokeke bêar e....acizî ye.....hêsir e. tu bibêjî çi ew e. erzan e.....li cem me belaş e.....tenûreke dadayî ye... dilekî sinicirî ye..... pîreke jibîrbûyî.....kalekî kêş e.....zimandirêjî ye.....bişirîn e lê ne ken e.....xaniyekî bêderî ye.....bêxewî ye carinan jî bêrîkirin e.....dûrbûn e... hemû têgehên nexweş ên ferhengan e.....ferhengeke bêlîsan e..... zimanekî bêînsan e.....tabloyeke bênav û xwelî ye..... xweliya sor e.... darbestek e....çavên şîn, kesk, reş û qehweyî ye..... kenekî jî aciziyê ye.....ez im, tu yî, ew e.....di heman demê de ne tukes e.....bêkes e.....cerabeyeke bêencam e..... şanoyeke bifîguran e.....şev e, bêdawî ye, nediyarî ye.....qurtek şeraba sor e.....offffffff bê dawî ye.....rêwitiyeke bênavnîşan e.....çûkeke basko ye. rabirdûyeke jibîrbûyî ye... dîrokeke jibîrbûyî ye.....



Hestên Naylorî
Feratê Dengizî

Girêsk
10

Em di nav jiyanê neecêb de ne. Ecêbî hatiye fêhmîkirin, hatiye verşandin û em ji ecêbiyê derbas bûne. Êdî tûtişt ne ecêb e. Derdê me asas e; em bi duyemîn, bi tiştên duyemîn re naewirin. Zemanê me tune ye... Eceleya me heye, jixwe em têra xwe dereng mane. Em di demeke zêrîn de ne ku ajaltî jî mêtî ve li paş maye, tîrêjên rojê yên zerîn di dema xwe ya herîn hilberîner de ne; dema ku xweşî dibe sedema zayîna hêja û pîroz e, ev dem... Pîrbûn, zêdebûn û hilberîn. Em bi sedema asas a jiyanê re, bi xweseriya wê ya asas re, bi Xwezaya dayik re bi tena serê xwe ne...

Birra, ajaltî jî bo me mirovan li paş maye gelo..? Em hêvî dikin ku êdî jî bo taliyan hev nagiruwînin, nakevin qirrika hev û hev naxeniqînin.

Kevz, yekçavî jî oksîjenê çêbû û ew xwar. Pîrçaviyan jî yekçavî, hertişt bi amînosîtan xwedî bû! Masî jî jî kevzê; kevz jî xwar jixwe bê okjîjen nikaribû, nikare bijî; jî avê ve dize; ava ku hertişt jê çêbûn û ew xwarin û vexwarin... Paşê! Paşê giha, dar û ber tev, tev jî çî çêbûn wan ew xwarin û vexwarin. Ajal, balinde, teyr û tilûr tev; jî çî çêbûn ew xwarin û vexwarin; giha, goşt, xwîn, av, oksîjen, hewa. Mîrov jî wisa; jî çî çêbû ew xwar û vexwar; jî ajalên zêde bû, çêbû û ew xwarin! Goşt jî, giha jî bû xwarin û av, avî vexwarin. Ma gelo dora çî ye? Yê/a ku wê jî mirovî zêde bibe, jê çêbibe û wî/ê bixwe!!?? Gelo jî bo wê mirov mirovî dixwe...!? Yanî mirovxwir jî mirov e!

Ûûûf... Serê min êşiya.

Emrê daran jî qaşilkên wan ên ku her sal girêdidin tê fêhmîkirin; jî sînore movikan tê destpêkirin, tê hejmartin û herdem jiyan di wan sînoran de ye. Gelo sînor çiqasî tenik an jî fireh e, yan jî aydî kîjan demê ye. Hişê zemên, ê demê heye gelo, yê wî sînorî!? Em her buhayî didinê yan jî nîrxandina vê jî me ye.

Heman tişt jî bo dinyayê jî wisa ye. Dinya jî dareke kevnar û kal e, di eslê xwe de. Em li ser qaşilkê wê, li ser qalikê wê; li wî sînore tenik û zirav dijîn. Bi rastî jî jiyan û hawirdora guncan î hilberîdar li wî sînore herku diçe zirav dibe ye. Baş e, hêza ku wî sînorî xwedî dike çî ye? Em bikolin hûn dixwazin. An jî em weha bibêjin; Hê mezell! Biaxe! Tiştên ku tu dizanî bibêje. Çend mirov, çend cesed di heman cihî de hatin veşartin, li ser hev, bi ser hev de. Ma bi rastî jî riziyan! Weguherîn çî.. wan bi aramî li hev kir gelo? Ma nasnameyên wan hebûn; te li pasportên wan filan pirsî? Med, Iskît,

Pers, Armen, Asûrî, Kurd yan jî biyanî... kî xwecî kî xerîb. Lê yên ku xwecî mîna zibilî bi kar anîn...! Birra zibil çi ye, û bi rastî kî bûn zibil, kî...!? Te got mirî bêhtir li hev dîkin û aram in? Wey, yanî bêhiş ên ku aqilê wan tune ne hê bêhtir hilberîner in, berhemdartir in? Hilberîna xwezayî ev e, te got...!? Dengê xwe bilind bike, ez nabihîzim. Hişê min ranagire. Kulîlkên herî xweşik, xweşikiyên nesexte, ne çêkirî, bêhn, mehdên, zad, tiştên ji jiyanê re lazim in giştik, amînoasît, mîneral û herweha... Tev wisa têne afirîn? Dayika me Xweza wisa hildiberîne û dilê me bi hestên rasteqîn dadigire ji van pêkhatiyên înorganîk... Yanî rastî, rasteqînî di hişmendiya bêhestîtî û bêhişiyê de hê bêhtir hestiyar û hê rastir pêk tê? Xwe diafirîne, hildiberîne...

Namezixîne...

Jiyana pirrxweş û hêja di wî sînore ziravî pirr tenik de, wisa xweşaheng; cur be cur, bi têkelbûna hezar cure xweşikayî... Ev şanseke bêhempa ye û zor bi dest dikeve, lê mirov çiqasî qedrê vê dizane, te got! Hezkirina rastîn, ya bi rastî, dilînî; hestên herî insanî li wir.

Qedexe, înkâr, kokqeliandin tune, ne wisa!?

Av, tu bûyî şahidê çi û ne çi, di vê vedoriya gerdûnî, di vê dewrî alemê de. Wisa ber bi bêdawîtiyê ve, ber bi bêrâbirdûyê, bêpêşerojîyê de, biherikînê de yan jî herikîna rastiye de...!

Erê, min fêhm kir. Êş hildiberînin; hildiberînin rastiye, xweşî û xweşikiyê û evînê. Êş berhemdar in.

Hertişt aydî dahatûyê ye. Tevayên armancan, hewldan û hezkirin tev ji bo dahatûyê ne, yên dahatûyê ne. Jiyan dahatû ye! Ji bo vê dilopek av, tasek av, deryayek e. Ew e yê ku derya afirandiye û di hundirê xwe de dihevwîne deryayê, mîna rasteqîna jiyanê, mîna xweşikî û tehma wê. Bê av jiyan tune ye. Baş e, hişmendiya di wê de jî gelo li ser înkâr û tunekirinê ava bûye? Naxwe, lihevkirina ya/ê ku dişewitîne û dişewite ye!? Ma tu bihevrebûna guncaniya du zitan î?

Dayika axê çi dibêje!?

Cihê ku şopa lingên me lê nîn e tune ye. Her gav axa me ye. Û em ax in. Kevirekî ku me pê lê nekiriye tune; kevirekî ku me ked, xwîn û xwêdan nedayiyê... Em bi keder, êş, ked û hêviyê xwedî bûn, vejînî û gihan bêmîrinê. Em axa bêmîrinê ya nemîrinê ne. Û em diherikin dahatûya bêmîrinê. Em bi sedemên esil re dilebikin, diherikin armanca esil, bi coşa germahiya "Roj" a xwe. Ez rast im, rasteqîn im, em rast in û rastiye dijîn. Rastî ax e. Cihê herî amin û ewle... Wisa dibêje dayika axê (daya axê), bêtî ku moletanê bide afirînê, - a niha jî diafirîne- cih, zeman tune ye li sînore tenik î zirav î bêsînor...

Baş e, lê yên ku xwe rast, rastî û rasteqînî dibînin! Yên ku xwe wisa zen dîkin!

Yên ku xwe di jiyana rasteqîn de dibînin; ên candar, xwîndar, xwînî, bixwîn, biqil (!) û hestiyar (!) Gelo li hev dîkin, gelo mirin, kuştin...? Yan jî mirinê asas digirin

û bi xwînê xwedîbûnê didomînin!

Hê mezel, qebra eslî..! Dengê xwe bilind bike..!

Tu çi dibêjî? Li hev nakin, qayîşkêş in, hevdu înkâr û red dikin û dimirin û dikan. Zen dikin ku ev jî aqildarî û bîaqilî ye. Herweha hê jî ajaltiyê nehatiye bihurîn. Di ajaltiyê re derbasbûn nîn e. Yanî mirov jî qonaxa ajaltiyê nebihuriye. Em li wir in. Ên ku tîn gotin ku hişmend in, ên ku wisa tîn ditin bejî, bêber, mezaxdar û her tiştê wan çêkirî, sînî ne...

Yeka din jî, dest avêtine zarokan; jiyanê li wan diherimînîn, jiyanê li wan dikin zindan. Di temenê wan î zarokî de, cezayên liyaqî mezinan (!) û qet û qet ne însanî didin wan, wan ditirsînin. Nizanin ramana ku dirêjî zarokan dibe, yanî ku dest diavêje wan, nayê ser xwe û qet naedile, ew pergal qet naedile. Tiştê ku biçûk dibe û hûr-hûrî dibe kakila jiyanê, vejena jiyanê ye. Mîna molekulê yan jî atomê. Zarok jî wisa, vejena jiyanê ne, jiyanî mirov a civakî. Zarok jî mîna atomê, kakil û vejena jiyanê ne. Kesa/ê ku jî xwestekên zarokan, jî xeyalên wan re, jî hestên wan ên bêguneh ên durist re bibe asteng ne mirov e; nisîbê xwe jî mirovahiyê negirtiye. Lewra civakê û herweha mirovahiyê belav dike. Ya/ê ku bela xwe di zarokan bide û "têkeve ser zarê zarokan" êdî ew qediyaye; lê ya/ê ku bi hezkirinê bûbe "zarê zaokan" û "ketibe dilên zarokan" ew ronahî ye û dahatû ye. Lewra jiyan dahatû ye!

Çirîşk
12

Me gotibû hertişt çêkirî ye; sînî.
Hest sînî, naylon...

Evîn jî, -derveyî dilê me, jî xeynî li nav me- tê stendin û firotin. Evîn, dilîni bi pereyan, bi banqinotên keskîn... Ji ber vê Leyl û Mecnûnên hemdem, Romeo û Juliyetên modern tune ne! Mal, xanî, erebe, înternet, evîna nîgaşî; bi qatên ku hertişt lê hatiye raxistin, bi tiştên raxistî; tîn kîrîn. Manken jî tîn kîrîn; candar, bêcan, naylon, fantezî, birqoqî, yên ku bi bayî hatine nepixîn... Heta tu dikarî bikirre, ku pereyên te hene, bikirre. Ku pereyên te pirrbin, evîn jî pirr e! Girêdana rastîn, hestên însanî, hezkirina bêhesab a bêberdel a bêtimayî tune; tune, nema... Barbiyên naylonî, pitikên naylonî jî bo her karî (!) li dermanxaneyan tîn firotin. Hertişt tê firotin... Mirovahî jî... Hertişt sexte, hest bixwe jî... Mirovê bîaqil (homo sapiens) sexte dibe, dibe sexte; dibe naylon... Qaşo mirov! Mirovê naylonî! Dimezixîne û çiqasî ku dimezixîne, diqede... Bîqasî ku dimezixîne jî diqede...

Em jî bo vê di şerrî de ne. Ên ku hestên naylonî, jiyanî sexte red dikin "terorîst" in(!), dibin "terorîst (!)" Terorîst bêhtir mirovahî ne, yanî însanî. Mirovên nû. Ê wisa! Bi dayê re, bi Xwezayê re, bi dayê Xwezayê re rûbirû; ew bi tenê ne, bi tena serê xwe ne bi dayê Xwezayê re, di hembêza wê de bi terorîstî, di tehma jiyanî însanî de em diherikin bêdawitîyê. Em ne muhtacî hestên naylonî ne.


Di dahatûyê de wê mirov jî ne muhtacî wê be. Ji ber vê êş pîroz e. Êşa ku di dora-vê de tê hilberîn pîroz e û ew dahatû bixwe ye. Jiyan e.

Betalî

Bêzar Germ

Weke pisîkeke ku ji ber deriyan qewirandi
Meşîya betaliya min
Li ser hemû kolanên dinyayê
Ez li mirina xwe digeriyam
Li bazarên şemarûtan
Û tariya demê dilebitî
Di bin neynûkên min de
Tirsê kon vedigirt li ser porrên min
Tehlbûna ramanên mejiyê min
Li çend zarokên ku bi firrênketî dişeniqî
Min çend çivîk kuştin
Di kefa destên xwe de
Diranên biêş bi deyn da min
ev jiyana qels
Ez im lehenga filmên nîvco

Dawerivî şev
Ne deng û ba liviyan
Ne bêhn û reng dixuyan
Erbaniya taldeya maran
di ber guhî de teqiya
Rabû xanî û çar dîwar...



Piyesa Çîrokekê

Hesenê Metê

Çîroka
14

Aliyekî sahneyê dekora aliyê perçînê ye. Li aliyê din î perçînê jî rê ye, weke rêya park an baxçeyekî ye. Rê di ber perçînê re dibuhure. Beriya ku piyes dest pê bike û temaşevan cîhê xwe bigirin, mêrek li pişt perçîna ber rê li bendî fesalekê ye, fesala ku jinekê bi tenê bibîne û bêdeng rakêşe hêlekê. Carina bi serê xwe, bi kêra destê xwe bi temaşevanan ve xuya dibe. Weke kesên normal jin û mên, jin û jin, cot bi cot, yek bi yek di evê rêya ber bêxçe re dimeşin û dibuhurin. Û anuha jineke xweşik, kubar û bi tena serê xwe di evê rêyê re dibuhure. Saeta destpêka piyesê bi hatina evê xatûna dawîn dest pê dike. Dema ku xwe digêhîne taxa wî, mêrik bi dilpekî xwe li hatina wê xweş dike, ji nişka ve xwe tev kêrê davêje ser jînekê, destê xwe dide ser devê wê û dikişîne pişt perçînê.

Ev aliyê pişt perçînê sahne bi xwe ye. Jinik bi tirs û bi tatûl xwe di nav lepên mêrik de diqoqizîne, bi hîsên ku ew ê tecawizê wê bibe, dilerize û bi deng û peyvên nîvçe dibêje:

JINIK: Hawar... berde... ji bona Xwedê min berde, min neyêşîne...

MÊRIK: Hişşş!... (bi hilkehilk kêrê dide ber gewriya wê) Ku deng ji te derkeve û dînîtiyekê bikî, tu dizanî...

JINIK: Xirabiyekê... bi min neke, ji bona... Xwedê min neyêşîne!

Destekî mêrik li ser dev û ruyê wê, bi destê din jî kêrê li ber gewriya wê hazir dike û jînekê li erdê dirêj dike.

MÊRIK: Xwedê bi xwe gotiye ku divê tu bêşî, divê tu êşê bikêşî. Anuha êdî navê Xwedê bi lêv neke. Bi gotina min bike.

JINIK: Neke, (jînek nîvrûniştî xwe berepaş bi dîwarê perçînê ve dişidîne) ji bona Xwedê xirabiyekê bi min neke.

Mêrik kêra xwe lê xweş dike, didanê xwe bi hev de dişidîne û di ser de diqîre:

MÊRIK: Min ji te re got çî!?... Min got navê Xwedê bi lêv neke! Destê xwe ji Xwedê û alîkariya wî bişo, weke min bike!

Jinik bêtir diricife, bêtir ditirse û mîna ku nexwaze evê bergehê bibîne serê xwe dixê nava herdu lepên xwe. Mêrik dest davêje porê wê berepaş xwar dike, li çep û rast çerx dike:

– Binêre, Xwedê tune!... binêre, Xwedê li vî aliyê rastê jî tune!... Xwedê ji van deran reviyaye, tirsiyaye, ew jî poşman bûye, ji min û te poşaman bûye... (kêrê nêzî gewriya wê dike, di ser de xwar dibe, li nava çavê wê mêze dike, dîsa dike qîrîn û dibê) Xwedê tune!... Me li hev kir? Anuha tu bi xwe kincan ji xwe derxîne.

JINIK: Na, meke... ji bona... tu bi qedrê Xwedê... dikî, vê yekê bi min neke!

MÊRIK: Tu weke min bike! Tu bi xwe derpê ji xwe bike. Weke orispiyekê, weke jinekê, weke êşkêşekê ji xwe bike.

Jinik xwe diguvêşe ser hev û bi tirs, bi tatûl li ber mêrik digere:

JINIK: Ez di bextê te û Xwedê de, ez jinekê bi tenê me, min zarok here, jiyanê li min neherimîne... min kes nîne wan xwedî bike...

Bi bihîstina peyva zarok, mêrik gelekî narihet dibe, bi porê wê digire, davêje erdê, li erdê dirêj dike, di ser de dike qîr û dibêje:

MÊRIK: Li hemberî Xwedê asê bibe, lê li hemberî min li ber xwe nede!

JINIK: Ji bona Xwedê...

MÊRIK: Banî Xwedê meke, dengê xwe neke, weke min bike, derpê ji xwe bike!...

Kêrê nêzîktir dike, dûre bi hêrs li nava ranê wê xweş dike, dike ku ew ê anuha kêrê di ewkê wê de çik bike. Jinik bêtir ditirse, bêtir diricife, destê xwe ber bi hustukura kirasê xwe bilind dike û mîna ku ewkê xwe ji serê kêrê bisitirîne, çogên xwe bi hev ve dişidîne. Mêrik ji nişka ve û bi hêrs dest davêje hustukura wê, hustukura wê diçirîne û pêsi-rên wê derdikevin rastê.

Mêrik dev û diranê xwe bi hev de dişidîne, kêrê bêtir bilind dike û zîq li nava şeqên jinikê mêze dike.

MÊRIK: Ez vê derê jî biçirînim... dixwazî ez vê derê jî biçirînim!...

JINIK: Ji bona Xwedê... ji bona wî Xwedayê mezin... min rihet bihêle, têkilî min nebe. Eza bêguneh, Xwedêyo!...

MÊRIK: Min got, li ber xwe nede!... min got li ber Xwedê negere... min got, derpê ji xwe bike... (vê carê bi hêrs dest davêje pêşa fîstanê wê, di ser zikê wê de diqelibîne, derpê jê dişeqitîne û berzikek bi pirç... temaşevan jî dibînin) min got behsa Xwedê û meziniyê neke!... Ez ji meziniyê hez nakim: ji merivên mezin hez nakim, ji bazirganên mezin hez nakim, ji avên mezin hez nakim, ji ewkên mezin hez nakim... ji zarokên mezin hez nakim...

Kêrê lê xweş dike û dîsa dike qîrîn:

MÊRIK: Te got... te zarok here?

Jinik bi tirs xwe dide ser hev û bi maneya, erê, tenê serê xwe dihejîne. Mêrik kêra xwe hêdî hêdî weke sadîstekî ber bi nava ranên wê dirêj dike û ji nişka ve bi hêrs:

MÊRIK: De îcar bibêje çima!... Ku anuha li vir bûya min ê ew zarok yek bi yek bi vê kêrê parçe parçe bikira û min ê parçe bi parçe dîsa têxista evî ewkê te!... (bi parsûya kêrê ewkê jinikê ditêpîne) evî ewkê te î ku kahniya hertiştî ye... sedema hertiştî ye: sedema gunehkariyê ye, sedema êşê ye, sedema şer û xezebê ye...

Tirs li jinikê xurtir dibe, mîna ku wê kahniya xwe ya gunehkariyê ji serê kêrê bisitirîne, çogên xwe bi hev ve dişidîne, lê mêrik dîsa şeqên wê ji hev fereh dike.

MÊRIK: Çavên we birije!... Çavên we dayikan derkeve!... Çima hûn zarokan çêdikin!... Ji bo çi? Zarokên bêguneh... hûn wan piçûkên weke perîzadeyan tînin û di evê dojhê de datînin...

Destê xwe î bi kêr li hewa li ba dike mîna ku dojehekê nîşan bide.

MÊRIK: Pêxember jî dibêjin: "Nalet lê wê rojê, nalet li wê rojê ku ez ji dêya xwe bûm!..." Ez di kolana Derê Çiyê re dibuhurîm. Min jinikek li wir dît. Li ber diwêr rûniştibû. Ji te jî ciwantir û ji te jî gunehkartir. Dixwazî guhdar bikî?... ne çirok e, راستیەک e.

Mîna Şahrezada hezar û yek şevî ku bixwaze emrê xwe dirêjtir bike, di maneya "erê" de jinik serê xwe dihejîne. Mêrik porê wê ji destê xwe berdide, parsûya kêra xwe ji ser piştê ewkê jinikê radike, weke gopalekî serê kêrê dide erdê û mîna ku bi zorê pê rabe ser xwe. Jinik xwe rast dike û di cihê xwe de rûdine. Mêrik radike ser xwe, wek şanogerekî kêrê di destê xwe de difirîkîne, di bin çavan re li jinikê mêze dike û dipeyive:

MÊRIK: A di wê kolana Derê Çiyê de, min got jinkê li ber diwêr xwe dabû erdê. Zarokekî şîr li ber hemêzê bû... min texmîn kir zarok lawikek bû, loma dibêjim zarokekî şîr. Keçikek din jî... bawer dikim bi qasî pênc salan li vê dunyayê xwe kevin kiribû... ew jî li kêleka dêya xwe rûniştibû. Dêya wê pêşîrek xwe derxistibû, serê pêşîra xwe kiribû devê ewî zarokê ber hemêza xwe. Jora pêşîra wê tenê xuyabû: vala bû, çilmîsî bû. Li gel wê ciwaniya xwe jî... lê min ew pêşîra wê ya çilmîsî da xatirê ku şîr di pêşîran de tune. Bi gotineke din, du zarok çekiribû, lê dilopek şîr jî di pêşîran de tunebû. Keçika pêncsale jî li kêleka wê weke bizmarekî rûniştibû. Liv û tevgerên wê ne weke yên zarokan bûn. Meriv digot qey wê jî hay ji evê rewşa xwe û dunyayê, ji evê rewşa dêya xwe heye. Deng jê nedihat. Gili û gazin ji dêya xwe nedikir. Weke zarokan meraqa tiştêkî nedikir. Ranedibû ser xwe û nedibeziya... ev çi zarokî ye, ya ruhê gunehkar, ya Xwedayê gunehkar!...

Mêrik bi gavên leztir di sahneyê de diçe û tê, kêrê li nêzî jînikê bi êş davêje erdê. Mîna ku jînik di ruhê evî mêrikî de tiştêkî din, êşeke mezin, êşeke mesîhî bibîne, bi mereq hêdî hêdî radibe ser xwe, xwe sererast dike, ew parçeyê qutikê wê î çiriyayî di dest de û ji pêya guhdariya mêrik dike. Mêrik didomîne.

MÊRIK: Ez lê mam heyirî. Ez vekîşiyam siya diwarê hemberî wan û min rûpelekî rojnameyê da ber çavê xwe. Min welê kir ku ez baş bala xwe bidime wan. Min nexwest wan hay ji min hebe. Bi germa nîvroyê re nanê xwe ji kîsekî kêleka xwe derxistin, dixwazim bibêjim, jînikê derxist. Nan, dibêjim... lê jînikê kurtulek nan da dest keça xwe ya rûniştî, hinek av û kevçiyek şekirê hûr da ber. Ji bona xwe jî, jînikê hinek xwê û îsota hûr da ber xwe. Keçikê pariyê xwe bi zîmanê xwe î piçûk şil dikir, hinek şekirê hûr pê ve dizeliqand û dixwar, dêya wê jî pariyê xwe di xwê û îsota hûr de dikir û dixwar.

Mêrik evê sahneyê weke şanogerekî bi rol dike: rûdine, ewê jinika parsek çawa kurtolê nan derxistiye, çawa şekir û av daye ber keçikê, çawa wê nanê xwe bi xwê û îsota hûr de kiriye û xwariye.

Jînik bi matmayî li evê çîroka mêrik guhdarî dike û Xwedê dizane anuha bi qasî berê êdî ji mêrik natirse. Di wê gavê de du polis di rê de, di ber wan re derbas dibin. Jînik zûzûka ewî parçeyê fanoliyê xwe î çiriyayî davêje ser kêra li erdê. Polis evê yekê nabînin, lê li wan û rewşa wan dinêrin, mîna ku tiştêkî ne normal hebe, dikevin gumanekê û dipirsin ka wan pêwîstî bi alîkariyekê heye an ne. Serê mêrik di ber de ye, dengê xwe nake. Hîn jî rûniştî ye. Li hêla deng jî mêze nake, lê jînik bi polîsan dide zanîn ku tiştêkî tatûliyê nîne, tenê hinekî dewxa mêrik çûye û loma li evê derê rûniştine.

Piştî ku polis bi rêya xwe de dimeşin û diçin, mêrik li pey wan mêze dike, li jînikê mêze dike, mîna ku bibêje, te dîsa li hev hanî, pê dipişire, hêdîka radibe ser xwe û bi aliyê din ve dimeşe. Jînik xwarî erdê dibe, fanoliyê xwe û kêrê digire, bi lez dide dû mêrik, bi milên wî digire û disekinîne:

JINIK: Te negot, navê te?

MÊRIK: Xêra navê min ji kesekî re, ji tiştêkî re tune.

Mêrik xwe ji dest jînikê vedigire û di rêya xwe de dimeşe. Jînik li pey dîsa destê xwe davêje milê wî û kêra wî nîşanî wî dide ku bigire. Mêrik bi awayekî xemgîn li kêrê, li jînikê mêze dike:

MÊRIK: Kêr jî bi kêrî kahniya gunehkariya we nayê... ew kahniya we bi kêrê jî nayê rayê!

Mêrik berê xwe ji jînikê çerx dike û dimeşe. Jînik bi mereq, bi raman li pey mêrik mêze dike, vedigere ser temaşevanan û bi tatûl li wan mêze dike: Sê caran vê tevgera xwe dubare dike û perde dadikeve.

Marcel Duchamp û “Ready-Made”

Asya Genim

Duchamp’î hemû projeyên xwe wê li ser van fikrên xwe ava bikira: “*Hûn ji min bipirsîn wêne dimire. Piştî çil- pêncî salî tablo dimire, ji ber ku êdî ne teze ye. Peyker jî weha ye. Ev fikra min a peytandiye, kes qebûl nake lê ne xema min e. Li gorî min tablo jî weke kesê ku ew çekiriye di hundirê çend sala de dimire. Piştî wê jî dibe dîroka hunerê. Îroj Monet weke hertiştî acizker e, 70-80 sal berê çiqasî bi ihtîşam bû.*”

Çirîşk
17

Di heyameke krîtîk de pirsên li ser hebûnê, mirov nêzîkî erda ramanê dikir. Hebûn kirûyeke hişînî ye. Duchamp’î hişîn xist navenda hunerê ku ev yek rîskhilgirtin bû. André Breton’î ji bo Marcel Duchamp’î weha digot: “*Marcel Duchamp dibe ku xwe ji herkesî zûtir bigihîne xala ramana krîtîk?*”

Ew di êkolên Surrealîzm û Dadaîzmê de weke motora ramanê hate dîtin. Duchamp’î bi berhem û bi fikrên xwe yê jiadetêderketî bal dikşand ser xwe. Ruhê Dadaîzmê bi Duchamp’î re bêtir lihev e. Dadaîzm jî xema hunerê dîr bû, ev yek aliyê Duchamp’î yê herî girîng e. Dadaîzm tevgereke jiyanî bû. Ji kaosa Ewropayê welidîbû Surrealîzm, Dadaîzm. Êdî parzemîna Ewropayê ji bo hunermendên nûjen laboratuareke xebatê bû. Sedsala bîstemîn destpêkeke tarî bû, dîroka sedsala bîstemîn weke heyameke tevlihev wê bihata xwendin. Piştî herdu Şerrên “mezin” Ewropa ji hev ketibû, sîstemên mezin ruxiyabûn, hertişt li benda xwe- ji-nû-ve-avakirinê bû. Nosyonên ku Ewropa ji nû ve ava dikir ji malzaroka modernîzmê derketibûn. Dînamîkên civa-kê xwe li gorî rengê demê difesilandin. Huner û ferasetên hunerî ruhê heyama xwe dîtewisandin. Êkolên ku derdiketin ji psîkolojiya Ewropaya têkçûyî derdiketin. Tevgera Dadayê di sala 1916’an de li Swîsreyê û di heman demê de li Amerîkayê jî dest pê kir. Heyameke ku ji bextewariyê bê par, ji êş û nerehetiyê pê ve karîbû çî bîdaya mirovan. Mirovên heyameke bi êşê strayî li hemberî jiyanê bîxemiyeke tund nîşan dida. Hertişt leqiyabû, xirrek bûbû. Êdî fikrên berê di bin xirbeyên şerrî de mabûn. Jiyan bi şikestineke mezin re rûbirû mabû, dem dema xerakirinê bû, hertiştî divê xwe ji nû ve çêbikira. Huner li gorî qalibên kevn tevnedigeriya. Ecibandînen heyî dîhatin darizandin. Hunermendên nûjen bi qalibên nuh ên bêqalibiyê ango bi pratîkên serbest divê pêk bihatina. Vîndariya afirînê xwe li ser demê serdest dikir. Şexsbûn, êdî wê klîşeyêke dema modern bûya. Di trajediya herdu Şerrên mezin de êkolên mezin derketin. Têkbirinê, çawa mohra xwe li heyama sedsala bîstemîn xistibe heman peyvê mohra xwe li diskurên hunerî jî xistiye. Mesele ji guherînê bi wêdetir têkbirina teki-liyên lawaz ên bi kevneşopiyê re bû. Tristan Tzara weke ku daketibe qada şerrî bi den-



Marcel Duchamp

gekî hêl li ser zemîna tekstê weha digt: *"Tiştê ku me bi rabirdûyê re girêdide dijberî ye."* Ruhê Dadaîstan hertim li ber teqînê bû. Duchamp'î qada hunerê weke qada şerrî didît û bi fikrên heyî re şerr dikir. Duchamp bi tevger û fikrên xwe bi awayekî radîkal li hemberî fikrên giştî yên ku kokên xwe digihandin Ronesansê derdiket. Erda Ronesansê êdî erdekeî metrûke bû ji bo êkolên avangard. Alav, têgeh, qalib û dîskurên demê li hemberî guherînên civaka nuh bêçare bûn. Ewropaya endustriyel bi dengê xwe yê mekanîk ruh û hisên xwe digihandin Ronesansê. têk biribû, xirrecirra mekîneyan roj bi roj ruhê hunera avangard dermale dikir. Êkolên avangard bi lêpîrsîneke tund hertişt dida ber pîrsan.

Huner çiqasî dadigeriya hundirê jiyanê? Hunera avangard ango êkolên avangard bi tenê bi derxistina berhemê re ne mijûl bûn, bi perspektîfên eceb daqûlî pîrsan dibûn. Peter Bürger'î armanca avangardîstan a xala herî girîng ev didît: *"Sazîbunêke hunerî ku ji pratîka jiyanê dûrketî divê ji holê bihata rakirin. Avangardê, armanca dikir ku hunera xweser ji holê rakira"* Derdê avangardan ev bû ku hunerê daxilî pratîkên jiyanê bikin. Jiyan, divê ji bin hukmê hunerê bihata derxistin. Huner, divê rasterast ji hundirê tevgerên jiyanê derketa. Ji aliyê Dadaîstan ve, happening (bûyer) û pêşandeyên ku dihatin kirin hunereke ji jiyanê derketî dihat armanckirin.

Berhemên ku ji êkola Dadaîzmê derketine divê weke berhemên serbixwe bêne xwendin. Peter Bürger hilberîna Dadaîzmê weke hilberîneke hunerî nabîne, ew wê weke hilberîneke serbestkirina pratîka jiyanê dibîne. Duchamp'î bi daxuyaniyên xwe yên radîkal têgehên hunerê û wateya hunerê hûrê dikir. Rexneya hunerê bi peyvên Duchamp'î derdiket lûtkeya bêsînoriyê. Bi çalakîyên xwe Duchamp'î wateya hunerê derdixist bazara nîqaşan. Vê yekê, qadên bisînorkirî ji hev dixistin, hewldana Duchamp'î xerakirina sînorên di navbera jiyanê û hunerê de bû. Bi slogana *"anti-huner"*ê Dadaîstan qadeke serbest çêkir. Duchamp weke pêxemberê *"anti-huner"*ê hate qebûlkirin. Wateya giştî ya hunerê hate xerakirin. Xerakirin, ji bo fikrên nuh pêwistiyeke bû. Nosyonên modernîzmê diperesîn. Peyvên ku bi feraseta kategorîzekirinê hatibûn bi mehnêkirin yek bi yek dihatin darizandin. Kategorîzekirina berheman û li dij wê derketina Duchamp'î û çalakîyên Duchamp'î Peter Bürger weha rave dike: *"Duchamp'î bi awayekî provokatîf bireserên fabrikasyoni îmze dikirin û ji pêşange-*

hên hunerî re dişandin, ev provokasyon berî hertîştî hebûna ferasetêke ku ji çîre dibêje huner ferz dike. Îmzekirina bireserên amade hinartîneke kategorîzekirina berhemê ye.” Li gorî Bürger’î di bingeha çalakiyên Duchamp’î de acizkirina fikrên ku xwe digihandin Ronesansê hebû. Fikirdarên Ronesansê berhem û pêşnûmakirin karekî pîr bi qîmet diditin û wan pêvajoya afirîneriyê tiştekî şexsî didît. Li gorî Bürger’î Duchamp’î dixwest ku ew fikrên ku ji navika Ronesansê derketibûn bidarizandina (herçiqasî Duchamp ji peyva darizandinê aciz bûya jî). Bürger, lêpîrsîna Duchamp’î weke lêpîrsîneke provokatîf dinirxîne. Bürger weha vedibêje: *“Çalakiya provokatîf dikeve şûna berhemê. Di vê rewşê de gelo kategorîzekirina berhemê nabe zêdeyî? Provokasyona Duchamp’î huner weke sazîbûneke civakê hedef digirt; berhema hunerî çiqasî daxilî wê sazîbûnê bibûya, vê êrîşê ew jî dixist hedefa xwe.*” Avangardan dixwest ku ew hunerê ji sazîbûna civakê rizgar bikin û hunerê tev li pratîkên jiyane bikin. Li gorî Bürger’î avangard di pratîzekirina fikrên xwe de bi ser neketine û wan huner bi tu awayî tev li jiyane nekiriye.

Çirîşk
19

Çalakiyên Duchamp’î herçiqasî li ser tune kirina hunerê bin jî tiştên ku wî dikir ji hunerê pê ve ne tiştekî din bû. Ronesansê huner derdixist lûtkeyê, lûtke ji erda jiyane dûr bû. Bilindkirina hunerê ji bo Duchamp’î fikreke acizker bû. Bi *‘ready-made’*ên xwe Duchamp’î dixwest ku hunerê ji lûtkeyê daxe ser rûyê erdê û karê hunerî bêsêhr bike û ji hunerê re hişekî çêbike. Berhem, karîbû her alav bûya. Biresereke jirêzê bi şanena hunermênd vediguherî berhemê. *Vê yekê* berhem ji kategorîzekirine rizgar dikir, ango huner tune dikir? Jixwe hemû çalakiyên Duchamp’î huner refere digirt. Bi dijberiya hunerê Duchamp’î hunereke nuh ava dikir. Huner ji tuwalê daxist erdekî bêsînor. Duchamp’î weke sêhrbazekî dest bidaya çî ev tişt, ew alav hêmayeke xurt distend û xwe di hundirê pêşangeheke hunerî de didît, lê bi xwe re teşqeleyên mezin derdixistin. Duchamp’î bireser îmze dikirin û ew dikirin dînamît û wî ew diavetin hundirê mejiyê galeriyên antîguherîner. Di her hal û karî de bireser piştî dadigeriya hundirê galeriyê û dihat pêşangehkirin nirxê hunerî distend ku ev yek di navbera fikr û pratîkên Duchamp’î de şikestinekê çêdike. Li galeriyeke hunerî cih standina *“Fountain”*ê (kanî) ew veguherand berhemeke hunerî. Bürger, *“ready-made”*an weke berhemê nabîne weke *‘pêşandanê’* qebûl dike. Di rastiya xwe de dijberiya Duchamp’î dijberiya ferasetên statîk bû. Huner divê bibûya çalakiyeke jîndar, afirînerî jî çarçoweyên teng divê bihata rizgarkirin. Krîterên hunerê ji muzeyên sar û ji darizînên estetîkî divê bihatina rizgarkirin. Nemaze muze rastî rexneyên Duchamp’î hat. Muze, sînoren di navbera huner û jiyane de bûn. Li gorî Duchamp’î, a ku berhem derdixist wateya hunerî ne muze bû û ne jî hunermend bû bi tenê temaşevan bû. Duchamp’î di hevpeyvîna ku Pierre Cabanne’î pê re kiribû de li ser muzeyan weha digot: *“Hema hema bêje ku ez naçim muzeyan. Ev belkî bîst sal e ku ez neçûme “Louvre”ê. Qet bala min nakişîne, ji ber ku îroj roj ev nixê darazdanê ku biryara pêşangehkirina hinek berheman dida û ya hinek berheman nade ji rastiya wan bi guman im.”* Duchamp’î muze, weke nûnertiyeke ferasetên statîk didît.

Kirin an jî nekirina hunerê ne yekemîn xema Duchamp’î bû. A girîng berhemeke hunerî divê di mirovî de tevgerê fikrîne çêbike û ew berhem çiqasî kare çalakiya fikrîne provoke bike. Divê huner bi tenê ji bo zewqê neyê kirin yanî di navbera hiş û hunerê de têkiliyeke xurt bê avakirin. Di Duchamp’î de, a girîng ne berhem e, ji berhemê girîngtir hişê ku tê derxistin. Duchamp’î digot: *“Bi tenê derdê min fikirîne”,* ji ber wê yekê hunera pêjnî biçûk didît û hunera ramanî bilind dikir. Weke Donald


Kuspit dibêje: *"Hunermendê Duchamp'î kedkarekî/e hişînê ye"*. Duchamp hunermendekî heyama modern bû, di nezera Duchamp'î de hiş û hişîn kirûyeke girîng bû ji bo karê hunerê. Hiş, alava herî serdest bû di fesilandinê modernîzmê de, di Duchamp'î de xala sereke û bingeha hunerê bû. Tiştê ku Duchamp'î ji berhemê fahm dikir ev bû; berhemek çiqasî dikare mirovî ber bi herikîna fikirînê bibe. Li gorî Duchamp'î xema ecibandinê, darizîna estetikî, aliyê hunerê yê ku ji êqil distend basko dikir. Xema estetikê hunermend daxilî ferasetên giştî dikir. Di Duchamp'î de hunermend bêxem tevdi-gere û bi hunera ku dike xwe li heviya erêya civakê nahelê. Duchamp pêvajoya afirandinê bi van peyvên radikal vedibêje: *"Berhemeke hunerî divê bi tu awayî balkêşî-yeke estetikî nehundirîne. Hunermend ji bo çepikên nîfşên pêşarojê xwe netengijîne. Ji bo ku bibe kesekî xwedî zewq bila neşixule ji ber ku zewq tim tê guhertin. Ji bo ku xwe baş bike ji divê neşixule bi tenê ji bo xwe hebike bişixule. Êş û bengîniya ku alavên te pêk tîne heya tu bêjî bes baş derbirînê û bi dûre dest nedê. Weke Eliot'î dibêje divê huner bibe *"biresereke beranberî"* kirûyeke hişînî."*

Li gorî Kuspit'î, Duchamp'î pêvajoya afirandina hunerê pêvajoyeke ji derveyî hişî didît. Duchamp, kiryarda estetikê kiryarda civakî didît. Hêza estetikê, armanca afirîneriya hunermend zêf dikir û berhema hunerî bi şîroveya xwe civakî dikir. Duchamp bi hêza estetikê ne bawer bû (bi awayekî vekirî ez dixwazim ku vê yeke eşkere bikim; di hîlbijartina 'ready-made'ê de bi tu awayî bandora zewqeke estetik tune ye.) ji ber ku xema ecibînê xemeke civakî bû ku ev yek hunermendî ditengijand û afirîneriya hunermend difetisand. Kuspit'î fikrên Duchamp'î yên di çarçoweya antîestetîzmê de bêmehne didît. Kuspit'î berhemeke ji estetikê bêpar weke berhemeke absurd bi nav dikir û *"ready made"*ên Duchamp'î ji zewqê dûr û bêmehne didît. Kuspit bi nirxandîneke ecêb bi ser Duchamp'î de diere. Li gorî Kuspit'î Duchamp bi tenê ji hesûdiya hin wênasazên navdar (Matisse, Picasso) li dijî estetikê derdiket û weha dinirxand: *"Duchamp dixwest ku nûjenîya ku wan anîbû li dû xwe bihişt, lê ji bo vê yekê ew tiştê ku bingeha hunera wan çêdikir estetik divê ji holê rakira û bi vî awayî heza ku temaşavan distend tune bikira. Belkî jî serkeftina herî mezin a Duchamp'î ev yek bû ku baweriya wî ya estetikê leqiya û hêza estetikê winda kir. Ev serkeftin serkeftina dejenerekirina afirîneriya sedsala bîstemîn e."*

Kuspit'î, di hunerê de estetik di asta hebûnê de didît. Hunereke bêestetik wê bê kêf bûya, bê zewq bûya û wê ji hestan dûr bûya. Hişekî ji hestan hatibe dawşandin wê hişekî bê armanç be. Dehka Kuspit'î ev bû ku hunera ku Duchamp'î dikir ji naverokê dûr û ji hêmayê bêpar bû. Ango li gorî Kuspit'î di fikrên Duchamp'î de kûrahî tune bû, asteke rojane hebû ku ev yek huner dikir kirûyeke rojane. Di her hal û karî de Duchamp'î zemîneke nuh ava kir ji bo hunerê (herçiqasî dehka Duchamp'î nekirina hunerê be jî). Duchamp bi têgînên nuh daqûlî hunerê bû. Weke Duchamp dibêje, *"zewq tim tê guhertin"* û krîterên hunerê jî tê guhertin. (Di Qirna Navîn de berhem li gorî krîterên dêrê dihat nirxandin. Ji bo hunermend sereke mijar û yekane mijar *"Încil"* bû. Ji bo wê demê ol û pirtûka pîroz çavkaniya afirîneriyê bû, lê piştî Ronesansê ev feraset roj bi roj zêf bû. Êdî hunermend li ser zemînên nuh afirîneriya xwe, hêmayên xwe dermale dikirin. Modernîzm li ser fikrên Ronesansê ava bûbe jî modernîstan heyama Ronesansê li dû xwe hişt û krîter û fikrên heyamê dan ber pirsan.) Ango her heyam bi dînamîkên xwe ferqa xwe datîne ji heyama din, ev yek hêza guherînê ye.

Di sala 1917'an de li New Yorkê pêşangeheke Civata Hunermendên Serbixwe

vebû, Duchamp'î "Pîsuar" a ku navê "Fountain" ê (kanî) lê kiribû ji pêşangehê re bi îmzeyê "R. Mutt" î* şand. Ji bo beşdarbûna pêşangehê ew pereyê ku ji aliyê komiteya pêşangehê ve hatibû qebûl kirin nebû garantiya pêşangehkirina "Fountain" ê (her hunermend bi dana wî pereyî karibû bi berhema xwe beşdarî pêşangehê bibûya). Ji aliyê komîteyê ve, "Fountain" bi awayekî hişk hate darizandin û di pêşangehê de "Fountain" ê ji xwe re cihêk nedît. Darizandina berhemê ji bo Dadayê bû qûçêke pêşandanê. Di kovara Dadaîstan a bi navê "The Blind Man" ê de gotarek hat weşandin. Gotar li ser helwesta komîteya pêşangehê ya li dijî "Pîsuar" ê hatibû nivîsîn. Gotareke reaksiyonêr bû û mexseda Duchamp'î weha rawe dikir: "Dibe ku ev 'kanî' bi destê R. Mutt î hatibe çekirin an jî bi destê yekî din, a girîng ne ev e. VÊ WÎ HIL-BIJART. Alaveke jiyanê ya jirêzê stend û ew bi navekî din û bi dîtineke din, ji nîrxên wê yê bi karanîne hate dûrxistîn û hate pêşkêşkirin. Ji bo bîreserê ramanê ne hate avakirin."



Marcel Duchamp, "Fountain" (Kanî)

Li ser karê Duchamp'î di wêşanên Dadaîstan û Surrealîstan de gellek gotar weşyan. Di rojevîna Duchamp'î de bêguman bandora nivîsan hebû. Weke David Hopkins dibêje "kultûna Duchamp'î çawa çêbû?"

Navdarbûna wî, divê di demeke kin de neyê nîrxandin. New York ji bo Duchamp'î ne destpêkeke nuh bû, lê ji bo New Yorkê destpêka tevgerê orijînal bû. Duchamp'î bi ramanên xwe bi çalakiyên xwe atmosfereke bitevger da destpêkirin di civata avant-gardên li New Yorkê. Projeyên wî di der û dorê hunerî de dihatin nîqaşkirin. "Ready-made" ji bo hunera dinyayê têgiheneke dijwar bû. Ezbera hunerê hûhûrî kir û bergeheke afirîneriyê ya bêsînor da destpêkirin. Zemîna hemayê ji destê pûtperestan rizgar kir. Wî bi "jehrîbûna terebentîne" bi nav dikir rewşa hunerê ya giştî, Duchamp'î malzemeyên klasîk ji wêneyê kişandin, wêneyê ji ser şowaleyê daxist û bêhna terebentîne bi hêza zimanê ramanê lawaz kir.

* Mutt: Peyveke argo ye, te wateya seg, kûçik, ehmeq.

"Hîn di sala 1913'an de min dixwest ku ez tekerê bisiklête monteyî tabûreya med-bexê bikim û temaşeyî zivirrandina wê bikim. Piştî cend mehan min dîmeneke erzan a zivistanî ya bêrêvarî kirrî, du tûşên biçûk yê sor û zer li asoyê xistin, bi dûre min wêne bi navê "Dermanxane"yê bi nav kir. Di 1915'an de li New Yorkê ji nalbûrekî min bêreke berfê kirrî, li ser bêrê min nivîsî "li hemberî ihtîmala çengsikestinê". Bi peyva "Ready-Made"ê pêşkêşkirin wê gavê hate hişê min."



Marcel Duchamp, Bicycle Wheel (Tekerê Bisiklête) 1913

Navê wî belav bû gellek nîqaş li ser hate kirin, hin kesan ew derxist asta mîtbûnê, hin kesan du qurîşên xwe tê de nedan. Ji bo hunera sedsala bîstemîn bergehêke serbest ava kir (Hunera têgehî, pop art (hunera populer) li ser ramanên Duchamp'î xwe çêkir.)

Mafê her mirovî heye ku bibe hunermend mafekî bînpêkirî bû. Ew maf bi feraseta Duchamp'î ya afirîneriyê hate bidestxistin. Her mirov serbest e ku di pêvajoya afirîneriyê de alav, têgeh û teknîkên xwe hîlbijêre û ya girîng li ser zemîna ramanê êdî huner di hate kirin. Cih û warê wêneyê û qabiliyetê ji klîşeyên Ronasansê rizgar kir.

Zemîneke ramanî û têgehî û ya herî girîng pêşbîniya wî karên pîrr bi rîsk pêdaki-rin. Hemû alavên ku hunermend derdixistin qada pîroziyê yek bi yek xist hedefa xwe. Duchamp'î bi tenê forma berhemê xera nekir fikrên sedsaleke mezin da hemberî xwe. Hunera Duchamp'î hem tê xwendin, hem difikire, hem dide fikrandin û tê temaşeki-rin.

Çavkanî

- 1-Peter Bürger, Avangard Kuramî, weşanên İletişim'ê.
- 2-Sanatçı Müzeleri, weşanên İletişim'ê.
- 3-Donald Kuspit, Sanatın Sonu, weşanên Metis'ê.
- 4-David Hopkins, Dada ve Gerçeküstüçülük, weşanên Dost'ê.
- 5-Enis Batur, Modernizmin Serüveni, weşanên YKY'ê.

Hevdîtineke Kaotîk


Robîn Şerna

dema ku bi finda çavên te
bê pelandin çavên min
wê wextê dê şoreş çêbibe
dê çek bixerpilin
dê toxumên cercûran
di şûva cênîkan de bîn çandin
bêhna hemû zarokên pinpinîkî
dê di rengê berikan de
govend bigirin di namlûyên keleşan de
ma kî dizane?
dibe ku bêtî te jî evîn bê jiyîn
û dil jî serê xwe bixwe belkî
yetam
berdîwar
û
binçengşewitî...

dema ku bi finda çavên te
bê pelandin çavên min
bi ekla dengê çavên te yên şalûlî...
dê ava reş bi çavên min de were
ez ê qarixî bibim...
.....
ji kalanên xwe derketin êdî
maçên di jehra silêmanî de destmêj girtine
êdî hezkirin
mîna gurzek rûbarên dîl
di bendaveke gennî de....
sîngên hehecîkên azad maçî dike.

çepera dilî zolîk zolîkî
pêçeka zayîna sergerdeyê nû
hembêz dike
zolîk sor
dergûş kor

û hesûdiya çavên min
di avjeniya xwînê de li helbesta
ji dengê te hatiye risîn digere



xwisiya heyvê weriyaye li ser rûyî
çavên wê ji rengê rojê
hembêza xwe bipelîne mîst kevok
wisa bi guman dinihêre ji hundir
rûbarek diherike ji dîlî

di dengê wê de awaza xezalan
di şiverêyan de sê zînên bikum û koloz

rahêjîm ez mên bi evîni ramûsim
weke xunavekê dibare ser serê min
ew destên xwe li helbestê vegirti

egidekî reşesmer î çiyayî ye ew
di nav diranan de sirûda dahatîya me

Diyarî Mem Ronga'yî

Çirûskên Nûjeniyê di Helbesta Bakur de -Mem Ronga- Berken Bereh

Çirûsk
24

"Tirêj" bêguman ne bi tenê bi nasnameya xwe ya ku yekemîn kovareke xwerû bi Kurdî ye tê nasîn; herweha ew di heman demê de bi nivîskarên xwe yên xwedî nexş û reng û dengên resen û cuda jî nav daye. Dîsa "Tirêj" bi saya wan nivîskar û helbestvanên ku xwestiye ku pireke qehîm di navbera wêjeya klasîk û a nûjen de ava bike jî tê nasîn. Mem Ronga yek ji wan nivîskaran e ku wî bi tevayî ev xislet di berhemên xwe de bi hosteyî bi cih kirine. Wî, berê rûbarê helbesta Kurdî -ku xwêrnexwaz û dagirkerên vê xakê bendavek li ber ava kiribû- ji nû ve da wan newal û geliyên ku bi şehwet li benda wê bûn. Mem Ronga'yî di têkoşîn û hewldana xwe de yek carî bi tenê jî xwe nespirt popularîteyê û vegotineke erzan. Weke derwêşekî bîefsûn da dû raz û mîrateya bav û kalan.

Mem Ronga di avakirina helbesta xwe de bi azadî tevgeriya. Bi her helbesteke xwe resenî û xweseriya xwe nişanî me da. Her bi surprîzekê li deriyê helbesta Kurdî xist. Ziman, dirûv, teşe û vegotin di helbesta Mem Ronga'yî de weke notayên stranekê bi harmonî di têkiliyê de ne. Ji ber hindê di dawîya helbestê de peyama weke stêrkekê diçirûse di hiş û gîyanê mirovî de. Bextewarî û dîlşadî bi hêminî di bedena mirovî de dikeve livbaziye.

Mem Ronga peyama xwe ne rasterast lê bi awayekî surprîz radigihîne xwendevên. Dema ku mirov li navê helbestê dinihêre, mirov biguman xwe berra hundirê helbestê dide, lê bi her rîstekê, bagera meraq û heyecanê, dil û mejiyê mirovî dîl digire. Lew ew, berevajî nîfşa xwe wanekan ji xwe re dike pêlîstok û hêlên wan ên ku gellek caran ne di bîra me de ne raberî me dike û bi wî awayî êş û birînên me yên xedar nişanî me dide û bihemd berê me dide ponijîneke kûr û dûr.

"Derîname" yek ji van helbestan e. Di helbestê de "derî" bi taybetiyên xwe û wateyên xwe yên cuda tê vegotin. "Deriyên hesinî, deriyên kevotî, deriyê koxan, deriyê li pey hev bi notirvan, deriyê ku vedibin, bi destê sibehê bi singuyan" û peyama weke çakûcekî ku li serê mirovî bikeve;

"Derî

Derî

Derî

Nabe

Wiha naçe serî"

"Diyarbekir" dîsa yek ji vê cure helbestê ye. Diyarbekir ku kevna e, mezinahî, asîmanê xwe yê bi heybet, kevokên perrbizîv ku rojên ji kulîlkên sîpan, ewrên agirî û kaniyên mereto vedixwînin û her dawî ;

Hezar dilê westayî bîna xwe vedidin
Di hênkayiya zebeşekî teyê navdar
Ku niha min divê " de

Hesret, bêrî û derdê dûriyê bi "Diyarbekir" tîne zimên ku dilê xwînêr dilerizîne.

Dîsa "Dicle" û "Hehecik", "Çewa", "Gelî" ji van cure helbestan in. Di "Hehecik"ê de bi hatina payîzê re koçkirina hehecîkan ber bi cemsera Başûr ve dike mijar û rêwîtiyeke xweş û bê xetere jê re dixwaze û xemgîniya xwe bi lêv dike ku ewyan û ezmanê wî bê wê kêr û sar e dibêje. Di dawiyê de;

"Lê
Ne ez dikarim bêjim
Ne jî yekî din
Ev zalim
Wê xaniyê min jî hilneweşînin
Wek bi hezaran yên din
Wê gundê me jî neşewitînin"

Yan;
Çiyayên kurdistanê hesen
Ji derdê min û te ra
Şût û tazi"

Yan;
"agirê pîroz û jiyanbexş
van zaliman
çi anîn serê te jî
yê me jî"

Gellek zanyar, bêhtirîn jî dîrokzan û dîroknûs û zanyarên ku li ser civak û têkiliyên insanan radiwestin û dixebitin ji wêjeyê û nemaze ji helbestê sûd werdigirin. Lew, helbestvan di avakirina helbesta xwe de bivê-nevê bi hest û dilînen xwe re -ku ev jî parçekî vê civakê ne-hin rîtuwelên hiş, hizr û ramana civakê jî tev li helbesta xwe dike. Lew, helbestvan yekî ji wê civakê ye û bi reng, nexş û taybetiyên wê civakê dirûv û teşe girtiye. Ev angaşt di helbestên Mem Ronga'yî de bi goşt û laş dibe. Jixwe ew jî dixwaze ku neynika xwe raberî civakê bike û tiştê ku dibîne bi helbestê ragihîne me. "Serpêhatî" yek ji van helbestan e ku hişmendî, tevger, livbazî û hêza ku xwe sazkar û avakare civakeke modern dikir, çiqasî hosteyê vî kariye û dikare heta çi radeyê bibe dermanê pîrşgirêkên civakî? Herwêha paradoksa xort û xwendevanên ku endamên bûrjûwaziya biçûk e bi aşkere vedibêje."

"Karker tune
Gundî razaye
Şoreş
li hêviya me pêşevanan maye"

"Milek ji pola/dilek xurt/bes e/bo vê/dengê tivingan/dermanê xewê." û dehw û doza

kuştin –ku kesên ji fraksiyonên cuda- û çalakîyên bêpergal tê kirin. Baş tê zanîn ku bûrjûwaziya biçûk heta radyekê dikare vî barê giran ragire û dawiyê “leq/leq/leq, nebû/lihevnehat/îcar/gel/li pey me/nehat...na lo...hewaye/ev gel ne hêjaye” Ev helbest panaromayeke ji qonaxa salên ‘70 heta ‘80’yî li Bakurê welêt.

Rêya çareserkirina pirsgrîkên civakê û rizgariyê bi helbesta “va destê min” “de weha vedibêje” ne tenê me di vê evînê/ne tenê/birayên min hene li çar alî/li çar alî dinê”ango kes û gelên bindest û çîna karker giş hevalbendê hev in û markîsî jî bîr û baweriya wan e ku bi wê dikare pirsgrîk bê çareser kirin. Tu rêyeke din nîn e bo hêvî-yê;”dizanim êdî/hêvî nexweşin e/ger nehatibe strehandin/bi dengê gerran û kerane/û reh bernedabe/di axê de.”gerran û kerane sembolên ramyariya sosyalîzmê ye.

Mem Ronga’yî di helbesta xwe de gellek caran bi felsefeyê re dide û distîne. Herweha bi tehmeke helbestî felsefeyê, hizirkirin û ramyariyê li ber dilê me xweş dike û pirsine ku dê deriyê cîhaneke din li ber me veke aresteyî me dike.

*“bingehê gerdûne ne-afirandî
Ne hewa û agir, ne ax û ne av
Yek tişt heye bi ser û bê dawî
Di guhurîn û qevdan de bizav.”*

Herweha di helbesta “Jiyan”ê de hebûn, heyîn û wateya mirovbûnê bi hosteyî şîro-ve dike û xwe digihîne lûtkeyên helbesta cîhanî.

Çirîsk
26

*“Ne bi me destpêkir ev stêre
Û ne jî ewê bi me biqede
Straneka bédawiye jiyan
Tu meqamê wê xwestir bike.”*

Zimanê Mem Ronga’yî, zimanekî resen, zelal, herikbar û ji kaniya civakê derbûyî ye. Ew ziman e ku rasterast di jiyana rojane de tê bikaranîn. Vê tercîhê, helbesta Ronga’yî, berz û bilind kiriye û kirasê jidilbûn û rûspîtiyê lê pêçaye. Bikaranîna qalib û terkîbên wêjeya devkî jî di hûnandin û sazkirina helbestê de bûne stûnên qehîm; herweha vê şêwazê deriyê têkiliyeke xurt a bi helbesta me ya klasîk re jî amade kiriye.

Mijarên Mem Ronga’yî; azadî, eşq, hesret, mirin, dûrî û bêrî, siruşt û ango jiyan û gerdûna me bi xwe ye. Ew nefsbîçûk e, berevajî gellek helbestvanan tutîştî li ser me ferz nake û nabêje va rastî ev e. Bi tenê nîşanî me dide, weke dîmeneke filmekî bi lez tê û dibihure. Lê piştî xwendineke bibaldarî mirov tê digihîje ku Ronga neynikeke ku rastî û razên me û civaka me li ser dîtseyîse û dibiriqe. Ji ber vê, divê bi baldarî bê xwendin. Piştî Goran û Osman Sebrî yekem kes e ku li ser xwezayê û qewimînên wê nivîsiye. Ez “Pelê payîzê” li jêr dinivîsim. Hêvîdar im ku xwendevan vê helbestê bi baldarî bixwîne û li ser bihizire bê ka gelo ev pelê payîzê ye tê vegotin an “însan û emrê” wî ye ku weke pelê payîzê bê dilê xwe diçe?

Ez dixwazim nivîsa xwe bi helbesta “Koşk”ê bi dawî bikim ku bi ya min ev helbest xewn û xeyalên her Kurdekî dinimîne. Bi hêviya ev koşk di demeke nedûr de bibe rastiya jiyana me.

KOŞK
*me koşkek ava kir
stûn ji tîrêjên şeveqa nemrûd
pace ji dengê hesenê cizîrî*

Mem Ronga bêguman yek ji wan gewretirîn helbestvanê helbesta Kurdî ye, mixabin ev zatê hêja ji zû ve ye helbestan lê nake, ez weke helbesthezekî Kurd dehw û doza wê pêûsa dilpiyar dikim ku Mem Ronga qeydên vê veke û me ji helbestine weke "Koşk"ê bêpar nehêle.

Pelê Payîzê

govendek destpêdike li bilindahîyê
xwe li ba dike pelekî ji rengê hemû zer û soran
li ber bayê sar î payîze
tenê lerz e ew
li vê berêvara dereng
li jêr dinêre
li axê
li jor
li asîmanê ji ewrên rengerisas tikandî dinêre
ne dest ji darê dibe
ne dikare li hember gazîya axê xwe ragire
werr
dudil dimîne demekê
paşê
xwe ber dide
bi giranî datê xwarê
li jor dinêre careka din
li asîmanê bilind
li pelên mayî
bî keser radimûse axê
û
piştî xwe dide bayê hênîk
hiltîne serê xwe
diçe.
di dil de xembarîya refên çivîkên koçer"
-Mem Ronga-

Mem Ronga kî ye?

Mem Ronga bi navê xwe yê din Mehmet Tanrikulu yek ji helbestkarên nifşa "Tîrêj"ê ye. Ew di sala 1952'yan de li Farqînê hatiye dinyê. Wî Enstîtuya Perwerdehiyê Beşa Zimanê Tirkî li Amedê kuta kir. Weke mamoste li Nisêbîn, Mazidax û Spartayê kar kir. Ji bilî helbestê edîtorîya "Tîrêj"ê jî kir. Piştî Derba 12'ê Îlonê ji ber kar û xebata xwe ya wêjeyî û siyasî, di sala 1986'an de mecbûr ma ku derkeve derveyî welêt û çû Almanyayê. Niha jî li wir karê mamos-tetiyê dike.

Berhemên wî;

Destê min li destê te digere (Helbest, Weşanên Mezopotamyayê, Swêd, 1995.)

Ferhenga Kurdî-Tirkî (Swêd, 1999.)

Jêderk:

1-Arjen Arî-Bakurê Helbestê

2-Kovara "Tîrêj"ê, hejmar 1-2

3-Malpera "Nivîskar"ê


Bi Keça Mîr Celadet'î Sînemxan'ê Re Li Ser Bavê Wê Hevpeyvînek

Hevpeyvîn: Kovara "Çirûsk"ê

-Dotmîra delal, di "Ronahî"yê de, li ser wêneyan diyalogeke we bi bavê we re heye. Wêneyên "Hawar"ê û "Kurdmanç"bûna wan û wêneyên "Ronahî"yê û biyanîbûna wan, ev bîranîn tê bîra we?

-Mixabin ez wê demê gellekî biçûk bûm û niha nayê bîra min.

Çirûsk
28



Sinemxan Celadet Bedirxan

-Dotmîra delal Sînemxan, tê gotin ku romana Memed Uzun'î ya bi navê "Bîra Qederê" ya bavê we Mîr Celadet Alî Bedir-Xan'î ye û Memed Uzun'î ew diziye û li ser navê xwe weşandiye, gelo ev tişt rast in an na?

-Ez dixwazim ku ev propaganda kirêt a li ser Mehmet Uzun'î êdî ji holê rabe. Ev çend sal in çûye ser dîlovaniya Xwedê û pêûsa wî di edebiyata Kurdî de gellekî giranbûha ye. Di şûna vê propaganda kirêt de ez dixwazim ku em propagandayên erênî bikin, ji ber ku ew hêjayî Nobela cihanî bû.

-Xanima delal, Celadet hem bavê we û hem jî bavê modernîzma(nûjeniya) Kurdî ye, ji ber vê yekê, ji ber ku ew kesayeteke girîng e em dixwazin nas bikin ku

ew “kes”ekî çawa bû? Celadet yekî çawa bû? Çawa dixebitî, çawa diaxivî, çawa difikirî? Ji kerema xwe re hûn dikarin hinekî ji me re qala wî bikin.

-Ez naxwazim ku zêde behsa bavê xwe bikim, lê kesayeta wî di dîroka gelê Kurd de diyar e. Mirovekê gellekî dilgerm û nefsbîçûk bû, berî hertiştî armanceke xwe hebû û jiyana xwe jî bi awayeke sistematîk li ser wê armancê damezirandibû. Gellekî baş diaxivî û bi awayekî neteweyî û Kurdistanî hizir dikir.

-Têkiliya Mîr Celadet’î bi nivîskarên weke Cegerxwîn, Qedrî Can, Osman Sebrî û herwekîdin re çawa bû? Têkiliya nivîskarên wê demê çawa bû, li ser çi bû? Carinan di navbera wan de nexweşî derdiketin an na? Wan çi ji hevdu re digot, wan çawa hevdu destek dikir û herwekîdin...

-Têkiliyeke wan a gellekî germ û xurt hebû û xema wan a herî mezin dûrbûna ji welêt bû. Karê wan li ser hişyarkirina gelê Kurd û bilindkirina asta rewşenbiriya Kurdî bû. Encama kar û têkiliya wan jî berhemên wan ên giranbuha diyar e.

-Prensese delal, di mirina bavê we Celadetê hêja de hin tarîfî hene. Rast e, ew di bîra nav erdê xwe de werbû lê ne di encama qezayekê de tê werbû, ji teref îstixbarata wê demê ya Sûriyê ve di bîrê de hat werkirin. Ji ber ku wê demê dewleta Sûriyê ji Fransayê serxwebûna xwe bi dest xistibû û welatparêzekî weke bavê we jî bo “yekûtî”ya Sûriyê xetereyeke mezin bû û Fransayeke ku Sûrî bisekinanda jî êdî tune bû; herweha apê we Kamiran jî li derve di aleyhê Sûriyê de ji bo mafên Kurdan dixebitî. Dêya we Rewşen Xanim di pirtûka xwe de weha dibêje, “Berî mirina xwe bi çend rojan, weke haya wî ji mirina wî hebe Celadet’î ez tesellî dikirim ku piştî ku ew bimire divê ez dîsa jî xurt û li ser xwe bim, weke ku

wî ez hazirî mirina xwe dikirim.”

Gava ku ev element giş dikevin ser hev mirov dibêje ku Celadet di bîrê de wernebûye, hinekan ew tê werkiyê. Jixwe mirina têwerbûna “bîr”an bi serê xwe di nav çanda Kurdan de hêmaya mirineke bişaiye ye; gava ku mirov nexwaze ku li ser mirinekê dûdîrêj bisekine, dibêje “di bîrê de werbû û mir”, gelo fikra we çi ye di vê mijarê de?

-Ji bo ku mirov gotineke bi vî rengî bike pêwîst e ku mirov lêkolîneke berfirê li ser bûyerê bike.

-Dotmîra delal, îroj em gellek Kurd, nivîskar an jî ne nivîskar, Celadet’î ji xwe re weke “bav”ekî dihesibînin, weke qîza wî ev tişt we hinekî dihesidî-ne yan na? Ji ber ku di navbera zarokan de carinan hesûdiya dê an jî bavê çêdibe? Hestên we çi ne gelo?

-Ez nadexisim û ez gellekî serfiraz im ku ez keça bavê xwe Celadet Bedirxan’î û dayika xwe Rewşen Bedirxan’ê me.

-Dotmîra delal, li ser pirtûkên Mîr Celadet’î, bi şertê ku baş û hêja derkevin hûn qayîl û razî ne ku her sazî an jî weşanxane li wan xwedî derkeve û wan biweşîne.

-Ev tişteki baş e, lê heta ku ez sax bim ez dixwazim ku ew raya min jî wergerin û bizanin bê ka gelo ez di vî derbarî de çawa hizir dikim, gelo ez razî me an na...

-Hûn ji Celadet’î re keçeke çawa bûn an jî Celadet ji we re bavekî çawa bû? Ez ne şaş bin hê gava ku hûn biçûk in hûn bavê xwe winda dikin. Têkiliya we û bavê we têkiliyeke çawa bû?

-Bavekî gellekî dilovan bû, mixabin dema ku me winda kir, ez hê biçûk bûm û min nekarî ez ji ezmûna jiyana wî ya giranbiha û jî zanyariyên wî sûdeke zêdetir wergerim.

~~Çirak~~
30



-Li ser siyasetê em pîrsekê bikin. Celadet çawa nêzîkî siyasetê dibû? Di 1948'an de gava ku li Rojhilatê, Qazî Mihemed û hevalên xwe "Komara Kurd a Mehabadê" ava kir bertek û reaksiyona Celadet'î li hemberî vê bûyerê çi bû?

-Piştî têkçûna serhildanên Şêx Seîd û Xoybûnê ew bi xem û kesera wê şikestê êdî bala xwe zêdetir da karê rewşenbîrî. Piştî wan têkçûnan gihîşt wê baweriyê ku rizgarkirina welêt ne bi tenê bi çekê pêk dihat û pêdivî bi pênûsê jî hebû. Ji bo vê yekê jî ji bo hişyarkirina gelê Kurd xebitî.

-Dotmîra hêja, Mîr Celadet Alî Bedir-Xan'î ji kîjan hunermendî, nivîskarî, fîlozofî, filmî, bajarî û xwarinê hez dikir?

-Hez ji hunermend Meryemxan'ê û Hesên Cizrawî dikir. Hez ji nivîskarên Fransî jî dikir û gellek berhemên Fransî jî wergerandiye Kurdî (di "Hawar"ê de) Bajarê ku herî zêde jê hez dikir "Cizîra Botan" bû.

-Prensêsa delal, li ser navê kovara "Çirûsk"ê em pîr spasî we dikim û em dibêjim ku em ê mîrat û keda Celadet'î tucarî li erdê nehêlin.

-Ez jî gellekî spasî we û hemû xebatkarên kovarê dikim. Gellekî spas ji bo we ku hûn xwedî li vê mîrata Celadet Bedirxan'î derdikevin.



Mîr Celadet Alî Bedir-Xan

Xerîbek li Gundê Me

Yunus Eroğlu

Çirûsk
32

Miriyekî xerîb hat gundê me. Ji mêj ve ye min dîtibû ku derasayîbûnên xewnan ên dema ku mirov hişyar dibû mirov metel dihiştin, li welatên miriyan çawa dirûvên asayî ne. Lê, sosreta werê... ev cara yekemîn e ku ez dibînim. Di serê wî yê kupiyayî de, tu rû û serçav nebû. Kesî ew nas nedikir. Vî telîsê pehn, pelçiqî, pelixî û şîûmorbûyî weke tevekên miriyên vî gundî, bi rêyeke dûvedirêj xwe gihandiye vir. Naxwe ew jî ji vir e. Lê, çawa kes wî nas nake? Ev heftsed sal in ku hema bibêje hemû kesên ku çî yên ji berberiyê, çî yên bi bêbextî û xwînîtiyê, çî yên bi dehw û dozên ol û êl û azbetiyê, çî yên bi nexweşiyên sivik û giran, çî yên piştî temenê dirêj û paqij bi ecela xwe, çî yên ji sedemên ku hîn jî em pê nizanin mirine, bi awayekî hevdu dinasin. Lê yekî bê çav, dev û rû; û bersiv nedida tu pirsekê, bêlome be, xwene digihê reha kîjanî ji me?

Bê gili û galegal, xwe da kêleka gomeyê li biraniya gundî. Şûn û şopên sor û şîn li ser laşê wî weke birînên teze dixuyin. Çend miriyên zarok li dora wî dibin vizik û bi xeberok û tiştanokên ji dema xwe lotikan didin.

“Ez mezin bibûma, min hîç xwe tazî nedikir,” dibêje Hemo, bi wî bejn û temenê xwe yê kinik. Di nav dêlangezaya hevalên xwe re, ku weke siyekê bi dora miriyî ve dadileqin, fitikekê diavêje hewayê. Rûyê gişan weke kilsê ye.

Tapikê heftsali, ku nivîşteke kesk bi ser çengê wî ve ye, xwe di ber wan re hil dike, “Belkî min zarokatiya wî dîtibe,” dibêje, “heke min zanibûya ev îsal çend sal in ez mirime.”

Rahişt tilikên wî, di nav ên xwe re derbas kir, weke ku bi darikan bilîze. Li cihê ku jê werê şûna çavan bû nihêrî.

“Asika Koçer hebû li qeraxa golê. Em diçûn hewşa wê xoxan. Gihayek ji Guhera Bilişê tanî, navê wî nizanîm,” dibêje Risto. “Wexta ku wan ew di serê mirovî de dida porrê mirovî ne îşê gurr dibû. Belkî hîn jî hebe. Mirovî di serê wî bidaya...” Kefa destê xwe dibe serê wî yê bê pirç û weke bi êgir bûbe vedikişîne. Zarokên din deng nakin. Wan ne Asika Koçer ditiye, ne dizanin Guhera Bilişê li ku derê ye.

Di nav van zarokên ku gellekên wan bi sal û dewran dûrî hev, weke xal, ap û nifşên pirr berî hev an di pey hev de, kêr hebên ku nifşên heman demê, tayên hev here. Seîd û Simo ne tê de. Du hevalên hev ên zarokatiyê. Di heman rojê de ji dêya xwe bûne, wan di heman rojê de ji dinyayê bar kiriye. Yek jê ji sorikan çû, ê din di çem de fetisî. Carinan wexta ku çêrr û sixêfîne xerîb ji zarokên pêşiyên xwe dibihîzin, mit û mat dibin. Du zarokên hê nû fêrî listik û qerqesûnên zarokên nifşên bavik û kalikên xwe dibin. Kêlikên gorên wan ên weke stûyên xwar xwe spartibû hev, li biniya nigê gora bavê min bûn.

Ew jî bi heyecanêke fûrekî tev li hilboqî û qerebalixiya zarokan a li dora wî miriyê

ecêba giran dibin, ku weke gurmola mêşên li dora berateyekî, diçû heya di cem holika serê tarê re derdiket.

Miriyên herî kevn ên gundê me, ji bîst bavikê Salarê Meyro'yî, ku hîn sax e û li gundî ye bigire heya deh bavik û deh dayikên ku neviyên hinan ji wan niha ji gundî bar kiriye û hinan ji wan ez nas nakim, li bin vê holikê rûdinin misêwa. Di binê vê holika ku hermeleke nizam ji kengî de bi rewtekî wê yê terklêketî ve hilawistî de Xalê Rizgo dimîne ecêbmayî ku çawa kes vî miriyê nû yê zirrêcêb nas nake.

"Heger ne pêxemberek be, çawa kesekî viyê hanê tune gidî?" dibêje û milên xwe di ser serê xwe re dibe, ji cihê paldayî. Weke mirovên wê demê kirasekî spî lê ye.

Ji bo ku zarok bela xwe tê nedîn, Memkoyê Bedrî, ku bi yanzdeh salan ji bavê xwe mezintir e, ji aliyekî de meqesê li porrê bavê xwe yê li ser kevirekî rûniştî û berbancekek li dora serî pêçayî ye dixê û ji aliyê din deng li zarokan dike ku ji wî rebenî bihevin.

"Erê dinyayê," got yekî. "Belkî hayê feqîro jê tune be ku miriye jî."

"Hez dikî em bangî apê Mellê bikin bila bê di guhê wî de bixwîne, belkî rêya dengî lê vebe," dibêjim, lê pê re pê re li bêfahmiya gotina xwe vardiqilim. Axir kes pûte bi min nade.

"Destê xwe nedinê," dibêje Fêris, berî ku li Rîşê Kuna were kuştin dêya min ew li bal Tehtikê Pisikê, bilûr di devan de, dîtibû. "Belkî li xerîbiyê çêbûbe. Yan na, heke li gundî bibûna helbet wê yekî ji me ew nas kiribûya."

"Axir wî jî axa xwe ditiye..."

Pêşiyekî me, yek ji bîst bavikan, bi cilûbergên xeftanî, cardin dest pê dike behsa wan demên weke miriyekî tenê, sobe, li vê derê li benda hinan maye, dike. "Wexta ku min ev gund ava kir, min digot tenêtiyeke weke wêya hanê tune. Ez û pîrika we Etfo tenê, pêşî li şikefteke li Palê, bi dûre di xanîkekî ku me bi hişkeberê li wê piştê lê kir de, bi salan man. Çaxa kurikê me yê pêşî çêbû jî, hîn kes nehatibû vir. Ji dengê wehşan û teyrân, êvarî agirê tifika me timî vexistî bû û em li ber serê zarok dibehdilîn. Naloherê, tîrsa rawiran li ku, tîrsa me tenê mala bavê Etfoyê bû. Em ditirsiyan ku şopa me bigerînin û bi ser me de bigirin... Heya şevê mala Ramtiz'î, koçmal, bi diyarê gundî ve ketin. Di guhera Ramtiz'î re, ku dawiyê navê wê werê ma, tevî barê du fil û du deveyan hatin. Heke ew rojeke din jî bi derengî daxilî gundî bibûna, belkî me lê xista em ji wir biçûna êdî." Bi hoqhoqa kenekî riha şûjik şûjîkî ya Kalê Ramtiz'î diritrite. "Lê heke min zanibûya ez ê li vê dinyayê jî tenê bimînim, min qet li a din Dêrîş ava nedikir. Heya ku miriyê ewil, keça Ramtiz'î ya ku bi dayê diket hat, min guman dikir ku wê kesî rêya vî gundê bêşûn û şop dernexistibe û miriyên me tev wînda bûbin. Min xweziya xwe pê anî ku ez jî li axa ku lê ji dayik bûbûm vegeyriyama." Berî herkesî miribû û berî hatina miriyekî, li gorî wî, biqasî temenekî dem ajotibû. Tu nabêjî wî jî nizanibûye ku bi avabûna gundekî giyanê mirovî jî tev li axa wê dibe.

"De axir tu kur û qîzên xwe li ber çongên xwe dibînî, bapîr," dibêje yek ji neviyên wî, ku jê pîrtir dixuyê, û civatê îşaret dike bi destan.

Tim û dayîm wext bi van nîqaş û guftûgoyên ku pêlên dem û dewranan li hev dizivîrînin derbas dibe li vir. Kuştî û kujerên hev dûr û dirêj gîrr û cirrên xwe yên berê dixivin; ên ku tiştin di dilê xwe de veşartibin, çi rast çi derew, gişan dibêjin, êşkere dikin û taliya talî hemû nîqaşên zaro û neviyan tînin bi meseleya Bapîr û Kalê Ramtiz'î digîhê. "Berî ku ez bi Kura Zava bikevim û di guherkê re dakevim, çavê min bi wê newala gundî bikeve, min di dilê xwe de got pişt wî giyarî cehnem be jî ez ê koça xwe li wir deynim," dibêje Kalê Ramtiz. Ez li koça ku di tariya şevê de bi ser jin û mîr û pitikê tenê û bêkes de dertê difikirim. Dibînim ku çawa her gav nîqaş û qayîşkêşana zaro û

neviyan di bin perdeya sar û tarî a zemanekî dûr de ditepise.

Li vê dera ku ne roj heye ne şev, galegal û pirsên ku doxika çerxa demê ne her û her dewam û dubare dibin. Lewra tutîşt naqewime li vir. Bê xew û razan em dipên û di vê navê re xelekên jiyana hezar salî ya gundê me digihînin hev. Pîrr dijwar e ku yek ji yekî du-sê nîfş beriya xwe jiyana dema wî fahm bike. Herweha fahmkirina wan a hin tiştên ku di dema wan de nîn bû lê di ya vêga de hene gellekî sext e. Axir nîfşên di navberê de bikêr tînin û em dikarin hevdu serwest bikin. Nexasim miriyên ku koçî deverên din kirine û li wir mezin bûne, ew qala hin kesên ku bi binyad ji gundê me ne lê li wir çêbûne û nema bi zimanê me dizanin dikan. Ew jî, dema ku dimirin diçin wan cihên dûr.

Bes, herku diçe miriyên ji gundê me kêr dibin. Xwene li wir hew weke berê mirin çêdibe an kesên ku li gundî çêdibin namînin? Evê ku nû hatiye jî xeber nade ku mirov jê bipirse.

Herî dawî dema ku ez mirim û ji wir hatim vî aliyê heftê mal hebûn di gundî de. Lê niha, li vir: biqasî ku di derekê de hilneyên pîrr in.

Ewê ku simbêlekî tenik li ser lêvê, serê xwe xûl kiriye ber guhê bapîrê min tiştêkî jê re dibêje. Heçko bi dizîka. Lê, ma çiyî bi dizî maye? Gava ku xeber dide, şewqeya wî ya bi ser porrê wî yê spî de hinekî dişiqite, eniya wî ya fîreh di qermîçekan de dimîne. Herroj tê li binê wî diwarî tiştêkî ji Bapîrê re dibêje û diçe. Min li dinyayê berê ew nedîtibû. Pîrika min li ber deriyê şikeftê, li benda bavê min dimîne dewla avê ji çehlê bikişîne. Dolaba sac di nav destan de, kelefek hirî di bin çengan de ye. Dîmeneke wê ya pîrr xurt heye ya dema dinyayê, zindîtiyê, hişê min li nav hev dixê, ji kelecana wê gavê çavê min xumamî dibe, tiştêkî jî hev dernaxim. Bendekeya çilo li ser kerê me yê şîn, ew jî li pey, ji hemiya me, ji alî benderan dihat. Ji nişkan ve berfê dabûyê, piştî wê hinekî xûz bûbû, şareke sor li dora çarika serê wê bû. Heya gihabû gundî ez çêbûbûm. Min ev ji hevalê xwe Qasim'î re got, bawer nekir. Gote tu dîn î. Te xewn dîtiye. Ma mirov hê çênebûbe, çawa dibîne. A wa Qasim li wir e. Tevî tivinga xwe û rextên xwe yên çarçoço li ber rezê Mamedê Reşo'yî nahtorvaniyê dike. Min jî ji dêya xwe û bavê xwe re negot. Negot ku min pîrika xwe dîtiye. Û heqet jî, pîrika min tam bi awayê ku min ew berî ku werim dinyayê dît bû. Niha piçêkî ji qamdeketî li ber deriyê şikefta bal sergoyê gundî rawestiyaye. Li benda bavê min e. Bavê min wê avê bibe hewşê, nizanîm ji bo çi, belkî yek çênabe. Belkî yek namîre, naşon. Lê xuya ye, li benda bavê min e. Lê ew dolaba xwe ya ristinê datîne û diçe bal bavê min. Bavê min avê ji çehlê dikişîne, xwêdan bi ser reha stûyê wî dikeve. Bi tiliya xwe bapîrê min ê bi wî zîlamê biyanî re dixîve îşaret dike û ji bavê min re dibêje: "Min tîm digot, ew mêrik çiqasî mezin dibû dişîbiya bavê xwe. Xezûrê min jî eyn weha bû. Hem exlaqê wî, hem dirûvê wî." Bi rastî jî, pîrr zehmet e ku mirov karibe bapîrê min û bavê wî ji hev derxe. Çi bigire di heman temenî de mirine û bi şêl û tîmtêla xwe ji bav û lawekî bêhtir dişîbin cêwiyan.

Bavê min dewla avê diavêje erdê û tif dike. "Dîsa ew," dibêje û berê xwe diguhere. Tu nabêje ewê biyanî xezûrê bavê min e, ango kalikê min e. Herroj ji gundê pişt giyêr tê ji Bapîrê re dibêje, "Qewlê me ne weha bû," û diçe. Bapîr xwe ji ber diwarê herema me nade alî. Piştî xwe dide kevîrên diwêr ên weke keziyên zer ên keçekê hûnandî û gihayekî di devê xwe de dicû.

Hîrehîrek bi çend zîlamên ku ji nav erdê kevîrxaran tînin dikeve: "Me got qey wê vê carê ne weha be," dibêje yek ji wan, lê hê gotina ku ne xuya ye ji devê kîjanî ji wan derketiye temam nabe, çavê wan bi miriyê biniya holikê dikeve û sewt ji wan dibire.

"Ka miriyekî vê dawiyê tune ji me re bêje ku ev çi teba ye?" dibêje yê ku mehdê wî ji gişan xweştir. Merivekî me ye. Wê keçika ku herî dawî wê ji dinyayê koçî vir kir, ji alî dibistanê bi bazdan tê. Ew dibistan berê jî hebû, lê tiştê ku vê keçika ku ji nexweşî-

yeke sêngê miriye dibêje niha yekîneyeke leşkerên dewletê tê de bi cih bûye. Ma birra wa pismamê min Ûsiv: li wê qereqolê bi lêdanê hatiye qopkirin, loma hîn jî dikule û diricife.

“Min viya hanê nedîtiye,” dibêje keçik. Pîrr kes jî gundî rabûn. Belkî ew jî ji wan be.”

Dîtina nedît, xwe li ber Bîra Sor dibînim. Hewarê, li wir, li ber devê çehlê ye. Ji cihê ku xwe berdabû û xeniqandibû, li ava çehlê dinere. Terhikeke genimî di nav destê wê de ye, hêdika diheje. Kêzikeke heccê li ser devê bîrê xwe dilivîne. Şêxo, weke her car, li nav erdê nokan bi pîreka xwe re şerr dike. Felek, li ser caniya xwe ya sor, li ser rêka Bilişê, ji bo rasta Dêra Romanî ku wê lê were kuştin, dibezîne.

“Lê,” dibêje Remezanê xwediyê xana ku zemanekî li gundî hebû, çaxa ez xwe li ber xerzika biniya xanê dibînim. “Miriye vê dawiyê pîrrên wan jî tiştên nû dimirin. Me ev tişt nizanibûn.”

Dîtina nedît, jî hêla Palê reşê pîrejinekê dixuye. Ji mêj ve bû ji wê rêyê miriyek daxilî nava gundî nebûbû. Herçiyê ku dîmir û ji dinyayê koç dikir, ji rêya nav rezan dihat û lewma navê wê rêyê maye Riya Koçê. Tam ez jî dikim lê bixim herim nav zarokên ku li pişt malan bi kevîrxaran dilîzin, ku tevên wan, gellekî beriya min, rojekê di hejokekê de di şikeftê de fetisîne û hatine vir, dilê min dişihite û ez bi alî wî reşê bi alî gundî de dibezîne tîm. Ez di ber kidasê mala metika min re diçim, pisîka min xwe jî ser piyê hewşê çeng dike ser kidasê. Li serê qorziyê pêrgî wê pîrejinê tîm. Hufekufek pê dikeve, bi hilmegulmeke nexweş xwe bi ser min de ditewîne. Serê min maçî dike: “Mala min şewitî,” dibêje, tîna hilma wê bi qemçika min dikeve. “Wê belalûka stûyê te hîn jê neçûye. Egîdê min.” Tê bîra min. Dêya min e. Ji bo belalûka min, çiqasî ez gerandibûm, lê çi tiştê ku bikêr dihat li min nehatibû û belalûka min jî min neçûbû. Vêga ez jî lê vardiqilim. Hîn jî heye. Weke libek nok mezin bûye. Belalûka min. Û dêya min. Çiqasî pîr bûye. Çavên wê hûrik bûne, hew mane di wan kortikan re herin xwarê û wînda bibin. “Egîdê min, ez qurbana te,” dibêje û min di hembêza xwe de diguvêşe. Dibêjim kûr û digirîm. Pala xwe dide dîwêr û piştê wê ya xûz hêdî hêdî bi dîwarê xaniyê mala metika min ve dixirike, tê xwarê. Li ber dîwêr ketî, rûniştî, serê min mist dide û nivî bi kenî nivî kelogirî, di guhê min de dike pistepist: “Ka ye Seyîd, birayê te, kurê min, ne ew jî hat vir. Berî min hat, ma te ew nedît, he bexê min? Go yadê va ez diherim, tu jî werî ha, he?” Ji nişkê ve sînga wê hiltê û kûrekûreke hişk pê digire. Îskeîska wê tevî kuxik û hêşiran tehdeyeke mezin li gewdeya wê ya zeîf dike. Radîhêje destê min û radibe. Bi gavên lezaleza min li pey xwe dikişîne, wexta ku em di ber tendûra mala me re diçin, keserekê vedide, “Erê lawo,” dibêje. “Niha hevîrê Xezê tîrê bûye.” Metika min Xezê hîn nehatiye. Ew hîn li gundî ye qey, yadê? Ew ê jî nemire qey?

Berê xwe dide bi hêla hêwirzeya zarokên li dora gomeyê li binaniya holikê de û ji nişkan ve destê min berdide, hildikume pêş. Xwe digihîne wan, weke kêrendiyekê wan tiş dike û diavêje ser wî eyarê sor ê mirovan. Wî laşê gennî û hincirandî. Wî şiklê bêteşe. “Lawo!” diqîrre, bi qîrre wê re bavikên ku li bin holikê rûniştî ji cihên xwe çeng dibin. “Erê lawo!” dibêje, xwe bi ser de diquncifîne, serê wî bi rûyê xwe ve dixerpişîne. Zarok xwe didin alî. Bi çavên belîsk lê dinîhêrin. Hizhizî û tewtewe, bi wî laşî ve, ku birayê min bû, kîp dibe. Birayê min Seyîd. Bavê min ew nedît û mir. Li ser rêya Stewrê mir bavê min. Dêya min her şev ji me re digot. Seyîd fahm nedikir. “Rêya Stewrê diçe ku?” digot, biçûk bû porrê wî xelek xelek. Niha porrê pê ve nemaye. Seyîd, Seyîdê birayê Egîdî, kurê Asoya jinebî, bavê wî li rêya Stewrê hate kuştin. Kalikê min ji bo vê timî dihat li biniya newalê, li ber dîwarê hûnandî ê herêma me bi Bapîrî re xeber dida, digot “Qewlê me ne weha bû.” Gund bi çewêçewekê bi ser hev de diçe û tê. Bavê

min bi helkehelk di deriyê hewşê re dertê. Porrê wî yê şayik bi eniya wî ve zeliqiye. Weke zavayekî ye bavê min. Simbêlê wî jî tune. Pîrika min ji devê şikeftê, kelefek ta li dora milê wê gerandî, "Cahilo meçe," dibêje, "lê to ew bi bazdan diçe. Axx ax, ji kerbê we. Reha we gişan yek e. Tu yê jî bibî weke bavê xwe û bapîrê xwe." Kevir û ber ji ber piyên wî yên xwas dipekin, xwîn ji ber pêçiya serî ya piyê wî tê. Bi nav remilka gundi ve dikeve. Tê, dikeve nav hêwirzeyê. Radiweste. Gav. Radiweste. Gav. "Min got neçe, çû," dibêje Pîrê. "Yan na..."

Bi destê wî digirim, li min vardiqile. Pozê wî, pozê Seyîd'i. Û belkî ê min jî. Pozê me gişan weke hev e. Berê wî zoq li min, çavên wî weke ku tîn bi hev ve bizeliqin. Da ku çetir bibînin. Da ku min bibînin û bi çavê mezin û bel min bibihîze ku bibêjimê, "Yabo, va dêya min. Wiyê hanê jî Seyîd e. Seyîd, piştî ku te da ser riya Stewrê bi rojekê çêbû. Seyîd tu neditiyî, yabo. Niha jî nabîne. Seyîd birê min e Yabo, kurê te ye. Lê pozê wî... Pozê wî tune. Wan pozê wî jê kiriye. Wan guhên wî jê kirine."

Dêya min dawa xwe dide hev, dikeve milê Seyîd'i, laşê tijî deq û qursikên sor. Ji dêya min dirêjtir e. Serê wî li ba dibe, dikeve ser çengê dêya min û bi lingê kulek dimeşe di nav xelkê re. Siyeke tarî di ser rûyê dêya min re diçe. Weke ewrekî. Newêre, belkî şerm dike, serê xwe ji ber xwe demaxe. Nema dike îskeîsk. Ez û bavê min, em jî bi hev re didin pey wan heya malê.

"Piştî ku hinekî guvurî, firroke bû, me got em ê ji gundi rabin," dibêje yadê. Li ber tifika hundir. Sar û sermayek çêdibe. Weke çaxa ku ez di zikê wê de, hîn çênêbûbûm, Pîrika min ji êzingan dihat.

"Şerr derket, qereqol hat, rez şewitî, pisîka Egîd'i di çêhlê de werbû, me got em nema dikarin li gundi bimînin..." Lê ez, piştî ku pisîka min a gewrik mir, bi tayê ketim. Em bi rê nêketin. Sê mehan di nav cihan de bûm weke qurmik, mam lepek. Çavên min zer bûbûn xwene, dinya zer bûbû, qet û maxên banê xênî bi ser min de dihatin û weke qayîşê vedizeliyan. Dûr diketin, çavên min tijî ronahî dibû, û şalîka li dîwêr bi ser min de nixûn dibû, tariyeke fetisok ez dipêçam. Û ez mirim, nexwe?

"We çawa debar kir li wî bajarî, hûn neçûna, ma kesî negot?" dibêje bavê min, diranên wî spî weke libên birincê. Li hemberî jina xwe ya pîr weke zarokekî naşî ye. Terrîşek li pêçiya xwe girêdaye. Xwîn lê hişk bûye.

"Ma me yê çawa li gundi debar bikira? Piştî ewqasî... Hertîşt diqede," dibêje dêya min bi axîn. "Hertîşt diqede, Mistefa, derdê bav û birayan, derdê qessasên te... lê ev derd qet neqediya." Kutekuta sînga wê tê me gişan. Ji min werê tê ku Seyîd jî xwe li ser vî dengî dileqîne, hewl dide ku serê xwe ber bi cihê dengî ve bigihîne. Dêya min destê xwe datîne ser serê wî. Şûna lêvan. Kefa destê xwe li çermê rût û pûç digêrîne.

"Tîştên ku wan anî serê wî," dibêje hêdîka, bi dengê kûr. "Wan jî min re nedigot. Dawiyê di televîzyonê de derket. Bi şev min şamborek li ser sêlê dipahtin. Min termê wî di televîzyonê de dît. Wan ew xistibû çî halî. Ev ne mirin bû, ne weke mirina rêya Stewrê bû, Mistefa. Wan miriyek kuştibû." Lêvên wê diricifin. "Jana mirinê da dilê min. Jixwe ez a çûnê bûm. Lê ew... wî sêwîka. Di gula emrê xwe de. Hîn nû me yek jê re xwestibû..." Dengê tîrretîrretê ji nav tifika ku di dîwêr de tê.

Serê xwe di paceyê re derdixim. Dibêjim qey ez ê bifetisim. Bêhna min diçike. Guhên min giran dibin. Mozqirtkek di nav serê min de digere. Dike vinevin. Siyareya paceyê li dora xwe dizivirre. Dikim nakim, nasekinê. Dest û piyên min ber bi çerxa wê dikeve. Reşê pîra min bi diyarê benderan ve dikeve. Pîra min tê. Berf tê.



Hêvî

Paul Eluard

Wergera ji Fransî: Remezan Olçen

Çirîşk
37

Şev tu caran ne ripîreş e,
min bi xwe cerribandiye!
Guh bidê, hişş! Guhdar be
dawiya êş û kulan
pencereyeke vekirî heye,
pencereyeke ronî!
Xeyalek, mirazek hertim heye,
bicihanîna xwestekan,
têrkirina birçîbûnê,
dilên germ û comerd,
destên bi laveyan dirêjkirî,
û çavên nezerbicoş dibiriqin hene
jiyanek heye jiyanek
ji bo parvekirinê!

Bîr

-Çîroka Metoyê Dîn-

Bawer Ronahî

*"birayên min wisa xweşik mirin,
wisan tahnistran mirin
hûn bibinin
hûn dê ji kêfan bimirin"*

R.J.

1

Însanan gotiye; dinya bi dor e ne bi zor e. Gellek caran xeberên wisa ecêb tîn guhê min. Min got guh? Nizanim, min guhek heye an na? Ez bêjim haya min jê çêdibû wê duristtir be bawer im. Belê, mirovên badilhewa bi sal û demsalan her ew gotinên pûç û vala dubare kirin li ser jiyan û mirinê. Lê hûn ji min bipirsîn, ez ê bi hezaran serpehatî û bi milyonan çîrokan ji we re bêjim ku di ber ên min de hezar hezar sal e hê jî mirov li ser jiyan û mirinê tutiştî nizanin. 'Esas ne hewce ye ku bizanin jî lê mereqa beşerî mîna bireke bêbinî ye dostino; mêrxasek kevirê biavêje tê de heftê hezar babaegîd nikarin wî kevirê derxin. Wey gidî benîademên belengaz! Hûn nizanin qeder, roj bi roj tevna xwe li ser dartevna vê dinyaya fanî çawa vedihûne... Na, hûn ê tucarî jî nezanin ezbenî!

2

Ez ê, ji kûrahiyên bîra xwe çîrokekê bikşînim ji we re. Heke we bi guhê guh guhdarî kir hûn ê baş tê bigihîjin ka ez li ser fanîbûn û badilhewayiya însaniyetê çima wisa ketime nav galegalan... Çîroka min jî ne wisa kevnare û dûrmenzîl e. Tam du hezar çar hezar û sê sed û heştê roj berî niha. Lê divê ez çend kat û lehzeyên beriya çîrokê jî biavêjim nav diwanê ku civata min û we xweştir bigere. Biborin, salnameya min û însanên li ser wextenehatiyên dûdirêj hesaban dikin, li hev nagire helbet. Divê ez bi zimanê we, bi zimanê sal û salnameyên we bêjim: duwanzdeh sal. Belê ez xulam, duwanzdeh sal berî niha, Cenabê Heq fermana xwe şand û destpêka vê çîrokê bi hunerbaziyeke bêhempa li min da kirin. Gava ku ez vê hostetiya îlahî fêm dikim roj bi roj hemd û senaya min, pesn û methê min bo Rebbê Alemê zêdetir dibe. We huw'e 'ala kullî şey'in qedîr!

Ez bêsebrîya we dinasim camêr û canikên rojlîxwebihurîner! Helbet, ez baş dizanim ku vê bêsebrîya beşerî çi derd û elem jî peyda kirine û bûye qedereke reş di mohra nivîsa deftera wan a qedîm de. Axir, bila çîroka min li mêrg û zozanên çîrokên din neçêre. Ez ê yekser biavêjim tewlê ku bila hiş û mejîyê we ji xwe re hûnandina vê çîroka ku hostetiya Xwedê T'eala nîşê me hemûyan dide, bike guhar, têxe guhê xwe.

Ma ne sereke armanca çîrokvegotinê şîretkirina îlahî ye? Werin, ji xwe re şîreta heq ji vê çîrokê bigirin.

3

Xortek hebû. Na, biborin! Divê ez weha dest pê bikim: Hebû, tune bû! Belê, zimanê we çîroka xwe weha dide destpêkirin.

Hebû tune bû. Xortek hebû, bîst û yek salî. Di bihara xwe ya geş û rewnaq de, bê kes û kus li gundekî dûrî çavan dijiya. Xortekî wisa dilpak, bê xeta û guneh li tu derê dinyayê peyda nedibû. Jê re digotin, "Metoyê Dîn". Bi rastî jî dîn bû an nebû ez nizanîm ezbenî. Çîroka dînbûna wî ez bi safî zelal nizanîm a rastî. Qewlê min û wî hinekî dereng li hev hat. Axirkelam, Metoyê Dîn, di gundî de wisa bi keyf û şahî, wisa bi henek û tirane jiyanek dibir serî, tu yê bêjî qey ji bo bextewariyê dînbûn neçarî ye. Gotina we mirovan e ev jî: Kêf kêfa dîn û bêaqilan e. Bi tevî serpêhatiyên bêbext û teşqeleyên dinyaya zilmkar, kêf kêfa Metoyê me jî bû. Di xîrbeyê serê berê mezin ê gundî de, bi tena serê xwe heyateke munzewî û derwêşane kiribû para xwe û dilxweşiya hemû şênîyên gundî jî li ser nanê xwe yê tîsî, weke nîvîşka zozanên têrşîr, belav dikir. Xwedê ji we jî ji wî jî razî be, Ehmedê Mistê hebû li gundî. Tucarî neçar û birçî nedihîşt dînê me yê xwînşêrîn.

Çîroka
39

Meto nedişîbiya dînen ji vir de wê de. Şêwaz û tevgerên maqûl ji xwe re -nizam ji ku-peyda kiribûn, bi zimanekî qayîlker ji mirovan hertim av dixwest. Av, ma ne parga herî bêxêr e?! Lê Meto'yî av hema wisa nedixwest. Mesela, du roj piştî ku bûka Miheme Eliyê Nalbend, Fatima Hecî Îsiv hate gundî, Meto çû ber deriyê wê û pê re civatek weha ecêb gerand:

Xêr e Metîno, tu birçî yî ma?

Na, birçîtî dijminê îmanê ye Fatimcan. Ez hatime avê.

Tu têhn bûyî ma?

Na, têhnî jî dijminê îmanê ye bûkê. Tu jî ehlê îmanê yî, divê tu bizanî.

Meto, ka bêje tu yê çî ji avê bikî, soz ez ê bidim te.

Ji bo destmêjê dixwazim malava. Ma ez ê çî ji avê bikim!

Civatên Meto'yî yên li şîpanderên malên gundî, tucarî neqedîyan. Lê herkesî jî xweş dizanî ku parsekê avê, parga xwe ne ji bo destmêjê diemiland. Diçû, poşeta tijî av virrî diavêt bîra li pişt deviyên ziyaretê. Kesî nedizani Meto'yî ewqas poşetên reş ji kû tîne û çima ava xwe vala nake lê bi poşetê ve diavêje bîrê.

Sal û demsalên parsekê me weha bi civat û mihebbetên bêserûbin diçûn û felekê jî jê re tevna xwe bi tayên reş vedihûnand êdî. Meto'yî, rojê pênc caran, weke nimêjê-ke yek reka'et 'eda bike, berê xwe dida mizgefta xwe. Mizgefta wî ew bîra avê bû ku bi poşetên Meto'yî yên reş hema bêje nîvenîv tijî bûbû.

4

Rojekê ji wan rojên şilopilo bû. Baranê tavî li ser taviyê direşand û xwe li kevir û berên gundî ve dizeliqand. Meto'yî ne guh dida berfê ne jî baranê. Bi pêlavên xwe yên şekalkî, li ber baranê serbilind lê lavekar diçû ber deriyê mirovan. Saeta we benîade-

man pênc û nivê êvara sêşemê bû û heyva pêşîn a çiriyê xwe ber bi çiriya paşîn ve dikişkişand. Meto'yî bi teqûreqa xwe ya kubarî deriyê mala Ehmedê Mistê da ber kulman. Camêr, bi xweşbîniyeke îrankamil bişirî ji Meto'yî re. Bêyî ku tiştêkî bêje berê xwe da hundir û gavek paşê di destî de satila avê, vegeriya. Satila xwe bi ser respoşeta wî de vala kir. Kêfxweşî û spasiya parsekê me jî destpêka civatkeriya wî jî weke herdem bû:

Xwedê bereketa xwe bêxîte ez xulam.

Tu yê dişa biçî nimêjê?

Erê. Ez ê destmêja xwe bigirim û berê xwe bidim mizgefta xwe.

Ma ne baran tê?

Xalê Ehmed, tu bi îmana xwe, ma ez yê wê me ku ji rehmeta Xwedê bitirsim û xwe biavêjim mala xwe tirraliyê bikim?

Ê va ye tu şilopilo bûyî Meto. Heta baran disekine nimêj neke ma nabe?

Ehlê îmanê divê herdem li ser nimêjê be. Bi destûra te ezbenî, ez ê biçim, bila nimêja min qeza nebe.

Kuro banê mala te dilop dike Meto?

Çirîşk
40

Dilop û şirrik bi ser min te bê jî ez nimêja xwe qeza nakim xalo! Tu qet xeman nexwe bo min.

Gava ku Meto'yî bi beza xwe ji ber dêrî xwe avêt nav wê barana payîzî, Ehmedê Mistê'yî kenê xwe bi tevî şaşwaziyekê di pey wî de berda:

Ya staaar! Ev kur wê di bihuştê de ji me re cih û qunceke nehele ha!

5

Gava Meto'yî bi tehs berê xwe da "mizgefta xwe", min jî êdî ji bo ku fermana Xwedê Te'alayê Mezin -Celle Celalihû- binim cih berê xwe dabû gundî. Gava ku ez weha bêjim bila rêwîtiyek filan neyê bîra we ha! Ez ne rêwîng im. Hebûna min ji xwe hertim li ser rê û rêçikan, çûn û hatinê ye. Geh li wê derê dinyayê geh li wî gundê xewle, axirkelam ez weke bayê bezê dinyayê di bin xwe de dikim mehfûr.

Ji bo karê xwe ez tu qasid û navbeynkaran nakim belaya serê xwe û tukesî. Haşaaa, ew ji min zêde ye jixwe. Hosteyê Mezin, tevîkarê hemû pergalên biçûk û mezin, bi hibra qelema xwe ya îlahî ew qeder û qeza ji mirovan re, ji qewlê elestê ve nivîsiye jixwe. Ez bi xwe qasidê Wî me û wê rojê jî gava ku Meto gav bi gav ber bi mizgefta xwe ve diçû, bi lez, du qasidên din ên ku Rebb-il 'Alemîn parçeyek ji qedera wan jî li ser wê bîrê bi bennikê jiyana Meto'yî ve girêdabû, hazir û nazir peyda bûn. Saet ji şeşan çarîk kêr, roja sêşemê.

Metoyê parsekê avê gava ku bihemdê dilî xwe nêzîkî bîrê kir, du celebmirovên bi cilên reş jê ve xuya bûn. Wî mêvan hebûn ji mizgefta xwe re. Safîkê ehlê îmanê Meto,

“çima” û “xêr e”yên pirsîyariya mêvaniyê neanî bîra xwe. Hema li ser girekî biçûk, di nav daran re, di destî de poşeta reş a tijî ava parskirî, bêyî veciniqîn, bêyî şaşwazî, bi awirên vikîvala û bendewar li wan temaşe kir. Tam sih û du saniye. Ne zilaman li wî dinihêrî ne jî wan baran ji şilahiye dihesiband. Depikên dirêj ên li ser devê mizgefta Meto’yî bi lezûbez rakirin û li ber çavê wî, -ne poşetêke reş- zilamekî navsere mîna çewalekî tijî, bi dûre jî xanimek hinekî din ji zilamî ciwantir mîna balgehekî sivik, bi alîkariya hev ji parxaça erebeya xwe ya spî derxist û wan avêt nav mizgeftê! Û min ji çar aliyan, çavdêriya qedera Meto û wan herdu zilaman dikir. Dawiya saniyeya sih û duyemîn ez li ser devê bîra, li pişt wan herdu zilaman bûm.

Bi dûre bi dengê teqîna çardexwirekê Meto hîlbeyî û qîrîna xwe ji serê wî girê biçûk di guhê wan herdu zilamên cilreş de berda. Du saniye, tam du saniye bihurî û paşê zilamê bejndirêj destê xwe, ji ser bîra rakir û ber bi Meto’yî ve dirêj kir. Qontraqûna biçûk a çardexwira wî ji min ve mîna zîvê biriqandî xuya bû. Biqasî yekemîn dilopa ku kete ser berika çardexwira wî, dudulî û nexwestinî di hiş û dilê wî zilamî de peyda nebû. Ez dizanim, ji ber ku gava bi tiliya xwe ya şehdê tetik kêşa, ez li ber wî sekinibûm.

Çavên ku naxwaze bibîne tucarî ji hebûna raz û efsûnên heyata bêdawî qayil û bi bawer nabe helbet. Lê min di hemû dilopên xwîna Meto’yî de jî îmanêke bêdudilî û safî zelal bi hemû sorbûna xwe ya bêhempa, dît. Ji ber ku ez li ser berika çardexwirê heta li ber eniya Meto’yî jî çûm. Berik ez bûm. Wê lehza ku mirinê xwe li Meto’yî pêça, ez, “berikê ecelê” ji zû ve li qurmê darekê ketibûm û tê de asê mabûm.

Çirîşk
41

7

Zilamên cilreş termê Meto’yî rakir û bi hemû bêhurmetî û nepakiya dilên xwe wan ew avêt bîrê. Nimêja Meto’yî qeza bû lê poşeta ava destmêja wî bi wî re heta binê bîrê jî çû. Ji xwe gava ku min ruhê wî parsekê dilpak û hilmîştî ji pozê wî, bi nermiya pem-bûyê safî nûr kişand, Meto’yî bi hêza xwe ya dawî tiliyên xwe bi poşeta xwe ve şidandin. Ne ku zilaman termê wî li erdê nekişkişand... Lê dîsa jî ava destmêja xwe berne-da xortê salih’emel ê ku di bîst û yek saliya xwe de bihuşt Xwedê Te’ala bi ava pars-kirî qezenc kir.

Ruhê wî gava ku bi min re bilindî ezmanan dibû, Meto’yî bi çavên ji ber lerza sikrata kurtedem tijî hêstir bûbûn, pirsî:

Ya melekê Rebb-il ‘Alemîn! Xwezî te bihiştî nimêja min qeza nebûya.

Min pirsî wî xortê bihuştî, bi nermahiya ruhê wî bersivand:

Heke nimêja te qeza nebe, ew herdu qessasên ruhkevir wê çawa biçin cehnemê Metînê delal?..

Li Malê...

Marîn Rehman

dîsa weke her car ajaweyên jiberkirî
mixabîna sal û temênê valaçûyî
reqreqa reqsa diya min a li ser sîcadê
giriye xwişka min a ji bo serlehangê sereke yê rêzefilm
û serxweşiya min a hercarî
bi vê pênûsê
pengizîna hêviyên demên ku
divê bihatana jiyîn
pitikên ku divê bi zanebûnî
li ser destan bihatana lorandin

Lorînkê; tu jî ji xwe re li qada xwedê
bi seyra me xwe mijûl bike
heta roniyek nekeve vê civatê.
qene tu neyê haaa!

Şeva ku ji Her Şevan Reştir

Çîdem Baran

“Ma qey tû yê li serê me bibî rahîbe? Binihêr! Heya sibê bifikire, baş bifikire weke min got; heya sibê wexta te heye. Êdî rêçekê ji xwe re hilbijêre. Bi vê rewşê tu ne bi kêrî dêrê, ne jî mizgeftê tê!!..”

Ji gotinên bavê xwe hêrs bû, heya Xwedê hêz dabûyê deriyê ji derve bi şida vekir. Got; gurmm li du xwe girt û derket. Çakêtê ku di destê xwe de li ber devê deriyê hewşê li xwe kir. Bestika wî bilind kir, fulara xwe baş li stûyê xwe û li derdora guhên xwe pêça.

Çîdem
43

Heya ku jê dihat di nava du bihost berf de gavên xwe bi lez diavêtin. Bi wê lezê qederê sed metrî dûr ketibû an neketibû dêya wê ya dîlîz bi tena kiras û bi terlikê di nîvê kolanê de rawestiya. Bi dengê kelegirî heya hêza wê hebû gazî wê kir: “Zelîx! Zelîxa weke dêya xwe bêsiûd! Keçê vê şeva ku ji serma stêrk diricifîn tu yê bi ku ve biheribî?! Ji bo xatirê dêya xwe ka vegere! Min di mitalan de nehêle! Were bi ya bavê xwe bike! Hema bibêje; de qey qedera min weha ye, ma wê çi ji te kêmbibe?! Qet ji tune de bi derewan bêje temam...!!!

Zelîxeyê mîna ku guhên xwe şimma kiribin tew deng nebîr xwe. Bi xîşpexîşpa berfa di bin lîngên wê de kolana ku dêya wê berra dû dabû li pey xwe hiştibû. Piştî demekê, dûdirêj li kevîka kolanê rawestiya. Ji bêrika çakêtê xwe pakêta xwe ya cixareyê derxist. Pakêta ku hebek cixare tê de mabû kir nava lêvên xwe yên ku ji hêrsan û hînkî jî ji serma dilerizîn. Vêxist û pakêta vala bi hêrs virvirrand nava tenekeya çopê ya li hemberî xwe. Bi avêtina pakêtê re pisîkên eware yên ku di nava tenekeya çopê de veciniqîn, her yek bi derekê ve beziyan.

Hem hilmên dûdirêj li cixareyê dida hem jî dimeşîya. Bayê tuj ê ku bê rawestan diboriya li cixareya wê dixist bi arî vedixwar. Heya ku gihîşt qûnikê neavêt. Îcar destê ku pîrr cemidîbû jî rada bêrika çakêtê xwe. Ji seqemê laşê wê mîna eyarê deveyê bi hev ve dijidiya. Diranên wê li gorî bayê ku diboriya dirikrikîn. Dengê rikrika diranên wê ew jî nava xwe bi xwe axaftinê dernedixist. Ji hêrsan, ser dilê wê, weke aşekî li ber çemekî gur lê dida. Ji firnikên xwe dihilmijî. Dikir nedikir peyvên bavê wê ji bîra wê nedîçûn. Çi bi ber biketa pehîna xwe lê dida, hêrsa wê danedinişilî. Di serê wê de mîna replîkên şanogerekê herdem vedigeriya serî. Herku replîkekê dora xwe dîkir, biqasî ku dengê wê bê wê, di ber xwe de digot; “Tu dîn î. Ma qey dîn bi heft seriyan

in? Çi dînen ku li dinyayê hebin giş xwe tazî bikin jixwe wê herkes zanibin ku ew dîn in. Tu dîneke bêar î. Tu dîn î. Tu dîn î bi wî Xwedayê tenê tu dîn î. Hem jî dîneke beradayî yî. Ma qey em xerabiya te dixwazin? Em dixwazin ku te bi pismamê te re bizewcînin ew tenê dikare te zîn û berzîn bike. Tu dibêjî, na min qoş û qoşbend bikin. Tu dîneke bêaqil î. Heger tu dev ji hawekên xwe bernedî teqez ez ê te biavêjim tîmar-xaneyê. Tu yê di wir de bibî seroka wan. Dînê! Dînê! Dînê! Dîna çolan!!”

• Herku ew peyv dihatin bîra wê, xwêdanê, xwe berra ser azayê laşê wê dida. Hêstir dibû. Hema wê gavê dixwest ku dev li canê xwe bike. Carinan jî dixwest ku bi dengê herî bilind biqîrre û bibêjî: “Ev jiyana min e û bi xweşiya min diçe. Ez dixwazim ku bi vê rewşa ku li gorî we dîniya herî mezin e bijîm. Ma hûn daqoqên serê min in?” Mîna ku heft hebên weke qantiran xurt dest xistibin qirrika wê nikaribû têr biqirriya û dilê xwe rehet bikira. Dixwest ku bigirî, bêhna xwe fireh bike, nikaribû. Tu yê bêjî qey stêrkên ku di kanîka çavên wê de li ber tava germa gelawêjê zuha bûbûn. Çavên wê mîna du libên hinarên vizvîzikê sor bûbûn. Tu yê bêjî qey agir ji çavên wê dibariyan û bi tenê dilê wê dişewitand.

Piştî ku wê neh, deh kolanên dirêj bihurandin, di nivê kolanekê de rawestiya. Bi nêrînine baldar li hawirdorê xwe nihêrî. Weke dewara ku li ber dorê ku gêrê dike li derdora xwe zivirî. Destê xwe avêt bêrika çakête xwe. Ji bîr kiribû ku pakêta vala virvirrandiye. Bi fêrbûna binhişî li bêrikên xwe gişan geriya. Ne pakêta ne jî tîra pakêtekê pere pê re hebûn. Di nava wan mitalan de tizbiya xwe di destê xwe de mîna berdûşên Amedê hejand. Gorristana taxê ya pîr mezin ku di zarokatiya wê de gellek şevan malovaniya wê kiribû hat bîra wê. Ew şevên ji ber sedemên weke xortan heya derengê şevê li kuçeyan dilist û şevder dima hat bîra wê. Tev weke filmekî li ber çavên wê de bihurîn. Tizbiya xwe leztir hejand. Tu yê bêjî qey bi xwe re ketibû pêş-baziye.

Rewşa zarokatiya xwe û ya a niha da ber hev. Bişirîneke muzirr xwe avêt ser rûyê wê. Hêdîka bi aliyê gorristanê ve meşiya. Rewşa gorristanê ya ku li ser berfê çend dewsên lingan hebû hinekî ew tirsand. Herçiqaşî bi navê “Kek Ehmed”î dihat nasîn jî tirsîya. Wê jî nizanibû ji çi, çima ditirse. Pîr zor be jî qebûl kir ku ditirse. Di dilê xwe de got, “belkî jî herkes ji gorristanê ditirse.” Bi piştî hinekî rawestiya. Tam dikira vegere, çi fikirî ne ez ne jî bawer im wê zanibû venegeriya. Ber bi nava gorristana ku kêlên miriyan hema dihatin xuyanî ve meşiya. Meşa wê di dewsa hin lingan de ber-dewam dikir, li ber kêla gorrekê çav li komek xortikên ku çend heb ji taxa wan bû ket. Di destê her xortikî de poşetêke ku nava wê tijî balî, kesê nizanibûya wê bigota qey binevşên quntara Araratê bêhn dikin bi kêf bêhn dikirin û wan dikişand nava xwe. Wê kêliyê ne kêfa Zelîxê, ne jî tu tiştekî wê yê din amade bû ku here bal wan. Hîn tibabekî dûrî wan bû, bi çavlêketina wan re berê xwe da şivîleke din. Dewsên lingan nebûn û bi zehmetî gavên xwe diavêtin. Hîn wê di şivîlê de li ber qevzên xwe dida, xortikekî hejar ê di nava fiqspîbûna berfê de çavên wî yên reş ên girs ku pîr xweşik bûn ji nava wê koma xortikan rabû bi lez ber bi wê ve hat. Ji hejarbûnê an ji ber kişandina baliyê bû nizanîm dişewîşî vî alî, wî alî. Bi zehmetî xwe gihand nêzî wê û bi dengê xwe yê ku hîn bêhna zarokatiyê jê neçûbû got, “Kek Ehmed bi xêra bavê xwe ka cixareyekê bide me lo! De heydê lo, bila xêra te be. Tu pê xizan nabî. Dê lo, ez bi qurban gunnê te bim, hew yekê lo...”

Wê gavê pîr dixwest ku cixareya wê hebûya, ne yek hema pakêta xwe giş bidayê. Mixabin tune bû. Zelîxê bi dilekî tasewas lê nihêrî. Bi kotekî pê da fêmkirin ku cixare pê re tune ye. Dawiya dawîn xwe ji nava destên wî xelas kir. Wî xortikî çiqasî jê bawer kir an nekir nizanîm wê jî rêya xwe berdeyam kir. Herku bi deverên xalî ve diçû hebûna berfê rêveçûna wê zortir dikir. Lê wê dîsa jî rêya xwe didomand. Li cihekî kûr û ewle digeriya, li ber kûrahiya kêlekî rastî zilamekî simbêlsor î serkeçel î ku tîrî zikê wî jî wî mezintir bû hat. Di destên wî de şûşeyek bîra bê rawestan vedixwar. Gava ku çav li wê ket rawestiya, bi nêrînine nexel lê nihêrî. Ji nêrînen wî yên mîna gurên birçî bizdiya. Zayenda wê a ku bi bîra herkesî nedihat hat bîra wê. Bi çend gavan bi paşve çû. Heya karibû bi lez ji wir bi dûr ket. Tu yê bêtî qey sîxûrên har li pey wê bûn.

Pîştî kêliyêkê gava ku bi ser hişê xwe ve hat dît ku gihîştîye “Mizgefta Mewlana”yî. Qasekî li Mizgeftê nihêrî. Bi derengiya şevê re herder diket nava bêdengîyeke kûr û tarî. Ji ber derengiya şev û seqemê kêmkirî ku li dora Mizgeftê bala sîxûrên li wir peywardar dikişand. Sîxûrên ku di nava keşîrê li hemberî Mizgeftê bala xwe dida tevgera wê. Nêrînen herdu sîxûrên li ser rewşa wê a ku li gorî bavê wê û hin kesên din mîna ya berdûşan bû digeriyan. Mîna ji nêrînen wan ên bi tetel û bi wate bireve revîrev ji wir reviya. Nizanibû bê lingên wê wê bi ku ve dibe bi tenê direviya. Wê jî nizanibû ji wan sîxûrên, ji bavê xwe an jî ji xwe direve, lê direviya. Heya bêhn lê çikiya rawestiya hêdî hêdî meşiya. Mîna kalên ku xurîfî bin bêtî ku zanibe diçe ku diçû, bi tenê diçû. Diçû lê ew ê heya ku biçûya?

Çirîşk
45

Herku şev dizîzikî seqemê berfa li erdê dikir mîna tehtan. Hew karibû di wê rewşê de bêtir bimeşe. Di nîvê kolanêke ku tucarî ew nedîtibû de rawestiya. Kûr û dûr li xwe, li dê û bavê xwe, li hevalên xwe fikirî. Ji nişkan ve hevala wê Leyla a kargehê ket bîra wê. Êdî ji kirasê kalên ku hişên xwe wînd kirine derket, kêfxweşiyekê bi dizî li ser rûyê wê yê mîna gulên da der, rast berê xwe da taxa Harmancikê.

Şev dizîzikî û ew jî li dora mala Leyla'ê dizîzikî. Bi çavên Zelîxê şeveke ji her şevan reştir û dirêjtir bû. Wê çavên xwe li der û dorê gerandin. Tewiya, zixurekî biçûk dît û avêt paceya wê. Yekî din, yekî din jî, heya ku Leyla'yê paceya xwe vekir. Gava ku çav li Zelîxê ket pirtûka ku di destê xwe de danî ser qeryoleyê, çakêtekî sivik avêt ser milên xwe, xwe bi ser hev de evciqand û ber bi deriyê hewşê ve beziya.

Mîna ku biçin diziyê bi dizî derbasî odeya Leyla'yê bûn. Pîştî ku mesele bi Leyla'yê da fêmkirin pirtûka ku li ser qeryoleyê ya Bîlge Sûmer'ê bala wê kişand, rahiştê, berê bi vî alî wî alî ve zivirrand. Li stûrbûna wê nihêrî. Di ser ewqas westandin û bêtîyê de rûpelên wê li hev qûlipandin. Êdî ne di şeveke tarî de, ne di taxeke nezani de di nava helbestên wê de xwe wînda kiribû. Leyla mîna ku li hemberî nedeynkirina wê ya ji dêvla civatê xwendin hîlbijartibû bertekê bide bi hêrs rabû. Çakêtê li ser milên xwe ji ser milên xwe danî. Kincên xwe ji xwe kir. Şevkiraskê xwe yê pembe ku bi temamî an sê bihost hebûn an tune bûn li xwe kir, becemayekî yek rengî hîlbijart, dirêjî Zelîxê kir. Heya wê gavê haya Zelîxê jê tune bû. Bi dengê wê re serê xwe ji nava nepenîya helbestan rakir. Sertapê li wê nihêrî. Av bi devê wê ket. Li

ser hev xweziya xwe daqurtand. Çavên wê qederê niv bihostî ji hev vebûbûn. Tu caran, di xewnên şevan de jî evqasî nêzî qîzikekê nebûbû. Pirtûk di destê wê de dile-rizî. Leyla mîna ku hîn jî jê hêrsbûyî be xwe avêt ser qeryoleyê. Xwe gêr kir, got; “şev baş” û betanî avêt ser serê xwe.

Zelîxeya ku li ser kevîka qeryoleyê rûniştî xwe hinekî bi ser hev ve da. Di dilê xwe de tiştin derbas kirin û cardin xwe berra nava rêzikên pirtûkê da. Di nava wan rêzikên helbestan de çend rêzikan pirr bala wê kişand. Di xwendina duyemîn de mîna ku dengê wê bê wê di ber xwe de xwend:

...
Şa bûm
bi wê jîna xweşik re
bi cihên wê yên namehrem
yê ku hîn tukesî nedîtiye.
Hemû xêzên laşê wê
di destê min de dieciqî
bêhna serê memikên wê
tevî hilma eşqê dibû,
ji lêvên wê
ew hilma ku min dikişand nava xwe
û em tevî harmoniya şevê dibûn
ew jin bû,
ez jin bûm.

Çirîsk
46

Leyla'yê serê xwe ji bin betaniyê derxist li nava çavên wê mêze kir. Bi dengê narîn got; “ji kerema xwe re di dilê xwe de bixwîne. Ez ê sibe biçim karî.”

Di hilmekê de xwendina pirtûkê qedand. Heya niha ne tu pirtûkên weha ditibû ne jî xwendibû. Hêdîka rabû bi baldarî pirtûk danî ser maseyê. Du, sê caran di odeyê de çû, hat. Ev rêzikên hanê di serê wê de aliqî bûn, mîna pilaqa xerabe digot; “ew jin bû ez jin bûm, ew jin bû... Li çîpên Leyla'yê yên ku ji binê betaniyê derketibûn nihêrî. Di navbera bedewiya wê û helbestên Sûmer'ê de diçû, dihat. Li bin guhê hevdu ketibû. Bi daqûrtandina ava devê xwe re nedigihîşt. Mîna pisikên sibatê dixwest ku bike nûrenûr. Hedanî pê nediket. Çû li ser kevîka qeryoleyê li nêzî paqên Leyla'yê rûnişt. Destên xwe yên ku dilerizîn hêdîka ber bi paqa wê ve dibir. Bêhna tenê wê kişand nava kezêba xwe. Wê bêhnê bi tumerî ew hejand bi dengê lertzokî bangî Leyla'yê kir.

Leyla'yê betanî ji ser xwe da alî, bi çavên xezalî yên ku mêtî jê difûriya ew ber bi xwe ve kişand. Zelîxê şevkiraskê wê jê şeqitand, memikên wê yên ku serî hildabûn ji nava memkiraskî derxistin û devê xwe avêt wan. Destên herduyan li ser her derê hevdu digeriyan. Lêvên wan li ser laşên hev di cihên xalî de diçêriyan. Xwêdanê xwe berra ser sîng û berê wan dabû. Germahiyekê bi herduyan girtibû. Laşê wan mîna ku ar pêketibe sincirî bû, lê hîn jî diricifîn. Ji bêhişî porrên hevdu gijomîjo û hevdu gez dikirin. Xwe bi xwe heya ku wan xwe ji keçantî de xist ranewestîyan.

Ji nişkan ve Leyla'yê xwe lebitand, betaniya heyî jî ji ser çû. Zelîxê bi lez destê

xwe yê ku nêzî paqa wê kiribû ber bi xwe ve kişand, a wê kêliyê, rastiye, sêwirên wê giş hilweşandin. Sêwirên ku tucarî evqasî xweşiya wê neçûbûn.

Bi tevgera Leyla'yê re li rastiya xwe vegeriya. Rastî jî vegeriya, vegeriya wê rastiya tund û ji hertiştî nexwestir. Ji ser qeryoleyê rabû lêva xwe ya jor kir nava diranên xwe, têr tijî mêt. Xwêdana li ser aniya xwe a fireh paqij kir. Bêdeng rahişt çakêtê xwe yê ku bi piştî dêrî ve daliqandîbû li xwe kir û derket ji derve.

Dîsa li kuçeyan bû, dîsa tenê û bêcare bû. Ji xwe reviyabû, nebûbû, ji dê û bavê xwe reviyabû, nebûbû. Êdî ji hevala xwe ya ku herî pirr jê hez dikir jî reviyabû û dîsa nebûbû. Ew dîsa tenê li kuçeyan bû. "Kuçekê" bû, erê di zarokatiya xwe de hîngî li kuçe û kolanan digeriya navê wê bûbû "Kuçekê"...

Dîsa di vê şeva ku ji her şevan reştir de di kuçeyên tijî berf de bûbû mîna kalên xurîfî. Li pey lingên xwe diçû. Di nivê kolanekê de leqayî serxweşekî ku li wê holê mîz dikir hat. Serê xwe tewand di nava wê berfê de bi hêviya ku daşirekê bibîne meşiya. Piştî lêgerîneke dirêj dît. Çû li hemberî daşirê rawestiya. Di nivê du deriyan de geh li wî derî û geh li deriyê din dînihêrî. Xwedê kesî bêbiryar nehêle, lê ew bêbiryar mabû. Nizanibû ku bikeve kîjanê, bikeve deriyê ya ku sembola jin li ser, an ya ku mêr li ser. Çend kêliyan di nava hest û rabirdûya xwe de çû û hat. Ber bi deriyekî ve diçû, a wê gavê zilamekî serxweş gazî wê kir; "Hişt Xorto! Ma qey tu serxweş î?! Ew ne ya mêran e..." Bi peyvên wî re berê xwe da ser rê, meşiya. Qet li dû xwe jî neniherî, bê rawestan rêya xwe domand.

Tavê amadehiya derketinê dikir. Rengê derdorê hinohino vedibû. Sofiyên rehdirêj ji bo nimêja sibehê bikin diherikîn mizgeftan. Li nêzî mizgefteke mezin di rêyeke çar-yan de rawestiya. Bi fêrbûna salan destê xwe avêt bêrika xwe, dîsa bi şûnde kişand. Tunebûna cixareyê hiş di serî de nedihîşt, ew hêstir dikir. Bi hêrs di cihê xwe de qelemîska rûnişt, qûnikeke cixareyê ya ku hîn venemirîbû li ber çavên wê ket. Rahîştê, zû bi zû kir nava lêvên xwe yê qalind, du qurtik be jî kişand kezêba xwe. Û di ber xwe de, xwe bi xwe got; "va bû sibe û min hîn jî rêyek jî xwe re hilnebijartiye. An dêr an mizgeft. Herdu bi hev re çênabin. Ji xwe bavê min min dûrî herduyan jî dibîne. Îcar divê ez biryarekê bidim. Biryar ax biryar!..."

Karwanên Stêrkan

Jan Ziryan

diçirûsin ji şewqa axê
di newqa xewnên derrabekirî de
dibirûsin bi debarake dardekirî
dikurrisin mirûzê ruhstînî

li morîkên windayî
digerin gêrikên gernas
bi tena serê xwe, bi niqrîskên zuha
bi rûyên birû, bi tehdeyên durû
wêneyên xêzkirî dibînin
di albuma moristanan de
bi çavên kilkirî
bi destên nexşkirî
bi dilên deqkirî
dikolin erdê pilopilo

karwanên stêrkan
ji mêj ve dibêjin
em ji dîloyî re dengbêj in
her mirinek li moristanan
dibe stêrk li ezmanê gorristanan

Kuştina Cerdonekî

Şengul Ogur

Rojek ji rojan dema ku ez çûbûm malê, hîn ez rûnenîştibûm her sê hevalên min ên malê, bi peroşî û şanaziyeke mezin got ku wan îroj cerdonekî nehîteyî di malê de kuştiye. Dema ku wan behsa kuştina cerdonê malê dikir, di çavên wan de çirûskên dema ku mirov ji karekî bi serkeftî derdikeve diyar dibin, diçûn. Te digot qey wan ne behsa kuştina cerdonekî reben lê behsa rizgarkirina welatê xwe yê ji destê dagirkeran dikir; ji karê xwe yê kirin ewqasî razî bûn!

Çirûsk
49

Hevalên min ên ku bi gotinan êdî nekarîbûn kêfxweşiya xwe diyar bikin, li hêviya min bûn ku ez jî xwe li ber çemê wan ê serkeftinê berdim û ez jî kêfxweşiya wan a jî vê kuştinê bi parve bikim, wan pîroz bikim ji bo ku wan karekî weha pêk aniye.

Lê piştî demekê, dema ku hevalên min ên ku xwe di axaftin, kêfxweşî, peroş û şanaziya vê bûyerê de winda kiribû, dema ku tiştê ku hêvî ji min dihate kirin wan nedibû û berovajî ya ku wan ji min hêvî dikir; dema ku wan di rûyê min ên ku li hemberî wê bûyera ku behsa wê dihate kirin cemidî bû û di çavê min de awirên xemginiyê, ya jî vê bûyera ku behsa wê dihate kirin peyda bûbû dîtî, şaş bûn û bi awayekî ku gazinan ji min bikin, wan ji min pirsî bê ka gelo ji bo çî ez jî vê kuştina cerdonê malê ne kêfxweş im. Û ji bo çî kêfxweşî û şanaziya wan bi parve nakim?

Piştî bêdengiyekê kurt, min li nav çavên hevalên xwe yên malê ku her sê jî xwendevanê zanîngehê bûn nihêrî û bi hestiyarî û bêhtengî ji wan pirsî: “Ji we heye ku we karekî zehf baş kiriye?” Dema ku hevalên min ên malê ev pirsê min bihîstibû wan tu wate nedabûye pirsê min a ku min ji wan kirî. Loma ew li bendê bûn ku ez ji wan re bibêjim; “helal be ji we re! We tişteki zehf baş kiriye!”

Dema ku wan pirsê min bihîstibû ji wan heye ku ez henekan bi wan dikim. Ji bo vê jî, ji ber ku hîn bi rastiya pirsê min negihîştibûn, li ser çav û lêvên wan hîn şopên kêfxweşî û şadiya ji kuştina cerdonê malê mabû, hebû. Lê bi berdehamiya axaftina min re rewşa hevalên min guherî û rengê kêfxweşiyê yên li ser rû û çavên wan veguherî rengê poşmaniyê û xemginiyê. Ber bi dawiya axaftina min re, êdî av bi çavê hevalên min ketibû û dikir ku bigirin.

Li hemberî vê bûyerê min jî xwe winda kiribû û ji hevalên xwe yên malê re weha digot: “Ma gelo malbateke we tenê heye? Ma malbateke cerdonî jî nîn e? Ma zarokên

cerdonî, dê û bavê cerdonî, xweh û birayê cerdonî lê napirsîn? Nabêjin ka gelo çi pê hat? Heke⁹ ku cerdon mê be û çêlikên wê hebin, ma çêlikên wê, wê li benda dêya xwe nemînin? Ma bavê wan çêlikan wê li hevala xwe nepirse? Ma mafê we hebû ku hûn mafê jiyanê jê bistînin? Qey hûn mafê jiyanê bi tenê ji bo xwe dibînin?” Axaftina min bi vî rengî berdewam kir, heta ku li menzela ku em lê û li tevahiya malê bêdengiyê-kê serdestiya xwe danî.

Piştî axaftina min, yek gotin ji hevalên min çênebû. Hemûyan piştî xwe dabû dîwarên odeya ku em lê rûdiniştin. Axaftina min bandoreke mezin li wan kiribû. Ew tê gihîştibûn ku wan tiştekî pirr neçê kiriye. Wijdanê wan êdî li pêşberî wan rawestiyabû û ew didarizandin.

Ez jî li rewşa malbata cerdonê ku hatibû kuştin difikirîm. Gelo ew niha di çi rewşê de bûn? Gelo ku ew mê be, çêlikên wê hebûn? Hevalê wê li wê difikirî? Û pirsên bi vî rengî min ji xwe dikirin.

Ode ji bêdengiyê kerr bûbû. Derengiya şevê jî bêdengî kerrtir û tîrtir kiribû. Lê em hemû bi lêxistina deriyê malê re ji vê bêdengiyê hilçenîn û bi ser xwe ve hatin.

Bi bihîstina dengê dêrî re, me hemûyan bi tirs li hev nihêrî. Di vê derengiya şevê de yê ku li deriyê me bixe, bivê nevê polês in. Ji wan pê ve tukes di vê saetê de, bi vî awayê ku weke derî bişikîne li deriyê me naxe. Mehd li me zer bû. Me ne dizanî ka em çi bikin. Serê 15-20 saniyê deng ji dêrî dihat.

Belê, ji polêsan pê ve wê ne tukes be. Ma ji wan pê ve kî wê were, di vê derengiya şevê de bi vî awayî li deriyê me bixe.

Bi tirsî ku êdî wê şevê em ê bêne girtin û êşkencê, sixêf û heqeratan bixwin min derî vekir. Çi bibînim Xweda! Cerdonek... Belê, cerdonek rabûye ser piyên xwe û dîq dîq li nav çavên min dinihêre, li bibikên çaven min dinihêre weke pirsên: “Ka xanima min!? We çi pê kir zalimino!?” ji min bike li min dinihêrî.

Cerdonê ku li ber dêrî li ser du piyên xwe rawestiyabû, ne weke cerdonan lê weke însanan dinihêrî. Çavên wî weke yên însanan bûn. Ne tenê çavên wî, herweha awirên cerdonî jî wilo bûn. Hestên mirovan çawa di çavên wan de diyar bibin, hestên vî cerdonê ku li ber dêrî jî di çavên wî de diyar dibûn. Di çavên cerdonî de, ew tirsî ku êdî wê hew hevala xwe bibîne, îhtimala ku ew hatiye kuştin û êşa ku bi vê îhtîmalê re peyda dibe hebû.

Çavên cerdonî tijî bûbûn. Dilopeke hêsirê di keviya çavê cerdonî de hêdî hêdî, giran giran dilerizî.

Dema ku min derî vekiribû û çavê min li cerdonî ketibû nizam çi bi min hatibû. Ez di cihê xwe de cemidî bûm. Tu liv û tevger ji min çênebûbû. Weke ku xwîna min bice-mide li min hatibû. Lerzekê xwe li hemû cesta min pêçabû. Mûyên laşê min hemû cit bûbûn.

Erê min dîzanî ku ew jî hest dîkin, li hev dipirsin û diêşin lê min qet nedîzanî ku êşa wan jî û pîrskirina wan jî weke ya mirovan e.

Dema ku min cerdon li ber dêrî dîtibû, weke ku li pêşberî min zilamek hebû û bibêje; “ka jîna min kanî? We çî pê kir?”

Ji bo vê jî, her çendî ku min hewl dida ku ez êşa ajalan fêhm bikim jî, bi dîtina vê dîmenê re ez tê gihîştîm ku min hîn dinyaya ajalan baş nas nekiriye.

Ya herî balkêş jî ew bû ku wî cerdonî çawa ew deng ji dêrî derdixistibû. Ji bo ku cerdonî karibûya bi vî awayî deng ji dêrî derxista, tekane rê hebû, ew jî ew bû ku cerdon bi himmet xwe li dêrî bixe. Naxwe wekîdin ne pêkan bû ku cerdon karibe wî dengê bişid ji dêrî derîne.

Piştî sê-çar çirkan min û cerdonî li hev nihêrîbû, ji ber ku min hew karibû vê dîmenê ragirim û min bi tîrs derî li cerdonî girtibû û çûbûm odeyê, bal hevalên xwe. Hevalên min ji pîrsî bê ka gelo yê ku li dêrî dixist kî bû.

Bandora bûyerê hîn li ser min serdest bû. Dema ku wan pîrsî bê ka gelo ew kî bû li dêrî dixist, min nizanibû ez ê çawa ji wan re bibêjim ku yê ku li dêrî dixist cerdonek bû û likûbûna cerdonê hatî kuştin ji min pîrs dîkir. Heke min wilo bigota hevalên min wê bi çavên ku ez dînek bim li min nihêrîbûna.

Çirîşk
51

Min bersiv neda hevalên xwe. Jixwe hîn ez li cihê xwe rûnenîştibûm dîsa deng ji dêrî hatibû. Berî ku hevalên min biçin li dêrî binihêrin, bi bayê bezekê, ez çûm min derî vekir. Dîsa heman cerdon li ser du piyên xwe rawestiyaye û bi çavên pîrsyar li çavên min dinihêre. Vê carê, min hew xwe girt û da ku ez hişê xwe li hemberî vê bûyera sosret winda nekim, min rahişt pêlavekê û di cerdonî werkir da ku ji wir bireve û cardin neyê li dêrî nexe.

Dema ku min pêlav avêtibûyê, min derî jî li cerdonî girt. Êdî min nedixwest ku cardin deng ji dêrî were û dîsa rastî cerdonî bêm. Loma ku cardin li dêrî bixista û min ew bidîta, ez ditirsîyam ku hişê xwe winda bikim.

Dema ku derbasî odeyê bûbûm, hevalan dîsa ji min pîrsî bê ka gelo kê li dêrî dixist. Min ji we re rewş vegot...

Wê şevê heta berê sibehî xew nekete çavê yekî ji me. Di nav bêdengiyêke kûr de em difikirîn. Lê guhên me hemûyan bi tîrs li dêrî bû. Me digot belkî dîsa cerdon were û li dêrî bixe.

Wê şevê me baş fêhm kir ku malbateke cerdonan jî heye û ew jî li hev dipirsin, ew jî his dîkin, diêşin, digirîn...

Modernîzm 2

Sîdîq Gorîcan


me roj kir şev
 şev kir roj
xew kir çînîçînî
xewn kir tepîskok
xwe kir neşixwe...

balgih jî bêzar ket bi dûre
berbangê berê xwe da gazînê
hawar kir bi girîn û nalînê

ku roj vegera şevê
 şev vegera rojê
şixul tev bû kul
heyat bi birîn zêwirî
muwazena ontolojîk berevajî zîvirî

ji erdzmîna xwe
hatin dûrkirin bax û bostan
hatin qirrîkirin baxçeyên bêhndar
hatin fetisandin di navbeyna
 apartmanên laşgir û bê ruh de
kulîlkên canecan û bi xwe
ji warên xwe hatin qefilandin
ketin qutiyên plastîk
cihên xwe girtin di bakoneyên teng de
bakoneyên teng bûn listikgeha aqilên otîstîk
daristan man bê nefes
kambaxiyê li avahiyan silav kir
zozanê teyr û çivîkan bû qefes

ku roj bûn şev
 şev bûn roj
ku baxçeyên rengdêr hiljorê bakoneyan bûn
şairan ji xwe re sekîne nedîtîn
şar ji çavên xwe bûn
dîl di kozika xwe de ma mişemir
aramî li ber mirinê ve fetilî
fetilî bi meşekê xirrpilak
fetilî bi hêrsekê bi mirremirr



Ravek
Bahoz Baran

Peyvek, dema ku ji aliyê hinek peyvên din ve tê ravekirin, ravek derdikeve holê. Peyvên ku ravekirinê çê dikin êdî dibin qalib û, nayên parçekirin. Di ravekê de du hêman hene, yek raveber e (rave dibe), yek jî raveker e (rave dike). Raveker ji aliyê wesf, rewş û mêjerê ve raveberê temam dike. Raveber bêtir li pêş e, raveker li dawiyê ye.

Mînak:

Çirîsk
54

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
Deriyê	malê
Pirtûka	dibistanê
Keçika	mezin
Gula	sor

Weke ku ji mînakan jî diyar e, raveker raveberê ji hinek aliyan ve temam dike. Ku di ravekan de wesfên rengdêran hebin ew ravek ravekên rengdêran in; ku peyv ji hinek aliyan ve bîr temamkirin û diyarkirin, ravekên navdêran derdikevin holê.

Divê em diyar bikin ku di hinek ravekên rengdêran ên mêjerî, nîşanî û yên diyarkirî de cihê raveber û ravekerê diguhere, hêmanên rengdêrîn tîr pêşî.

Mînak:

Çar zarok Ji sedî şêst kar
Vî lawikî nan xwar. Vê pirtûkê bistînin.

1. Ravekên Navdêran

Navdêrek dema ku ji aliyê navdêreke din ve bê diyarkirin, raveka navdêran çê dibe. Di raveka navdêran de du hêman hene: raveber, raveker.

Raveber: Hêmana ku ji aliyê ravekerê ve tê diyarkirin raveber e. Raveber ji bo ku bi ravekerê ve bê girêdan pêvekên hevbendiyê “-ê,-a -ên”ê distîne. Ev pêvek zayend û mêjera raveberê diyar dikin.

-ê→ nêr -a→ mê -ên→ pirjimar

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
Bêhna	nanî
Serê	keçikê
Darên	çiyayan

Nîşe: Dema ku du dengdêr bên bal hev tîpa alîkar 'y' tê bikaranîn.

Piştî Pêvekên Nediariyê Pêvekên Hevbendiyê

Pêvekên hevbendiyê, dema ku piştî pêvekên nediariyê tên, diguherin.

Pêvekên nediariyê ev in: -ek(Nediyar-Yekjimar→Ji peyva 'yek'ê tê.)
 -in(Nediyar-Pirjimar→Ji peyva 'hin'ê tê.)

Mînak:

Hevalek hat.
Hevalin hatin.

Piştî Pêvekên Nediariyê Rewşa Pêvekên Hevbendiyê

e (Mê)	-î (Nêr)	-e (Pirjimar)
Dareke me	Çiyayekî bilind	Daring me
Hevaleke baş	Hevalekî baş	Hevaline baş
Rojeke xweş	Deriyekî vekirî	Zarokine nerhet

Çirîsk
55

Raveker: Hêmana ku raveberê diyar dike raveker e. Dema ku vî karî dike ew jî pêvekên diariyê "-î, -ê, -an"ê digire. Ev pêvek zayend û mêjera ravekerê diyar dikin.

-î→ nêr -ê→ mê -an→ pirjimar

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
Destê	yekî
Sêva	jinikê
Ezmûnên	dibistanan

Li Gorî Teşeyî Ravekên Navdêran

A) Ravekên Resen: Ji du hêmanan pêk tên, yek ji wan raveber û yek jî raveker e. Raveber pêvekên hevbendiyê digire; raveker jî pêvekên diariyê digire.

<u>Pêvekên Raveberê</u>	<u>Pêvekên Ravekerê</u>
-a	-ê
-ê	-î
-ên	-an

Mînak:

Dara tuyê
Serê yekî
Darên gûzan

Eger raveker ji peyveke nêr pêk hatibe û tê de tîpên 'a, e'yê hebin, ew tîp dikarin bitewin û bibin 'ê'.

Mînak:

Kevirê dîwêr
Deriyê xênî

B) Ravekên Hevalbend: Di van ravekan de raveber an jî raveker ji du hêmanan pêk tên. Di ravekên bi vî hawî de hewce nake ku pêvek du caran bên bikaranîn, peyva dawiyê bê diyarkirin bes e.

Mînak:

Derî û kevîrê xênî
Dest û piyê me
Kevirê dîwar û çiyayî
Gula kulîlk û darê

Hişyarî: Dema ku tîpa dawî ya peyvên nêr bi 'î'yê bi dawî bibe, hewce nake ku careke din ew peyv pêveka diyariyê bigire.

Mînak:

Milê derî
Bingeha xanî

Hişyarî: Carinan peyvên nêr û mê bi hev re din nava ravekekê de cih digirin, di vê rewşê de peyva dawî tenê tê diyarkirin.

Girêdayî
56

Mînak:

Çimento û kevîrê dîwarî
Destê Hesên û Zeynebê

C) Ravekên Girêdayî: Du an pirtir ravekên navdêran dikevin nava hev û bi hev ve tên girêdan. Divê di çêkirina ravekên girêdayî de du ravek hebin.

Mînak:

Pelên darê+ Dara Gûzê= Pelên dara gûzê
Hêviyên jiyane+Jiyana wî= Hêviyên jiyana wî
Enstituya Kurdî+ Enstituya Amedê= Enstituya Kurdî ya Amedê

Nîşe: Ku peyvên rengdêrî bikevin nava ravekê û peywendiyê bi wesfêkî din re çê bikin, ew cure ravek nabin yên girêdayî. Ji ber ku li holê tenê ravekek heye, peyva rengdêrî tenê pêwendiyê çê dike. Di van ravekan de pêveka hevbendiyê ya duyemîn dikeve rola pêwendiyê û cuda tê nivîsîn.

Mînak:

Şaredariya Amedê ya mezin.
Kurê Leylayê yê biçûk.
Pirtûka wî ya li dibistanê

2. Ravekên Rengdêran

Navek dema ku ji aliyê rengdêrekê ve bê diyarkirin, raveka rengdêran çê dibe. Di raveka rengdêran de jî du hêman hene: raveber, raveker.

Raveber: Hêmana ku ji aliyê ravekerê ve tê diyarkirin raveber e. Raveber ji bo ku

bi ravekerê ve bê girêdan pêvekên hevbendiyê “-ê,-a -ên”ê distîne. Ev pêvek zayend û mêjera raveberê diyar dikin. Brevajiyê ravekên navdêran, ravekerên rengdêran pêvekên diyariyê ‘-î, -ê, an’ê nagirin.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
-----------------------	-----------------------

Dilê	jar
Sêva	sor
Guliyên	zirav
Ava	sipîsar

Raveker: Hêmana ku raveberê ji aliyê wesf û mêjerê ve diyar dîke raveker e. Rengdêr dema ku hêmanekê diyar dikin pêvekên diyariyê ‘-î, -ê, an’ê nagirin. Tenê di awayê nîşanî de wan pêvekan digirin.

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
-----------------------	-----------------------

Mala	<u>xweş</u>
Gundê	<u>vala</u>
Keçika	<u>rind</u>

Nîşe: Dema ku rengdêrên hejmarî û nîşanî derdikevin holê raveber û raveker cih diguherin.

Çirîşk
57

Mînak:

<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
-----------------------	-----------------------

Çar	zarok
Ji sedî çar	erd
Ev	kurik
Ew	keçik

Di ravekên rengdêrên nîşanî de ku diyarkirin hebe raveber û raveker bi hev re pêvekên diyariyê digirin.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>
-----------------------	-----------------------

Vî	lawikî
Wê	keçikê
Wan	hevalan

Ji Aliyê Teşeyî ve Ravekên Rengdêran

A) Ravekên Resen: Ji raveber û ravekerê pêk tên. Raveker ji aliyê wesf û mêjerê ve raveberê diyar dîke.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
Dara	mezin	Ev	lawik
Gula	zer	Çar	nan
Deriyê	şîn	Pênc	pirtûk

B) Ravekên Hevalbend: Li holê raveberek û çend raveker hene. Ew raveker, bi raveberekê ve girêdayî ne. Di van ravekan de ji bo girêdanê pêvekên pêwendiyê, daçek û gihanek pir tîn bikaranîn.

Mînak:

<u>Raveber</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveker</u>	<u>Raveber</u>
Sêva	bi bêhn û xweş	Ji sedî pênc	erd
Deriyê	hesin ê mezin	Hebik û nîv	nan
Hevalê	qenc ê dirêj	Du mîtro û nîv	qablo

Nîşe: Rengdêr weke ku me li jor jî destnîşan kiribû carinan di nava ravekên navdêrîn de jî cih digirin.

Mînak:

Şaredariya Amedê ya mezin
Keçika Leylayê ya biçûk

C) Ravekên Lêkernavî: Li holê raveber û ravekera ku ji gellek hêmanên pêk hatîye heye. Di ravekerê de lêkerek di peywira rengdêre de tê bikaranîn û dibe lêkernava rengdêrîn. Gihanek û daçek jî di van ravekan de pir tîn bikaranîn. Ev qalib nayên parçekirin, weke hêmanekê ne.

Girêstik
58

Mînak:

Pirtûka ku te ji min stendibû li ku ye?
Mala ku li ber çavên me sewitîbû hat çêkirin.
Nanê ku ji destê lêwîk kete erdê êdî nayê xwarin.
Xaniyê çêkirî, nabin ji me re.

ÇEWTIYÊN KU TÊN KIRIN

Dema ku em bala xwe didin nivîsên heyî em dibînin ku di vê mijarê de gellek çewtî tîn kirin. Carinan pêvek kêmtîn nivîsîn, carinan şaş tîn nivîsîn. Gellek caran di awayê rastnivîsê de pîrsgirêk derdikevin holê.

1. Pêvekên diyariyê yên ravekerê kêmtîn tevlihevî derdikeve holê, gellek caran ev çewtî tê kirin, carinan jî ravekên rengdêrîn û yên navdêrîn tîn tevlihevkirin:

Mînak:

Azadiya mîr	Azadiya jin	Hunermendê berxwedan
Jiyana şêr	Bandora muzîk	Pîrsgirêka Kurd
Odeya meqam	Têkoşîna jin	Nexweşiya çav

Dema ku em pêvekan li van ravekeran zêde nekin, tevlihevî çêdibe. Di herdu mînakên ewil de ‘azadî’ dibe jin an jî dibe mîr û raveka navdêran weke raveka rengdêran xuya dike. Di rewşên wisa de em bêtir pêveka pîrjimariyê ‘an’ê bi kar tînin. Ku kesek bê qestkirin em dikarin pêvekên ‘î’ û ‘ê’yê lê zêde bikin. Lê ev awa di Kurmacyê de hindik tê bikaranîn.

Awayên rast divê weha bin:

Azadiya mêran/î	Azadiya jinan/ê	Hunermendê berxwedan/ê
Jiyana şêran/î	Bandora muzîk/ê	Pirsgirêka Kurdan/î
Odeya meqamî	Têkoşîna jinan/ê	Nexweşiya çavan/î

2. Divê pêveka mê ya ravekerê bê bikaranîn, gellek caran em dibînin ku ev pêvek nayê bikaranîn. Bêtir di helbest û stranan de ev çewtî pir tê kirin.

Mînak:

Azadiya Kurdistan
Kesên li Swêd
Festîvala Zîlan
Rûpela cihan

Pêveka mê ya diyariyê divê di ravekan de bê bikaranîn. Guhdarekî/e Kurd pir bi rehetî dê fêr bike ku ev hevok ne li gorî bilêvkirina Kurdî ne. Divê ew hevok weha bin:

Mînak:

Azadiya Kurdistanê
Kesên li Swêdê
Festîvala Zîlanê
Rûpela cihanê

Çirîsk
59

3. Pêveka ravekerê ya nêr gellek caran nayê bikaranîn. Lê divê ji bo zimanekî bipergal û xurt divê êdî em wê jî bi kar bînin.

Mînak:

Hevalê Hesênî
Qalikê nanî
Goştê gayî
Devê gurî

4. Pêveka diyariyê ya pirjimar 'an' jî gellek caran kêr tê nivîsîn.

Mînak:

Min pîrsa dewara kir.
Wan hevala got.
Dengê zaroka xweş tê.
Divê em di nivîsê de wê biparêzin û binivîsin:
Min pîrsa dewaran kir.
Wan hevalan got.
Dengê zarokan xweş tê.

Bûka Qelen Qelew

Bîrbir Birûsk Aryan

*Heger tu çavên evîna min ên reş û belek bi şûnde vegerîni û herra nav kefa destê min bidî...
bi soz û peyman! (ez ê peymanan yek bi yek bidim her êgir) ez ê dirokeke çavreş û belek bele-
kî bikim qelenê evîne û bi stûyê te ve dakim.*

dawet geriyabû;
xemgînî ji dilan peya bûbû,
li şûnê şanazî siwar bûbû...

wan meya zelal dadîqurtand,
govend digerad,
û bi ser de ji dililand...

mêvan li hawirdora bûkê vehewiyabûn;
her yek ji wan, ji aliyekî ve xwe dirêjî wê dîkir.
xelatên xwe pê ve dîkirin, wan jiyanekê bextewar û bedew jê re dixwest û diçûn...
(hin ji wan zêrr, hin ji wan pere, hin ji wan hêvî û hin ji wan jî xatir pê ve dîkir.)

Belê, rêz a zavayî bû
zavayê me bi ciwanmêrî ji cihê xwe liviya
bi çavên ewrî û sekneke çiyayî
li hemberî j(î)(i)na xwe sekînî.

ewil,
wî lêvên xwe yên mişt ramûsan kirin berdêliya eniya wê...
û bi piştîre,
dilê xwe qurifand.. qirrrrçççç....
qurdeleyeke şînboz tê re derbas kir
û bi çengelokekê
bi ser dilê gewra xwe de bada...
pê nêdebirî,
dewsa dilî,
bi kûlîlkên zîvî nixumand... (kulîlk ji kêfan firrrriyan!)
...û rûnişt...
çep!, çep!, çep!, çep!
çepikên xurt ji zavayê dilgorî re!..

.....

Di Helbestê de Çirûskîzm

Janez Sar

*"Çirûskîzm; krîzek e; krîzeke çarmixî ye.
Ji tesîra narkotîk a peyvîna diafirê."*

Rênas Jiyan

Çirûsk
61

Pêla Çirûskîzmê, ji binê erda dilê Rênas Jiyan'î derketiye; di çarmîxa serdestan de krîzeke hebûnê li dilê R. Jiyan'î xistiye û têgehên ku li giyanên xwe digerin, ji tesîra xwîna narkotîk a R. Jiyan'î derketine ser rûyê erdê. R. Jiyan, bingeha hebûn û tunebûnê li ser van têgehan ava kiriye. Ev têgehên hundirîn, cara ewil bi vêketina çirûskan re li ser rûyê erdê hatine xuyakirin.

Şenberiya ronahiyê gava ku li çavên me xist û gava ku dengê çirûsandinê li ber guhên me ket, me ji kûrahiya hundirê xwe bawer kir êdî.

R. Jiyan'î, bi Çirûskîzmê re hundirê me derxist ser rûyê bedena me. Me êdî giraniya hundir û derveya xwe, ji nav hev derxist. Êdî em dizanin ku şev, hundirê rojê ye.

Hiş û binhişiya R. Jiyan'î ya filozofî, ji sinca dilê wî derketiye; ew ji dilî ye, dilekî biêş, bi kul û evîndar..

R. Jiyan ji ber têgeha bêwelatiyê diêşe, ji ber têgeha serbestiyê bi kul û ji ber têgeha Kurdevariye jî evîndar e.

R. Jiyan'î, di erdhêjeke sosyolojîk, psîkolojîk û felsefîk de nîrxên ku di binê qedere de mane û di tariyeke kaotîk de hatine veşartin, bi ronahiya çirûskan re ew dîtine û derxistine ser rûyê jiyanê.

Çirûskîzm, ji daketina hundiran natirse û Çirûskîzmê xwe li bêbiniya tarî qelibandiyê. Ji ber ku ew kesayeteke xwedî hêz û xurt e.

Em dikarin bi bennikên wê yên rewneq dakevin jêra tariya jiyanê. Êdî em dikarin hemû tirsên xwe tune bikin, an jî em dikarin bi hemû tirsên xwe jî bijîn; me ev bawerî ji pêla Çirûskîzmê stendiye.

Di helbestê de seretayên Çirûskîzmê:

1) Ev pêl, di sala 2003'yan de ji hêla Rênas Jiyan'î ve li hemberî xwezaya serdestiyê derketiye. Pêleke ramanî û hunerî ye.

2) Ji yana rastîn bi têgehan hatiye qalkirin. Helbestvên, di qalkirinê de raman, hest û şiroveyên xwe jî vegotine.

3) Bingeha Çirûskîzmê herçiqasî "aqil" be jî, di helbestê de raman û hest biqasî hev girîng in.

4) Mijarên weke "jan, evîn, welat, serbestî, lehengî, hêvî, bêrîkirin û hezkirin"ê hatine hilbijartin di helbesta çirûskîst de.

5) Reşbîniyeke derûnî diyar e; lê ev reşbînî vexistina çirûskan gûrtir dike.

6) Di navbera sûje û objeyê de têkiliyeke xurt heye; ev têkîlî bi hêza peyvan çêbûye. Gava ku peyv diqede sûje objeyê, obje jî sûjeyê dukuje.

Heger çirûskên peyvê vemirin, dilê organîzma sûje û objeyan disekine û jiyan bêwate dibe. Peyv tune be, jiyan jî tune ye.

7) Di helbestê de form li cihekî pirr girîng e. Rêzîkirin û lihevhatina bêjeyan, rîtm û melodiya dengan berî hertiştî tên.

8) Bêjeyên herikbar û zelal bi folklorîzma zimên re hatine hûnandin.

9) Hêmayên ku ji çarmîxê filitîne û bê cih û bê welat mane têne xuyakirin.

10) Cureyên helbestê serbest in, form û stîlên nuh hatine cerribandin.

11) Çirûskîzmê, agirê xwe vexistiye û agirê wê hîn berdewam e.

Xew(n)a Li Berojka

Înan Eroğlu

Min xewnek divê
bi ser vî dilê êgîrpêçayî
şev û şevêkê jan dibiriqê ji keziyan
qîrîna zarokekî volkanîk diteqê bi guhê min de
ronahiyek dibare ji piştê min
dengên lerizî tîn şuştin
şîpela heyvê me
teqûteqa teqandina fişekên hewayî me
hêvî dinêlin
lêborîna rojê me
lêborîna rojê me ji pêrê de
toz û tular im
gul, baxçe, keskesor, baran
mirina tavê me
jiyan hat ser hişî
hêvî dinêlin

Min xewnek heye
ji çîrokên hezar û şevêkê
rojek im nivbirîndarî
çavên te dibin robar
kûr dibin çavên te
dikulim li îstgeha ruhê te
darên gûzan diçinim bi ser şopên dojehê de
dibim gulle di sînga dayikekê de
giyanekî molotovîk dikirrim
çirûsk vedide
dilê min li hev dikeve

Min xewnek kîrî

Ji gerokekî, li bin siya çiyayê gundê me. Dîjle min diguvaşt, bi dilê Ferêt bû.
Bi gorra şêx û ûcaxan bikim ez ê îşev zebeşan bişkînim li dijî Ferêt. Haho!...
Bila dêya min bibîne bê çi penêrê helandî dikim bi qurbana wê di keştiya bajarê
nûava de. Li siya xwe digirim di destên ewrên dilbijok de... başûr, bakur, rojhilat,
rojawa.
Keftûlesta bi moristanan re ye, di bin me de gencîne û li ser min ax.
Û axx, tilîkên min diterikin bi şîrê dêya min. Yadê, ma tu nizanî çi gurmegurma
birûskan e di nava min de? Ala bêreng dikim bazin jî bo zavayê me. Zavayê me,
dikuxim bi ser siya xwe de. Kaniya kuliyan şîn li ba dikeve di ser koka zimên de.
Çav-şîn, kulî-şîn ax-şîn û nizanîm çi û çî-şîn. Yadê, ezmên jî rengê xwe guhert.
Zebeşan dixwim li dijî Ferêt. Û jî Dîjleyê dengê bavê min bilind dibe weke ferman
darekî; “Û keça min a bextreş jî reviya!..”

Min xewnek çêkir

Li ser sergoyê pişt mala me. Tiqetiqa nikilê min e. Li kurmikan digerrim, av
derdikeve. Porrkurra qîza min difirre li ber sêlekên qeşmer. Porrkurrê, keziyên te
dibe bafirrok li quntarê vê cihanê; awirên te rawestgeh. Li vî welatî zîz dibin dibin
stran, çiya kelecânî. Deşt diqemirrin di sînorên çavên te de. Refên çûkan dibarin
dilê min, zîz. Rengekî keşf kir jî hemû rengan spehîtir e. Porrkurra qîza min li dû
qeşmeran, dilê... Rondikên spî dikim bi qurbana darên hejîran... Ewran dikim gog,
baranê berbanek.
Lê qeşmera qîza min li dû qeşmeran.

Min xewnek dît

şeveke gewr
stêrk dibûn starî di kilaman de
kul dibû kul
ûrrîna kûçika dihat jî nava min
mişkin hogirê wî
helbestekê dibêjim
ew nifîrran dike
cîhaneke nû ava dîkin
ez dibêjim, hey dinyayê!!
bav û porrkurra keça xwe dikenin
û li quntarê dilê lihevketî
hêvî dinêlin

Xalê Zilfo

Wehab Mistefazade

Xalê Zilfo, bi eslê xwe Rihayî bû. Zaroktiya wî li gundekî kêleka Ferêt derbas bûbû. Li gorî vegotina wî, derûdorê ji wan re digot; "ehlê Ferêt". Wî di heqê nasnameya xwe de, bi tenê ev zanîbû. Ne zanîbû ji kîjan eşîrê bû û ne jî ji kîjan malbatê; bi tenê zanîbû ku navê bavê wî Silêman bû û navê dêya wî jî Hewê. Ji ber ku di biçûkaniya xwe de hem bavê xwe winda kiribû, hem jî dêya xwe, loma li ber destê amojîna xwe mezin bûbû, bi zextan, bi lêxistinê û bi heqaretê... Piştî demeke kurt, ji ber nedebariya li hem-berî zext û lêxistinê ji destê amojîne mal terk kiribû.

Yek ji hezaran diyarkerên sedemên qederê, ew jî Rihayê zorgehî rûniştina Berriya Qoserê kiribû. Her ku aciz dibû, an jî her ku xemgîn dibû, keserhîlanîna wî ya "axxx dayikê!", ligel temenê wî yê bihurî (şêst sal), weke nîşana lêgerîna şefqeta dayikê xuya dibû. Jiyanêke bi tena serê xwe, bi şivantî û bi kurtêlên xelkê derbasbûyî...

Xalê Zilfo, belê Xalê Zilfo. Ew xalê herkesî bû, biçûk mezin, yê herkesî... Herkesî bi vî awayî navê wî hildida. Lewra herkesî qedr û qîmeta wî dizanîbû. Xalê Zilfoyî di xortaniya xwe de li cem kîjan malbatê şivantî kiribûya, diçû li bal wan bi mehan dima, bi vî awayî, dawiya temenê xwe dibihurand.

Zemanekî, di zemanê koçeriyê de, şivantî xebateke herî di rewacê de bûye. Werzişkarên îroj çawa bin, şivan jî tişteki wisa bûne. Li derdorê kîjan şivanê ku herî baş pey çêrandine, wan bi pereyên herî bilind şixul dîtine. Xalê Zilfo jî yek ji wan şivanê bi navûdeng bûye. Di dema bihurî de, ji ber ku li bal malbata me jî xebitîbû, dihat mala me û bi mehan li bal me dima.

x x x

Xalê Zilfo xwediyê hin taybetiyên balkêş bû. Beriya hertiştî mirovekî zêde zêde paqij bû. Divê ev tişteki awarte be, gava yekî ku şivantî kiribe; ango di nava ax, toz, xwêdan û bêhna pezî de mezin bûbe û tevî wê jî ewqasî qîmet bide paqijiyê. Neynikeke wî hebû, li paş neynikê jî sûretê Mistefa Kemalî. Lewra ew di eynî wextê de heyranê Mistefa Kemalî bû. Digot ku ne ji wî bûya, em dê niha di bin esareta "gawir"an de bijiyana. Radihişt neynikê, destmala xwe ji bêrika xwe derdixist, bi destekî bi neynikê li xwe mêze dikir û bi destê din jî destmal - demeke dirêj - bi dora devê xwe dixist. Ev tevger jê re bûbû mîna tîkekê. Bi deqîqeyan dora devê xwe paqij dikir. Carinan ên dora wî jî vê tevgerê aciz dibûn û dibû niçeniça wan; lê ji ber ku guhên wî pirr kêr dibihîstin, dengê kesên derdora wî nedîcûyê, loma wî paqijiya dora devê xwe her didomand.

Xwedê dizane, biqas ku Xalê Zilfoyî ji-pey û kûçikan hez dikir, ancax ewqasî ji însanan hez dikir. Ez bawer nakim ku heywanhezên îroj biqasî wî ji heywanan hez dikin. Mîrov dikare bibêje ku heywanên dînan îmana wî bûn. Hingê neh-deh mîhên hebûn ku me

ew ji bo qatix xwedî dikirin. Gava ku Xalê Zilfo dihat mala me û bi mehan dima, tevî ku tukesî jê re nedigot jî ew ji ber xwe ve diçû ber wan.

Di bêrika wî de, hertim ji bo kûçikan nan peyda dibû. Şikl û şemalê wî ji kûçikan re bûbû nan. Gava ku kûçikan ew bidîta, ji ber ku wan zanîbû nan pê re hebû, direviyan pêşiyê û wan xwe diavêt hembêza wî. Bi gotirake din, ew bûbû "Zengilê Pawlow". Gava ku kûçik çav li reşên wî diketin, girrêz bi devên wan diket! Wî jî xwe ji wan nedi-parast.

Mala me Şafî bû -ku li gorî mezhebê Şafîyan kûçik heram e- divê devê wî negihîş-ta kincan û gava ku bigihîşt a jî pêwist bû ku ew kinc bi axa sor heft caran li avê bike-tina, da ku helal bûbûna. Ji ber vê hestiyariyê, wexta ku kûçikan ew didît û dev û zima-nê xwe bi kincên wî dixistin, dêya min û pîrekên gundî lê hêrs dibûn û bi ser wî de diqirriyan. Ji bo tişteki din jî lê hêrs dibûn, ew jî dîsa ji bo kûçikan bû. Herçiqasî ji bo kûçikan xusûsî nan dihat pijandin jî Xalê Zilfo diçû nanê ku me dê bixwara ji telîsî didi-zî û dibir dida kûçikan. Ev jî dibû sebeba hêrsa dêya min.

Misilmantiya Xalê Zilfoyî jî ne mîna ya xelkê bû. Ne zanîbû eşheda xwe bianiya, ne jî zanîbû fatîhê bixwenda. Nimêja wî jî ne li gorî tu mezheban bû. Gava ku rûdinişt, da ku ji rukû'ê derbasî sicûdê bibûya, lingên wî yên bawîbûyî diçûyan, ji ber vê eşê jî li ser nimêjê "ay ay" a wî diçû heta derveyî xaniyî!

x x x

Xusûsiyeteke wî ya din, xwirebûna wî bû. Ligel ku di wê demê de, ew şivanê herî bi navûdeng bû û pezê ku wî biçêranda bi her awayî jî yên din cuda bû jî gellek malan ji ber ku ew yekî xwire bû, ew bi şivanti nedigirt. Rojê tenûrek nan sirf ji bo wî dihat pijandin. Wî digot, "li hêlekê pez diçêriya û li hêlekê jî min nan diavêt devê xwe, ji êvarî heta sibehê". Li mala me mesefek hebû, hê ji zemanê koçeriyê yadîgar mabû, me ji wê mesefê re digot; "mesefa Xalê Zilfoyî" Bi hêsanî têra çar-pênc kesan xwarin diçû-yê. Di zemanê şivantiyê de, ew mesef jî wî bi tenê re tijî xwarin dibû. Dîsa wî digot: "Rojekê ez li Diyarbekirê çûm aşxaneyê. Ez rûniştim, min got ji min re tirşikê bînin. Wan anî, di sêniyekê de. Min bi du-sê pariyan ew xelas kir. Dawiyê min yeka din xwest, ew jî hat, min ew jî tavilê qedand. Min bala xwe dayê ku bi wan sênikên aşxaneyê yên biçûk ez têr naxwim. Min bangî xwediyê aşxaneyê kir û min got ku wê tepsiya tirşikê gişî ji min re bîne. Wî berê got ku nabe, gava ku min li sedema wê pirsî, hingê got ku ew bawer nake ku ez dikarim vê tirşikê gişî bixwim. Wekîdin jî ew heta êvarî, ji bo miş-teriyên din jî bû. Dawiyê min ew razî kir, wî tepsiya tirşikê gişî anî li ber min danî û min gişî xwar!"

x x x

Ji taybetmendiyan Xalê Zilfoyî yên herî balkêş, yek jê jî baweriya wî ya li ser tek-nolojiya televîzyonê bû. Li gorî baweriya wî -ku ev baweriyeke gellekî xurt bû û ev bawerî bi xwe re bire heta gorrê- em çawa kesên di televîzyonê de dibînin, ew kesên di televîzyonê de jî bi vî awayî me dibînin! Tevî ku Pîra Hedoyê di vê xalê de, ne gellek zelal bû û ji bo van şikên xwe zelal bike ji kesên derdora xwe dipirsî, bê ew kesên ku di televîzyonê de derdikevin jî me dibînin an na; Xalê Zilfo di vê mijarê de pirr zelal û ji xwe gellekî bawer bû!

Di wê wextê de, du televîzyonên Iraqê hebûn. Yekê jî wan ji Bexdayê weşana xwe dikir, ya din jî ji Kerkûkê. Ji van kanalan yekê, piştî esirî li ser tiştên xeratiyê bername-yek diweşand. Bi rastî, wensa wî li ser televîzyonê tune bû, lê wê rojê wê bernameyê bala wî dikişand. Di bernameyê de, kesekî bi birrekê dar jê dikirin. Di heman wextê de, Xalê Zilfoyî destê xwe dida ber çavên xwe û nêzî televîzyonê dibû. Wê demê, ji bo çavên mirovan, cameke mîna mîqayê li ser ekrana televîzyonên reş û spî dihat danîn.

Ji ber ku haya wî ji derizandina kêleka cama mîqa ya televîzyonê tune bû, li gorî baweriya wî, ew kesê xwediyê birrekê, -ji qewla wî "wî bêbavê Erebi"- cama televîzyonê şikandibû. Loma di ber xwe de hey diminminand û digot; "heyla bêbavî, birrek spart camê û heta ku cam şikenand kir xirrtextirrt!"

Di wê demê de, darbeya 12'ê Îlonê çêbibû. Kenan Evren bajar bi bajar digeriya û mitîng çêdikirin. Agahiyên di heqê van mitîngan de, nûçeyên televîzyona "TRT"ê yên destpêkê bûn. Paşayê cûntayê di wan mitîngan de, bêtir li ser mijarên dîni dipeyivî. Çunkî wî amadekirina xurtkirina senteza Tirk û Îslamê dikir. Carekê di mitîngekê de got, "em hemû lawên Xwedê ne!" Gundiyên me pê dikeniyên, wan digot, "Kenan Paşa hin nîzane bê em lawê Xwedê ne; yan jî evdê wî ne!" Rojekê dîsa nûçeyek ji van nûçeyan bû. Gava ku Kenan Evren derket ser dikê, destê xwe ji beşdarên mitîngê re hejand, Xalê Zilfoyî jî li ber televîzyonê bi eynî awayî silav da Kenan Paşayî!

x x x

Mîna cinnê ku ji hesinî bitirse ji eskeran ditirsiya. Rojekê esker hatin gundê me, zilam ji gundî reviyabûn, ew bi tenê li gundî mabû. Esker pê re xeyidîn, jê re peyvên xerab kirin. Piştî bi rojekê ji gundî çû û ew roj û ev roj e ku me Xalê Zilfo hew dît.

Hin însan hene ku şert û mercên jiyanê herdem tiştên xweş derdixin pêş wan. Û hin jî hene ku mirov dibêje qey jiyan dijminê wan e, jiyan hertim kul û derdê wan pirr dike. Xalê Zilfo jî yek ji wan kesan bû ku jiyanê tişteki xweş dernexistibû pêş wî. Di bihara temenê xwe de, li bal malbatekê şivantiyê dike ku çarsed-bêncsed mîhên wan hebûne. Ew jî mîna her xortekî ji bo pêşeroja xwe tiştên xweş difikire. Xeyalên zewaca bi keçikekê re dike ku jê hez bike, zarokên wan çêbibin, bibin xwedîpere, xwedîxanî. Weke her însanî, ew jî dixwaze ku gava ne li malê be, yek li pê wî, li wî bifikire, ji bo wî endîşeyê bike, li hêviya wî be. Ev xeyalên han li hemberî dijiwarîyên şivantiyê, xwarina kurtêlên xelkê û tenêtiya jiyanê, jê re dibûn hêz. Bi hêviya ku ev dijiwarî dê rojekê biqedin, bi şev û roj di nava erdê beyar, çiya û newal, teht û zinaran de, bi hevalbendiya kûçik û kerê xwe, di berf û baranan de, bi tevahiya serweta xwe kulavê li piştê xwe, pez diçêrine. Teht jê re dibin doşek, kevir jê re dibin balîf.

Şeveke biberf û baran e ku mirovan tilî di çavên hev re rakirina kesî kes nedidît. Di wê pûkê de, grûbek peya tene hinda wî. Ev, eşqiyayê (mehkûm) herêmê yê navdar Cemîlê Sor û hevalên xwe ne. Cemîlê Sor, piştî ku xwe bi naskirin dide, mîhekê jê dixwaze. Xalê Zilfoyî dibêje, "xwediyê van mîhan baweriya xwe bi min aniye û ew emanetî min kirine. Ez xayintiyê bi emanetê nakim, ez bi destê xwe mîhê nagirim û nadim te. Ancax tu bi destê xwe ji xwe re digire, bigire bibe" Li Cemîlê Sor dibe rik, rikê xurtiyê û dibêje, "tu yê bi destê xwe mîhekê bigire û bide min" Li hemberî teva israr û gefên mehkûmê navdar; Xalê Zilfo yê ku bi saxlemî û duristiya xwe dihat nasîn, di navbera aqil û "wijdan"ê xwe de, "wijdan"ê xwe tercîh dike û xwesteka wî bi cih nayne. Li ser van minaqeşeyan peyayekî Cemîlê Sor, radihêje keviyekî, ji paşiyê de li piştê Xalê Zilfoyî dixê û wî bêhiş dixê. Dawiyê mehkûm radihêjin mîhekê û ji wir bi dûr dikevin.

Piştî vê bûyerê bi demekê, Xalê Zilfo dizewice, lê zewaca wî bê serketin diqede. Lewra kevirê ku li piştê wî ketibû, li damara piştê wî rast hatibû û ew ji mêranî de xistibû. Jina wî piştî diyarbûna vê qusûrê, wî terk dike û diçe!

A bi vî awayî, Xalê Zilfoyê ku sêwî mezin bûbû -hêviya wî ya ku jiyan xwe bi jinekê re bikira yek û ji tenêtiya heyatê xelas bibûya - li hemberî tenêtiya jiyanê dîsa têk çûbû!

Xanax

Janbijan Ar

Lê belê
gurzek acizî
di nava laşê min î nîvmirî de
tim
 cirît
 diavêje
 dikerrixim
bêhna mirinê tê ji min
dîmeneke dîn im
di navbera sed delodînen rewal de bîst li min ket
 xwe bi çi bişom?
di jiyana min a melankolîk de sê segbavên tim çil û sê çar salî
geh ew min (ve)dixwin
û geh jî ez
berî wan bixwim dibelqitim
çi bikim
gîrêkên ji gerîdeyan digindirin
bê sedem xwe li hawirdorê şaneyên min direşînin
 dîlop dîlop dadiwerivim
(Di kerrika guhê min ê kongitrî de
resîtala çingîniyeke bêakort
qîrreqîrra aciziyên min bi tenorî dibile
mixabin
dengê (aramiya) dilê min ketiye
û kerr e
 di kerrika guhê min de)
Sedem...
Sedem ne tukes e
Ji nexweşîna cîsnê bavê min î xeddar e
aqilê min diqerrime di bin vî serbarî de
fîkrên min ên bi fikar jî li hemana ne
di demeke pirr nêz de
dêê teqez xwekustînekê pêk bîne

Lê belê ji panzdeh saliya min ve ye
mejiyê min du qet
 siya min sê qet tê şopandin
ez mîratekî ji-bavê-xwe-mayî
di heman demê de qeda qederê
û toqa lehnetê me di stûyê xwe de

Girrê Xwedê

Bajar Mîrzeman

Xweda, di sibeheke ku ne Wî afirandibû de têk çû...

Û Wî ahd kir...

Ew sibeha ku ji pirtûkên pîroz hate xerritandin di genê mirovahiyê de ricifî û xwe berra şikefta mejiyê cenînan da. Ji wê rojê de bû ku ji xezebeke ezmanî dihate tirsandin û hevz mabû di paxila Wî de. Heta ku ew roj hat û Wî girrê xwe yê ku bi salan tûjbûyî di çavê mirovahiyê de paqij kir ji paxila Wî bi bergerên hevz-xwezan tîji bû. Lê nebû...

Di dirokê de êvarek qemer bû. Bayê ku ji hawirdor bi tengala çivîkan diket û rûyê bilindahiyên dialast hênkariyeke bertavî dimalt di pêşiya xwe de. Dar û gihayên serbilind kurm û kêzik dihejandin di hêlekane hembêzên xwe de. Çemekî ku ji çûneke surgûnî re pêl dikeland di herikîneke xwezayî de ji ser hişê xwe çûbû. Berê surgûniyên belengaz jixweber li berê dizivirî. Ew berêya ku berê xwîn birije çavan. Ew berêya ku kesekî qasid nedişand ji kesekî re. Lê dem ji çûnekê re li zengilî dixist û derengmayîn ji xerabiyên re nefsek bû.

“Bimeşin!” gotibû ser-surgûnî di êvarek neşûştî de.

“Bimeşin! seriyên ku bizîvirrin ew ê bicemidin.”

Lingên gellek bedenên westiyayî li gavan leqîyabûn û çemê ku wan li kêleka xwe kiribû sînor xera kiribûn û meşiyabûn. Meşiyabûn lê yek ji wan mabû di binê konî de. Ji êvar de mêvarek vexwendibû û deng ji wî derneketibû. Çawa ku meraqa nehatina wî gavên wan paşpaşkî nikilandibû, tîrsa vegeerê ji werê çûna wan qurrîncok kiribû û şopandina rê bi ser xistibû. Meşiyabûn bêyî ku li xwe bizîvirrin lê di bêhnvedana ewil de mabûn sekinî. Kon hîn li dar bû.

Di binê konî de ji germahiya bedenên sincirî ax birijîbû. Dilopên xwêdanê yên ku ji eniyan diniquştin bi gihîştina erdê re dibûn peqilk û dipeqîyan. Dest li navan hatibûn

jidandin û hêz giş ji xistinekê re dihate serrifandin. Lê nedibû. Çi zexeliyên ku di navê de hatibûn afirandin ji êvar de hatibûn cerribandin, dîsa ji nedibû. Pişt ji erdê re cit dima. Hêza ku hêdî hêdî ji masûlkeyan dikişiya di mejiyên fennok de finasên veşartî bi ser piyan dixistin û hêteke sor bi derbeke mîrkutî re ji cih derdiket. (Wê kêlikê qewmekî dest bi kulandinê dikir.) Lê careke din nebûbû. Pêlwanê derbxwarî bi kulekiyeke qelew li ser lingan bû. Zelaliya destê sibehê bi giraniyeke mêşinî eceleya mêvanî diquraft. Bi ser de jî tîrsa hilatina rojê li zimanê Wî xistibû û “Bes!” gotibû.

“Bes! Va ye roj hiltê berde ez herim.”

Berdan, windakirin bû. Zanibû yê ku ji hêta xwe bi êş. “Na” gotibû bi giranbûna ku ji kulê hedimîbû ser zimanê wî.

“Min bipîrozîne. Yan na ez te bernadim.”

Di tateloka roniyeke nenas de çavên mêvanî biriqîbûn û دنیا li ber çavên wî winda bûbû. Ji tîrojên rojê tûjtir peyva “Min tu pîrozandî!” kişiyabû ji kalanê mêvanî û çûbû. Bi çûna Wî re jî rojek cara ewil bû ku bêxwedî hildihat.

Mêvanî wê kêlikê ahd kiribû...

Çirîşk
70

Piştî wê rojê û bi gellek rojan, di dîrokê de şeveke bibirrek bû. Gunehên ku li ser zimanan xirrek bûbûn di nav xelekên spiyahiya porrê pîrekî de li hev digeriyan. Li hawirdor tenahiya tîrsek pelçiqî û veşartoka nêrînen xeniqî çirrifit diavêt. Bayekî ku ji germahiya havînê kedîkirî di serê wê payîza hetikî de bêfedî digindirî. Bajarek di xew de bû, bêtî ku palikên çavên wî bi hevdu şa bibûna. Di bêdengiya demeke qurfok de giraniyeke ezmanî esirandibû sînga bajarî. Çivîkên lûsiyayî ji hêlînên xwe terriqîbûn. Qumbilên ku xwe ji biharê re dermale dikirin bi cizbê ketibûn û çinareke ku bi serfirazî digot ez li vir im bi bivirekî zengarî ji kokê de hatibû serjêkirin. Bi ketina çinarê re birîneke reş vebûbû di dîrokê de. Lê dilekî ku ji sedsalan û bi vir de bi agirê heyfê dişewitî, bi bilindbûna Xwe ya ezmanan ve dîtefiya.

Û heyf hatibû hilanîn...

Ji wê rojê û bi vir de ji kolanên wî bajarê ku Xwedê heyfa xwe lê hilanî, û bi ser welatekî winda de, dengêkî qedîm olan dide û dibêje...


“Oooooo Xwedê êdî bes e looooo!...”

Li Ser Wêjeyê bi Nivîskar Ferhad Pîrbal'î re Hevpeyvînek

Hevpeyvîn: Kejo Bajâr

Kejo Bajâr: Ezbenî weke ku tu jî baş pê dizanî her nivîskarek destpêkeke wî heye. Ser meselê Kavabata Yasunari'yê Japonî detspêka nivîsîna xwe weha bi lêv dike. Ji ber ku çavên bapîrê min nedidîtin min ew derdixist gerrê û min çi bidîta jê re digot. Min jî bela çavên bapîrê xwe yê kor dest bi nivîskariyê kiriye. Gelo çîroka destpêka nivîsîna Ferhad Pîrbal'î çawa ye?

Çîroka
71



Ferhad Pîrbal: Min çima dest pê kir? Min wexta ku dest bi nivîskariyê kir, wexta min têkilî bi nivîskariyê re danî ez ciwan bûm. Ez dora 13-14 salî wan bûm. Pewendiya nivîsê bi zarokatiya min re heye. Ez tenê bûm, ez dîrperst bûm, ez jî xelkê dîr bûm, kêfa min jî tenêtiyê re dihat, min nekaribû ku ez biçûma nav xelkê, nav zarokan, rola vê yekê di destpêkê de hebû. Min xwest ku ez tiştekî bikim da ku ez nêzîkî xwe bibim, karibim xwe mijûl bikim û min dixwest ku tiştekî bikim ku alternatîfek be ji bo jiyanê. Min nikaribû di nava hevalên xwe de normal bim. Nivîsîn jî bo min rêgeheke rizgarbûnê bû.

-Tesîrên polîtîk tê de hebûn?

-Na, di detspêkê de tesîra polîtîkayê di nivîsîna min de tune bû. Lê ez wisa difîkirim ku pêwendîya nivîsînê bi zarokatiya min ve heye. Û paşê min weke qumarê, weke vexwarina araqê, ez tûj bûm, niha jî ez nikarim dev jê berdim. Nivîsîn jî bo min tiryak e.

-Ezbenî pergala te ya nivîsînê çawa ye? Perîyodîk e yan na?

-Na, nivîsîna min bi rêya metodolojiyê nameşe. Ez di nivîsînê de akadêmîk naxebitîm, jixwe ez li Hewlêrê weke akadêmîsyenêkî dixebitîm, nivîsînên min ên akadêmîk jî pirr in, ew tiştek e. Lê nivîsîna çîrokên min, helbestên min, romanên min lenakawdit, li pir dê, yanî ne metodolojîk e. Fikrek, îmajek, rûdawek, wêneyek, tiştek tê xeyala min, ez zû qeyd dikim, lê piştî hefteyeke din dest bi nivîsîna wê dikim.

-Ezbenî tu li derve mayî?

-Erê ji mecbûrî li derve mame. Şerr bû, ceng bû, şerrê Iraq û Îranê bû. Ez jî Iraqê derbasî Îranê bûm, paşê ez gihîştîm Almaniyayê. Du salan ez li Danmarkayê mam, piştî Danmarkayê ez çûm Fransayê, ez heşt salan li wir mam, min master û doktoraya xwe li Fransayê kir, di sala 1995'an de Saddam hilweşîya, Kurdistan azad bûbû, ez vegeyriyam Hewlêrê û min li unîwersîteya Hewlêrê dest bi karî kir.


-Heke ku ez xwe têxim şûna "Kurdo"yê ku di çîroka "Perawezên Ewropayê" de û ez bipirsim gelo derfet û dezawantajên mişextî an penaberiye çî ne?

-Hemû tişt jî bo nivîskêr jî bo hunermend dibe derfet. Dewlemendî, feqîrî, xoşewîstî, mehrûmbûna jî xoşewîstiyê, hemû tişt divê di mejiyê hunermendî de bibe derfetek jî bo duristkirina berhemêke bedew, bibe hunereke ciwan (bedew).

Guneh, cerîme (qetl), kuştin, herb, divê hunermend van hemû tiştan karibe bike derfet, divê hunermend heya qetl û gunehan jî karibe bike huner, bike edeb, bike film, bike tablo, bike roman. Penaberiya min a 8 salan jî min re bûye hunerek, min ew kir hunerek. Min jî penaberiye îstifade wergirt lê tiştekî din jî heye; penaberî ne tiştekî nuh e, jî ber ku însanên Kurd li Tirkîyê weke penaberan dijîn, însanên Kurd li Îranê, li Iraqê, li Sûriyê bi xwe penaber in. Yanî jiyana penabêriya Ewropayê ne tiştekî nuh e. Jixwe Kurd li welatê xwe bi xwe penaber dijî bavo! Ne mektebeke wan heye, ne navendeke wan heye, ne unîwersîte... hetta li Sûriyê cinsiyata (nasname-nav) wan jî tune ye. Kurd li welatê xwe jî penaber in, li Ewropayê jî penaber in. Lê ji hunermendî re tiştê girîng ew e ku karibe hertiştê xwe bike buhayêke (qîmetêke) hunerî. Wacibê hunermendî ev e ku çawa karibe her nawayê jiyanê têxe nava hunerê. Tu li ku bi ne girîng e. Kurd li Başqaleyê jî bedbext e, însanê Kurd li Afrînê jî mazlûm e, li Mehabadê jî însanêkî guneh e, bindest e, heqê wî hatiye xwarin, li Awûsturyayê jî weha ye. Lê ferqek heye, li Kopengahê însanêkî Kurd dikare bike hawar û bibêje; "bijî welat û hew"

-Rola Mela Mehmûdê Bazîdî di çîroknivîsiya Kurdî de çî ye?

-Nirxê wî ev e. Mela Mehmûdê Bazîdî yekem çîroknivîsê Kurd e. Çil çîrok. Yek na, du du na, sî na, wî bi Kurmancî tam çil çîrok nivîsîne. Her çil çîrok di heman salê de nivîsîne û ligel Aleksandr Jaba'yî ew wergerandine Fransî. Kurdologê ku bi eslê xwe Polonî li Erzuromê konsulê Rûsyayê bû. Mela Mehmûd, di 1856'an de yekem pexşannivîsê Kurd e. Di warê çîroknivîsiya min de tu tesîr li min nekirîye. Lê jî bo tarîxa Kurdan ew jî milletê min re girîng e. Min bi xwe destnivîsên wî li Parîsê peyda kirin. Min kitêbek li ser wî nivîsiye. Ez du salan li ser Mela



Mehmûdê Bazidî xebitîme. Ev porrê min ji ber wî spî bûye. Lê tu tesîreke wî li çîroknûsiya min çênebûye. Ez du salan li ser xebitîm ku Kurd zanibin tarîxeke wan heye, tarîxeke wêjeya wan heye, ji bo ku ez ji milletan re bibêjim ku edebiyateke me heye. Ji bo ku ez ji dinyayê re bibêjim ku Kurd ne milletekî gavan e. Ê me ji tarîxeke me hebûye, wêjeyekê me hebûye, Melleyên me hebûne ku însanên mezin bûne û bi Kurdî nivîsandine. Heke ji sala 1923'yan û bi vir de li Kurdistana Tirkîyê 100 çîrok çap bûbûn, wî çil çîrok di salekê de bi Kurmancî nivîsandine.

-Di navbêra Mela Mehmûdê Bazidî û Fuat Temo'yî de 60 sal derbas dibe. Gelo ji hêla wextê ve di Soranî de ji şikestineke weha heye?

-Di Soranî de çîrok di sala 1920'an de dest pê dike. Lê ez naxwazim ku bersivê bidim pirsên bi vî rengî. Soranî, Kurmancî na. Çi Soran, çi Kurmancî gîş yek in.

-Ew du salên ku tu li ser Mela Mehmûdê Bazidî xebitî te çi tiştên seyr tê de dîtî?

-Pirraniya çîrokan Mela Mehmûdê Bazidî folklorîk in. Lê ihtimal e ku hinek ji wan folklorîk nebin. Folklorîk çi ye? Çîrokan ku bapîr bi wan dizanin folklorîk in. Beşek ji wan çil çîrokan ne wisa ne. Ew fiktîf in. Wî bi xwe ew çêkirine. Ji wan çîrokan 10-12 heb bi xeyalsaziya wî hatine nivîsîn. Yek ji wan çîrokan behsa hêsiyekî Fransewî dike. Hêsiyekî Fransewî li cem mîreki Kurdan girti ye.

-Gelo haya Mela'yî ji wêjeya dinyayê ya wê çaxê hebûye?

-Mela Mehmûdê Bazidî bi Erebi, Farisî, Kurdî û Tirkî zanibûye. Melle bûye. Wexta ku melle bûye ev tê vê meheneyê ku xwedî kultureke klasîk bûye. Lê ligel ew bi xwe melle bûye jî, ew destnîvisên wî, dînî nebûne. Ew destnîvisên wî,

xwedî girîngiyeke etnografîk û sosyolojîk in. Mesele dibêje ku di nava Ekradan (Kurdan) de Tirkînivîsîn nayê qebûlîkirin. Pirraniya Ekradan bi Farisî dinivîsîn. Yanî wê çaxê di 1856'an de zimanê fermî yê Osmaniyan Farisî bûye. Şerefîxanê Bedlîsî jî 300 sal berê jî "Şerefname"ya xwe bi Farisî nivîsiye. Yanî Mela Mehmûdî li xwe dananiye ku bi Tirkî binivîne.

-Têkiliya "Çolistan" û îroniyê çi ye?

-Wexta ku min "Çolistan" dinivîsî min hay ji îroniya wê tune bû. Lê paşê ez jê haydar bûm ku çîrokan min îronîk in.

-Ferhad Pîrbal ji kîjan xwarinê, ji kîjan muzîkê, ji kîjan filmê û ji kîjan filozofî hez dike?

-Ez ji pirtûkekê hez dikim ku fikrên min biguherîne. Ji çîroknivîsan "Mûrakamî Yabaniyan", ji filman "Fellini", wexta ku jineke çak di ber min re derbas bibe ez newêrim lê temaşe bikim ji ber ku ez ji jina xwe ditirsim. Lê di qestan pirtûkan de ev rast e. Ji filozofan "Zîzek", ji muzîkjenan "Jacques Brel", wexta ku ez li "Jacques Brel"î guhdarî bikim ez dikarim leşkerekî bikujim. Ji xwarinan jî ez ji "kortîk"an (dolme) hez dikim.

FERHAD PÎRBAL: Di sala 1961'ê de li Hewlêrê hatîye dinyayê. Di 1983'an de li "Zanîngeha Selahaddîn"ê beşa "Ziman û Wêjeya Kurdî" temam kir. Di 1986'an de derket derveyî welêt. Li Parîsê, li "Unîversîteya Sorbonne"ê "Wêjeya Kurdî" (Îrannasî) xwend. Piştî salên '90'î vegehiya Kurdistanê. Li Hewlêrê dezgeha çandî, "Mala Şerefîxanê Bedlîsî" ava kir û rêveberiya wê didomîne.

Çend kitêbên wî:

- Mal Ava Ey Welatê Min (şano, 1984)
- Sibeha Te Bi Xêr Ey Xerîbî (şano, 1988)
- Exil (helbest, 1994)
- Serçavekanî Kurdistan (lêkolîn, 1998)
- Wêneyê Kurd ji Arşîva Kurdnasên Ewropî (lêkolîn, 1999)
- Manifestoya Duwemî Wêran Spiyên Nav Reş - Reşên Nav Spî (helbest, 1999)
- Zêrê Nav Zibil (wergera nivîsên rojhilatnasan li ser kurdan, ji fransî werger, 1999)
- Incîl di Dîroka Edebiyata Kurdî de (lêkolîn, 1999)
- Cudahî (Tevî neh Şairê Hewlêrî, 1999)
- Petatxurekan (çîrok, 2000)

Medos û Maçên Mîtolojîk

Cîhan Roj

Dîroka me ya ku nehatiye nivîsîn îroj ji gellek hêlan ve dest û ling li me girêdane; serdestên me got, hûn tune ne, me got em hene. Wan got, hûn hene lê tu tiştê aydî we nîn e, me got, em neviyên Hûrî û Medan in.

Her wext me hewl da ku em bersivê bidin pirsên wan, lê me bes pirs ji xwe nekir. Baş e ku roja îroj em pirsan hem ji xwe dikin, hem ji wan û hem jî ji hertiştî. Bi tevî gavên biçûk mixabin warê dîrokê hê jî di çarçoveya dirûşme û bilêvkirina çend rastiyan dîrokê de maye.

Çirîşk
75

Ev bi tenê ne di warê dîrokê de, di warê edebiyatê de jî rastiya gerînekekê ye xwe li me dide der; ji sedeman yek jê jî ew e ku rehên kûr ên edebiyat, bawerî, efsane û nexşên dîrokê yên edebiyata me ya devkî nehat şîrovekirin.

Ji bo ku ji edebiyatekê re bibe moral qey “*Boraboz*” bi tena serê xwe ne bes e? Ji moralê madetir bingeh e jî; helbet bi helbesta Boraboz’î re gerek e ku em karibin wê dewr û dewranê tê bigihîjin.

Gelo lêkolînerek bi dû bikeve û hewl bide bê ka çi bandora bawerîya Zerdeştî li edebiyata Kurd heye, wê karibe çi bi dest bixe? Ji alî têkiliyên edebî ve çi têkilî bi “*Mishefa Reş*” re hene; hatiye şîrovekirin an jî di têma û hêmayan de têkiliyek xwe dide der? Hê Gellek rastî hene ku bila bimînin li dera han.

Efsane û bawerî, an şîroveyên xurt in an xeyalên xurt û rengîn in an jî bi awayekî desîse ne ji bo têkiliyên çandî. Di pirtûka Orhan Hançerlîoglu’yî ya bi navê “*Ferhenga baweriyên Dinyayê*” de kana bi sernavê Medos’î weha hatiye lêkirin:

“Medos. (Yewnan) Lawê Medeîa’ya ku Medeîa dapîra Medan tê hesibandin... Medos lawê Medeîa’yê ye ku ji Qralê Atînayê Aîgesus’î çêbûye.

Li gorî vegotînekê piştî ku Îason Medeîa’yê berdide Medeîa bi Aîgeus’î re zewiciye. Di vegotîneke din de jî tê derkirin ku têkiliyeke cînsî di navbera Alpheîboîa û şêrekê de qewimiye, lawek çêbûye û navê lawîkî “Medos” e. Ev herdu şexsiyetên mîtolojîk cûda ne. Lê tê gotin ku herdu şexsiyet jî bapîrên Medan in.”

Ev agahî, weke xwendevan be jî, bes e da ku em karibin gellek pirs û şîroveyan bikin. Yek, Medos weke lawê Alpheisboia û şêrê tê derkirin. Ya din jî Medos weke lawê Medeia û Qralê Atinayê tê derkirin. Di baweriyêke din de jî Medeia weke sêhrbazekê tê binavkirin. Weke keça Aitetes hatiye nasandin. Dil daye Iasonê Argonautî.

Ev agahiyên mîfî dibin sedem ku em pîrsa xwe wisa der bikin; gelo jî bo çi di nav baweriyên Yewnanî de baweriyên wisa hene? Heger ev bawerî di nav çanda Kurd de hebûna însan karibû şîrove bikira ku ji ber rewşa Grekiyan a wan deman ku geş bû Kurdan jî bi rêya efsane û baweriyên xwestiye ku têkiliyekê derbibin lê ew bawerî û efsane di wextê di nav çanda Yewnanî de pêk hatibin wê çaxê em ê karibin bêjin ku ji ber rewşa Medan a wan deman ku geş bûye Yewnaniyan xwestiye ku bi wî awayî têkiliyekê der bibin. Ji derî van, pîrsa sêyem ev e, gelo çi têkiliyên Grekî û Medan hebûne? Heger bersiva van pîrsan neyê dayîn jî însan bi dilrehetî dikare bêje ku pîreke çandî hebûye. Belê rastî ev e ku bandora Hûrî û Medan li ser Grekiyan hebûye. Kerem bikin referanseke din: Di "National Geographic" a Tirkî di hejmara Rêbendana du hezar û şeşan de ev agahî heye:

"Efsaneya Kumarbî ku ji edebiyata Hûriyan hatiye girtin di hin çavkaniyan de bandor li nivîskarên Yewnanî kiriye."

Çirîsk
76

Bêyî lêkolînê kûr, li ber destî gellek çavkanî hene ku bi awayekî dikarin şibakeyê li me vekin, rê bidin şîroveyan. Li vir mebest ne ew e ku em bi tenê edebiyata xwe di nav çarçoveya efsane, rabirdû û çanda devkî de bifikirin an jî bi nav bikin; berevajî vê, bi şîroveya wan berheiman re wê edebiyata me di zûtirîn demê de di qada modernîzmê de bibe xwedî nasname. Di serî de ji alî ziman û awayên derbirînê de wê xwe-serî xwe bidin der.

Ka em ji efsane û baweriyên disa li roja xwe ya niha vegerin. Ji bo vê hejmara kovarê du helbestên min hene.

HIS E RENGÊ JIYANÊ

Te di neynikên şîn de dibînim
Şevên çiksayî yên çilê zivistanê
Şînê ezmên neynika min e

Di peyvan de te dibînim
Peyvên ji bo herkesî kartî
Li ser zimanê te terr

Axx, dibêje dilê min, di kêliyên têkçûyînan de
Axx xwezî min ewqasî nenasîya
min reng ewqasî his nekiribûya
ji peyvan neynik çenekiribûya

baş e ku kêliyên têkçûyînen min parçe ji ewrên havînê ne
dişibin axîneke temenkurt

baş e, dibêje dilê min
neynika min şînahiya ezmên e
peyv zimanê neynika min in
dizanim însan zor te tê digihîje
însan çiqasî te dixwîne tu zimanekî diyar dikî

his
tu bi vê dizanî
wexta ku tu kenên temenkurt diyarî berf û baranê dikî
ewr reng diguherin

his bi hezkirina te re qedîfeyî ye
heger bihata zanîn....
Dizanim
Xwezî min nizanibûya
Dizanim
Heger bihata zanîn...

NEWAYA KELEKVANEKÊ

Ez nizamim, nizamim ji bo kenê te helbestê lê bikim
Ji bo çavên te an ji bo gerdana te
Çend kerî helbest divê ji bo sohbeta te
Kîjan peyv sivik dimînin
Kîjan peyv dikevin halê silavên te

Mîn ne hêsirên te yên zarokanê ji bîr kirin
Ne jî tîna nihêrînên te
Rengek heye di vê helbestê de
Dengek heye di vê helbestê de
Ez dizanim ku hew ez dikarim bibînim
Hew ez dikarim bibihîzim
Va ye tu di vê helbestê de diaxivî
Dimeşî
Bûyî helbesteke ji-dilê-xwe
Maçên mîtolojîk bi bîra min tînî

Ez ketime halê bêdengiya masîvanekî
Bi tevî keleka xwe tu mayî li ser dilê min
Ne ji te tê ku tu xwe li pêlan bigirî
Ne jî ji min tê ku ez dengekî bi xwe bixim
Ev e, ev helbest pêl e ji bo keleka te
Bila dengê dilê min her bimîne ji bo kilamekê
Newaya kelekvanekê bûye navê vê helbestê

Anatomiya Aciziyekê

Rojîn Xewn

"Ev dinya dikare hertiştên me ji me bistîne, Dikare hertiştî li me qedexe bike, lê ew ê hêza tukesî negihîje xwetunekirina me."

E. M. Cioran

Çirîşk
78

Ev bûye du roj e ku ez ji malê xeyidî me. Min û bavê xwe pevçînîbû. Wî herdu destên xwe xistibûn beskurka min, sê pişkêkê gumlekê min qetandibûn, bi hêrs wî herdu destên xwe li qirrika min jidandibûn û bêhn li min çikandibû. Min bi herdu zendên wî digirt û ji bo ku xwe ji nav lepên wî xelas bikim û ez biteriqim ku tekiliya ku di navbera me ya ku li ser sextekariyê hatibû avakirin biqete. Herku min xwe bi vir de û bi wê de dibir, hêrsa wî ya li hemberî min gurtir dibû. Sixêfên ku ji min re didan rehmetiya dêya min ji ji wan sixêfan para xwe distend, rebenê ji ber bavê min xêr ji emrê xwe nedîtibû, xêr ji min ji nedît, bi kul û xeman heya serê xwe danîbû ser gorra rehmetê. Hîn ji ji ber gotinên bavê min, bi rehetî di gorra xwe de ji nastre. Piştî çar zik zarok ez jê welidîbûm. Di zayîna welidandina min de, di gundî de du malbatan mêr ji hev kuştibûn, min bi xwînê çavên xwe vekiribûn û ez çêbibûm xwîn rijiyabû, ên ku ji hev kuştibûn ji xwîna dêya min bûn, ji xwîna min ji bûn. Ji ber sancûyên zayînê navkutk dida dêya min ku niqrîsk ji qîrînên wê dipekiyan. Hehecîkên ku hêlîna xwe ya di ber beştan de çêkiribûn hêkên wan ji ber wan qîrînan derizibûn. Ji pênc hêkan, çêlikek jê di nava qalikê xwe de fetisî bû. Dengên teqînê ketibû guhên dêya min, ji ber dengên wê teqînê velistibû, ji êş û kerban porrê xwe kişandibû û herdu aliyên rûyên xwe bi neynûkên xwe yên ku ax di ber wan de pê qelaştibû. Di welidandina min de, dêya min şîn danî bû ku ew malzaroka ez jê şemîtîbûm min nexweşî tê de çandibû. Min û çêlikên hehecîkan çavên xwe bi hev re vekiribûn. Ez ji bibûm ji qewmên hehecîkan, qetla min heram bûbû. Xwezî çarenûsa min, weke çêlika hehecîkê ya ku di qalikê xwe de fetisî bûya. Çûyîn weke tayên perrikan di mûyên canê min de şîn bibûn. Ez bibûm ji qewmên hehecîkan doşeka min a zaroktiyê ji pûşê qermê bû. Ew pîrika hanê, min û dêya min ji hev xelas kiribû, bi neynûka xwe bêhemdî qirrika min çelitandibû. Qirrika min birîn bûbû, di qirrika min de herdu destên bavê min, bîranînên min di nav destên wî de birîn dibûn.

Yaboo! Bila tu ji nav yaboyan rabe ku ariya te ji li ser rûyê axê nemîne! Ez sêwiyê demê bûm ku ez bi bêrikirina kula dêya xwe mezin bibûm. Çi tiştên ku wê dêya min di bîra min de bînin, te di hundirê dilê min de hedimandibûn. Tu bavekî bêrehm bûyî, biqasî misqalê zerre te ji hezkirinê û dilpakîyê tişt nestendibû. Te rojekê destên xwe di serê min de neda û di nexweşiyên min de tu li ber serê min rûnenîştî. Qermîçekên di eniya te de gava ku dihatin ser hevdu, te li tutiştî guhdarî nedikir. Çi bihata ber devê te, ji bo min te tewsîr nedikir. Tu bavê min bûyî, tu bav bûyî ji ber kompleksa te ya baviyê ruhê min ji te diçû. Ji bilî kîrê xwe, tu tişteki ku ji bo ku tu xwe pê bipesinîni

tune bû. Ji ber ku ez jî wî kîrî bûm ku ruhê min jî min jî diçû. Ku ew avika te ya ku te berra hundirê malzaroka dêya min dabû jî bo ku ez çêbibim xwezî bixenziriya û ez çênebûma, tu berpirsiyarê nexweşî û êşên min ên jiyanê bûyî; hertişt, herder, her alav ku tiştên û kesên bêhna kirdeyan, birêseran jê bê mez êşandime. Ez êşiya me ku ez ê êşên xwe gişî di çavên te de derxim.

Ez niha tikîtenê me ku ez nizanim ku ez ê berê xwe bi ku ve bikim. Kesên ku min li pey xwe hiştine ji bilî xwişka xwe li ber tukesî nakevim. Ez û birayên xwe yê mezin weke dîk û mirîşkan wer li benda hevdu bûn ku min û bavê xwe bi peyvan rahişta hevdu wan jî hevaltiya bavê min dikir. Ji ber ku ew jî piştî bavê xwe bûn ku wan bi derewan jî wî re xweş dikir. Tariya ku xwe berra erdê daye hundirê min jî bi xwe re reş kiriye, ez dibêjim qey tu avahiyên hundirê min nemane ku bi ser hevdu de xera nebûne, hundirê min bûye weke odeyeke vikîvala. Sewta xwişka min ku ji bo ez nêrim li pey min qîrriyabû, dengê wê qîrrînê weke zingîniyekê jî ber guhên min dihat. Ew ez dizanim ku tîna canê min heye û dest û lingên min dilivin. Yên ku çav li rûyê min bikevin ew ê bêjin ku ev jî nav miriyan rabûye. Nizanim ku min û bavê xwe me caba hev daye. Ku ji bo rojekê ez venegerim, min dar jî kokê de birîye.

Cihê ku ez jî xwe re çarmêrkî lê rûniştibûm parqeke li xewleyê bajêr bû. Ji bilî min çar-penc zîlam li ser kursiyan, li dora maseyekê civiyabûn. Ji bilindbûna dengên wan xuya dikir ku di derheqê mijarekê de li hev nakin. Du heb jê, weke kûçikên ku tu darî di devên wan de rake hindik mabû rapelikiyana ser çavên hevdu, yê ku berê wî bi min de bû ku jî biriqandina şewqa heyvê, çi li ser rûyê wî hebûya jî min ve xuya dikir. Ji ber ku bi heraret dipeyivî kefa tûka wî bi ser devê wî diket. Ji mirrûzê wî xuya bû ku ew jî bav bû. Bavekî weke yê min bû ku heyfa şewqa heyvê xwe li ser wî rûyî danîbû. Heger rûyê mirovî karaktera wî vedibêje yê viya hanê jî weke yê bavê min, wê xêr di rûyê wî de tune be. Ez pê dernaxim bê ev çend saet in ku ez li vir runiştîme ku ez hew dikarim bîra demê jî bibim. Ji tevizandina laşî û kulîmekên xwe ku ez pê derdixim, demeke dirêj bûye ez li vir runiştîme ku divê ez hinekî li ser xwe bigerim ku qene tevizandina canê min jî ser min here; lê mixabin dikim nakim pêvçûna min û ya bavê min jî hişê min naçe, weke bargiraniyekê her dihere barê bîra min girantir dike.

Çenteyê ku min bi xwe re anîbû min avêtibû ser milên xwe, bi gavên sistik û derizî min berra dû siya şevê dabû; ronkaya heyvê bajar şilfitazî kiribû ku heya kûçik û pişîkên bajêr jî herkes pê hisandibû ku ez xerîbê vî bajarî me. Naskirina min û ya vî bajarî cara yekem bû ku tu serpêhatiyên me bi hev re çênebîbûn, sedama ku min xwe li vir girtibû min nedixwest ku ez li rûyekî nas biqelibim ku ji bo herkes jî min re li vir xerîb in. Min dixwest ku ez li kolanên bajêr gişî bigerim û heya piçîkek deng di min de hebe biqîrrim û bibêjim ez dixwazim ku bavê xwe bikujim ku ew di zaroktiya min de li kuştina min digeriya. Berî ku ez wî bikujim ez ê bi herdu tiliyên xwe çavên wî birjînim ku tola xwe û ya dêya xwe di çavên wî de derxim. Siya ku min berra dû dabû hêdî hêdî wîndî dibû, ez wîndî bibûm ku min xwe wîndî kiribû. Siya min di xewna min de çavên bavê min wîndî kiribûn. Min nedixwest ku êdî di xilmaşiya xwe de jî çav li çavên wî bikevim ku nêrînen wî tirseke xof berra nav dilê min dida.

Bi dengê azana melleyê sibehê re, di xewê de ji nişkan ve ez veciniqîbûm ku hêdî hêdî pêlên ronkayiyê bi xwe re rengê şevê zelal dikir, ji bilî min reşên tukesî xuya nedikir li derdorê. Şînkayiya ku min xwe li ser vezelandibû jî ber rewşa di bin de ku ew êşa di êvar de ketibû kulîmekê min li xwe zêde kiribû. Çend qurîş pereyê ku ji eceleyan min jî bêrika bavê xwe derxistibû ancax têra xwarina min bikira ku min nikarîbû bi wî pereyî jî xwe re pê li otelekê jî razama. Carekê pêdiviyeke min jî pereyan

çêbibûya heya ku çend wereqe dida min çavê min derdixist bavê min. Ji pereyê xwe pirr hez dikir ku nedayîna pereyan ji xwe re kiribû tebh, kîjan cara hinekan pere jê bixwesta, berê xwe dida camiyê û bi wê sond dixwar. Qenciya wî zû bi zû nedigihîşt mirovan, cihê ku ew lê bûya, navê qencyê di ferhenga wî de derbas nedibû ku ez li cem wî bûma gava ku ji hinekan re bigota na, min rûyê xwe ji ber naya wî diguhert. Pere, ji bo wî weke dinî bû, jixwe ji bilî herduyan ji tukesî re nedibû, li ser wan herduyan direclî ku li gorî feraseta wî li vê dinyayê pere, li dinya din jî wê dinî ew xelas bikira. Hişmendiya wî li ser berjewendiyê hatibû avakirin ku menfaetperestekî dera hanê bû. Di gundî de çend kesên weke wî xwe li civata wî digirtin ku fêdeya wî li wan jî nedihat. Yên ku dihatin cem wî, di tûrikên wan de ilûmê fesadiyê tucarî kêr nedibû. Bavê min jî di nav de ku yên weke wan din û îmana wan gellacî bû. Di çêbûna min de tiştê ku xelkê digot di wê teqînê de tiliya bavê min jî tê de hebû.

Aramiya bajêr bi dengê şîrrîna avê xera bûbû. Zilamekî ku emrê wî li dora çilî xertûma ji tankêra avê dihat li pey xwe dikişkişand û bi wê avê pê dar û şînkayîya kêlekên rê av dida ku tiliya xwe ya mezin a destên rastê datanî ser devê xertûmê weke sivrikan, ji bo ku av ji devê wê bipijiqe û dora xwe gişî şil bike. Dengê wê şîrrînê, mîza ku di mîzoka min de gewimîbû har kiribû, ji bo ku ez bi xwe de nemîzim min dev lêvên xwe dikir. Qene mekîneya wan hinekî ji min dûr biketa min ê ji xwe re li ber darekê bel bikira, lê mixabin her ber bi min ve dihatin, yê ku xertûm di destî de, ji bo ku bi min re biaxîve bi lezgînî teql li xertûmê dixist. Berê ez ji ruhê xwe aciz bibûm, ji min nedihat ku ez silavê jî lê bikim. Bi zîmanekî biyanî bi hevalê xwe yê di hundirê qemyonê de dipeyivî û ji wî were hey digot; bimeşe! Herku nêzî min dibû û ji ber tirêjên rojê yên ku hindik mane bizên, rûyê wî ji min xuya dikir ku ew karker; ew bû... ew kerê dera hanê bû... yê ku do bi şev min rûyê wî li parqê dîtibû ku ew rûyê wî weke yê bavê min bû. Rûyê wî paqîjiya destên sibehê heram kiribû. Xwesteka min a ku ji bo ku ez herim bi serçavê wî de bimîzim çêbibû ku weke ez herim bi serçavê bavê xwe de bimîzim ku ji bo ku ez dilê xwe li bavan rehet bikim.

Ya Rebbî! Min çi guneh bi te kiribû ku te tovê min li vê dinyayê avêt, min çi xera-bî gihandibû te ku te ez di bavekî wisa de derxistim. Di jiyana min de koncalên karesatan vebûne ku ez li wan koncalan mame heyirî bê ez ê kîjanan bigirim ez ê xwe di kîjanê de tê werbikim, rêviyên di hundirê min de qetqetî bûne ku teyrên başoke û eylo li ser şerrî dikin ku qetên rêviyên min ji nav nikilên hev direvînin. Kurm û kêzikan heya ruhê hestiyên min hûrhûrî kiriye. Bablîsokeke acizî bêhn kiribe min jî bi bayên xwe re ber bi tunebûnê ve dehf dide, divê ez tune bibim ji bo ku ez li ser vê axê nemînim. Mayîn û hebûn cehdeke vikîvala ye. Tu çiqasî di ber xwe de bidî tu yê nikaribî xwe ji tunebûnê vedizî. Ev dinya li ser tekiliyên berjewendiyên nêtxerabiyê hatiyê avakirin ku min hebûn û tunebûna xwe avêtibû stûyê bavê xwe ku ew jî berpirsiyarekî hillikî heramî dera hanê bû.

Ji bo ku xwe negihîne min, çenteyê xwe min diavêt ser milên xwe weke ku min ew nedîtibe min berê xwe jê guhertibû. Hêdî hêdî ez ji wan bi dûr diketim, her ku ez bi nav bajêr de diçûm aciziyên min bibûn weke moriyan bi mejiyên min ve radipelikîn ku bi lingên xwe yên werimî min xwe berra nav neqebên bajêr ên kurmîbûyî dabû. Niha erdhêjek biqewimiya ew bînayên weke eceban bi ser serê min de hilweşiyana. Ez bimirîm dêya min jî tune ye ku were li ser serê min bilorîne, axa li ser mezelê min bi destên xwe rast bike. Min bêriya dêya xwe û ya mirinê kiriye ku min dêya xwe winda kir, a din jî bi min re digere. Xuya ye ku wê heya demeke dirêj bi min re hev-altiyê bike.

Xezo

Seydo Ozkan

Ji bo Ceylan'ê

xezo!
xweda ji şevê û bêhna kezebê ditirsin
weke cinnên ku ji hesinî bitirsin
xwe vedişêrin di bin ebayê melkematî de
ji zarokên me ditirsin xezo,
ji we ditirsin
ji çavên te...
lewma rêz digirin
lê em ji çavên te hez dikin
lewma natirsin em
ma tirs û hezkirin bi hev re dibe xezo?

Kurdîaxivîn

Sadiq Şen

Îroj erefata cejna zimanê Kurdî ye.

Sibe gellek kes û sazî wê vê cejnê, bi awayên curbecur pîroz bikin. Wê peymana pêşxistin û xwedî-lêderketina zimên nû bikin. Lê ez nizanim û nikarim texmîn bikim bê ka dê çend ji wan kes û saziyan biryareke bêveger bidin da ku di hemû jiyana xwe de bidomînin; di hundirê malbata xwe de bi zarokên xwe re bi tenê bi Kurdî biaxivin. Çend saziyên me dê weke “dibêjin” “bipêjin” û bi tobeyeke nesuh, hemû kar û barên xwe bi Kurdî, danûstandinên xwe bi Kurdî bikin.

Çirast
82

Nizanim ka wê çend kesên ku dibêjin: “Ez nikarim xwe bi Kurdî baş îfade bikim” dê dev ji van hincetên eletewş berdin û li rastiya xwe ya rasteqîn vegerin.

Nizanim ka wê çend dayikên ciwan bi xwe ve werin û dev ji tercumaniyê berdin; tenrcumaniya di navbeyna zarok û dêbavên xwe de

Çend jinên dilsoz dê dabikên xwepişaftinê ya ku di şexsên jinên Kurd de, dixwazin bi ser bixin, biteqînin û di gorra pişavkeran de veşêrin û telqîna wê bixwînin.

Hemû rengên pişivandinê, li xwepişivandinê hatiye barkirin. Êdî peyv ruh nadin, tîn kuştin ji aliyê xwediyê xwe ve; kuştin ji mirinê bezatir e. Çavkaniyên herikîna zimên, ji binî ve tîn zuwahakirin.

Min xwest ku ez îroj li gorî derfetên xwe wêneyekî Kurdîaxivan bikişînim. Jixwe ji bilî zindan û radyoyê em Kurdîaxivan nabînin nabihîzin.

Belkî hevalên ji zindanan derketî, ji mêj ve pêşangeha wêneyên Kurdîaxivan vekirine û pirêzeyî Kurdîaxivîna girtiyên azadiyê danibin holê. Lê dîsa jî gellek guherîn, veguherîn çêbûne jî. Ji bo girtiyên azadiyê gotina “Dibêjin lê napêjin”ê derbasdar e. Ligel ku girtiyên azadiyê ji bo zimên çavkaniyeke bergumanê tîn dîtin jî lê di rastiya xwe de ne wisa ye. Di vî derbarî de ji bilî çend kitrîskên biçûk mirov nikare behsa şewqeke ronîker bike.

Helbet ked û hewldan hene. Bes bihar bi çend gulan nayê. Lê li şûna çandina sor-gulan, çandina dirrîreşkan jî êşeke malkambaxî ye.

Min îroj guhekî xwe kir serrad û yê din jî kire bêjing. Min destê xwe ji hemû kar û barên rojane kişand. Lê min nedikarî heta êvarê ez xwe ragirim. Di nava du-sê saetan de ji radyoya "Dengê Mezopotamyayê" û girtiyên azadiyê çî ket ber devê tirpana min, min dirût û ez li jêr bender dikim:

Ji girtiyên azadiyê ên jixwe-qayîl bigire hetaa siyasatmedar, nûçegihan û bername-karan jî dihundirîne ev diyalogên hatin daxistin.

Ev gotinên li jêr, ji gotinên wek..."... yerin dibine batırmiş kır..." hatine dawerivandin û deriyên wan li ber şîroveyê hatine dadan.

Pêşiyê min radyo vekir. Şakiroyê gorrbihuşt bi strana "Emro"yê zimîn ji koda mejiyê min anî. Sewta wî ez sermest kirim, tehma gotinên wî ez serxweş kirim. Paşê hêdî hêdî cênîka min cemidî.

Radyoya "Dengê Mezopotamyayê" xeber dide:

"ji qadên parastina Medya rojbaş..."

"...Komplo vala derxist..."

"... Me van hestan jiyan kirin..."

"... Min çavek avêt rojnameyan..."

"... Hükümetê ev fırsat revand..."

"...Çi vekirina kurd û çî hal..."

Ji nişkan ve girtiyekî azadiyê yê ku di Kurdîaxivtinê de dorê nade tukesî dest pê kir û got:

"Hevalno werin yêmek..."

"Qehwaltî hat...?"

"Erê çawa hat de..."

"Yaho, ev bilinçli olaraq roja êtimê çorbe didin, da ku êtim sabote bibe. Artıq em ê kengê..."

"Wele yalanız min lı başlıxê çendekan nihêrî, otiz nîsan, bîr gulan, bêş gulan sayîsî çarpmişê min bûn..."

"Heval ez piçekî dinlenmiş bibim. Guhê te li qêpî be, ez îro çûbûm ortağ alanê, ez yorgun im.

"Temam de, te yoxunlaşma min daxitmiş kir"

"Na loo çî yorgunluk çî hal; tu ihtiyarbûna xwe bi mîsafirtiyê gêzlemiş dikî."

"Heqaretê (neheqiyê) li heval neke. Wele bileh ji ciwanan kevîran derdixe."

"Heval tu çî dibêjî?"

"Min tiştek yanîş negotiye kî. Ez dibêjim arqedaş gençlerden taş çıkartır."

Pêşiyên me ji xwe de negotine: "Kesê ne li govendê xweş reqas e."

Jarê

Umît Esen

Girêsk
84

Nezanim ji bayê babilisoka weke kemanên şîzofren li ba dibim
Diqurmiçim di rehên jarê de
Qehrên meyandî vedixwim di zikata talda te de
Carisiyên nemayî didim ji xwedayên xurriyê re
Tu bi rondikên asoyên xwe dike birûyên xwe ji çavê derî şikestî re negire
Ez dizanim pakiya te di cihê xwe de ji westatiya westatir
Û ji zelaliya te tîr qewirandin avên te lê vexwar
Sersaxiya çawakirina xumîna tewafa paxilên te ji baranê zûtir
Û qulmişkên kerbê di berbanga girava hêsrên te de dixeniqin
Darên dûr hilma te jê diweşin
Nifirên nivîstên sê qozîk di sînga me de diteliqin
Lê ez dizanim jarê semawendê tazîtiya ayetên te me rûpel bi rûpel
Û bi cizba mêtina lêvên te ketime
Jixwe nehatime parsê di benderên te de
Weke kuliyekî bêzar dişewitim
Û Jarê herdem navê te yê kelogirî barên hêştiran li piştê min dike di kaşên çavên
te de
Marmasiyên tiliyên te a niha bi şevçiraya heyvê re gola dilê min dihejîne
Govenda derewan girtiye bi peqokên biharê re
Bûme xizanekî xwelîser ji tayê vedirşim
Geşta malwêraniya xwe me
Gumana min tune

Dê û Kur

Ehmed Osman

Kekê min em mirovine reben û bêkes in. Bextê me carekê reş bûye. Qey Xwedê di pey nivîsîna qedera me re, qelema xwe şikenandiye, loma em darikî di derziyê re dikin jî îfleha me çênabe. Em li kîjan aliyê xwe binihêrin, sêwiyekî li hinda xwe dibînin, berê xwe bidin ku sêkelek porrê xwe diwerîne û bi xermişekan rûyê xwe di nava xwîn xirarê de diqelêşe. Rêwiyên me venagerin, jî xêra Xwedê re yekî ku xeberekê ji wan bîne jî çênabe. Carekê lehnatek li me selitiye, dara xweşiyên me qurifiye.

Çirîsk
85

Ma hê ez ê ji te re behsa çî bikim? Tu hema berê xwe bide vê gorristanê bes e. Di bin her kêlgorrekê de çîrokeke bigirin û hikayeteke bisoj ên nehatine gotin hene. Tu destê xwe deynî ber serê kîjan gorrê tu dê nalîna ku ji hinavên mazlûman tê bibîhîzî. Miriyên me di nava janan de bê dua jêrax bûne. Ruhê wan bi şev di nava komika hestiyên de bêrazan û bi roj li navserên kêlgorrên xwe vedinin, çaveriya hatinekê ji xerîbiyê dikin. Bêxûde. Her kêlî giraniya jibîrkirinê dikumûşe ser wan, mizgîniya ku çaverê dikin piçekî din di nava nehatinê de berze dibe.

Ha tu li van du gorrên han mêze bike. Herdu gorrî mîna hev, tu dibêjî qey gorrên cêwîyan an jî dildarên ku mirad di ber de mayîn in. Lê na, ew dê û kur in. Belkî vê gavê giyanên herduyan derketine ser serê kêlgorrên xwe û li hev mêze dikin, destê xwe bexûde dirêjî hev dikin. Hema carekê destê wan bigihîje hev, dê bi dilê rehet di gorra xwe de rakevin. Lê destê wan pev nagihê, çiqasî ber bi hev ve tînin jî dîsa navberek dimîne. Bibe êvar dê dilşikestî li nava komikên hestiyên xwe vegezin û sibehê dê dîsa derkevin jor û dest dirêjî hev bikin.

Ev ne çîrokeke pirr kevn e, hema heta berî bi çend salan me bi şûnve dibe. Kur hê ciwan bû. Bêyî ku xatir ji dayika xwe bixwaze, bi gellek hevalên xwe re mîna ku bi dû evînekê bikevin berê xwe didin şerrî. Sal dibihurin. Hevalên ku pê re çûbûn, yan vedigerin yan jî xebera mirina wan tê. Lê ciwanê ku em dibêjin ne vedigere û ne jî xeberekê jê tê. Hinek dibêjin miriye, hinek dibêjin maye. Dayika wî guh nade gotinên tukesî. Mîna ku dê hema vê gavê bê taştê, firavîn û şîva kurikê xwe datîne û radike. Dema ku dibe şev nivîna kurikê xwe radixe û sibehê dide hev. Heyhat ku hindekan jê re behsa mirinekê bikira, çî nifîr û lomeyên ku dizane lê dibarandin. Wisa kekê min!

Serê sibehekê xelkê gundî bi wîlewîlekê ji nava nivînên xwe veciniqîn û rabûn ser xwe. Êdî ji kîjan xeybê peyamek jê re hatibû nizanî, dayika ku li hêviya kurê xwe reş girêdabû, dest avêtibû porrê xwe û diqîrriya: “Kurê min mir! Kurê min mir!” ax tê bidîta mirovî digot qey şanê meşerê ye, Îsrafil li sûra xwe dixê. Em li serî civîyan. Bêmecaliya wê mîna arekî sor bi hinavên me ve diçû. Jineke hêvîşikestî, ma me dê çi çare jê re bidîta. Bîst û heft salan temam biqasî misqalekê hêviya xwe neşikand, serê sibehekê mîna dareke çinarê ya kevnare hilweşiya û ket. Gotinên dawîn ên ku ji devê wê derketibûn ev bûn: “Hûn gorrekê ji kurê min re çêbikin da ku ez têr li ser bigirîm, bila kurikê min bê sergirî nemîne!” Me gotina wê ducar nekîr. Me ev gorra li milê rastê çêkir. Dayika sêkel hat keziyên xwe hat keziyên xwe di ser gorrê de birîn, matema xwe danî û dest bi girî û zêmarên xwe kir. Heta ku canê xwe neda ji cihê xwe ranebû. Dîsa em hatin me ev gorra li milê çepê çêkir. Dayika reben tê de bi cih kir. Kesekî wê yê din tune bû ku sersaxiyê lê bikin. Bêdeng em ji nava gorristanê bi rê ketin.

Hê me çend gav neavêtibûn siwarekî bi çekan şidiyayî û kolos li serî ji wê de hat li ber me sekinî. Sersaxî di me da û mala jina ku a niha me çalkirî pirsî. Pîrejinekê bi destê xwe mala jinikê nîşan da û gotê: “Kurê min mal bêkes e!” Rêwî acêbmayî pirsî: “Gelo xwediya malikê bi ku ve çûye?” Pîrejînekê lê veşand: “Vê sibehekê emrê xwe da haziran, em ji ser gorra wê vedigerin.” Siwarê xerîb çawa ku ev gotin bihîst, bêhal ji hespê xwe de kete erdê. Em li dorê kom bûn. Fitekî mêran bêmecal li erdê dirêj bûbû, hew gotina “Dayê! Dayê!” ji dêv derdiket. Kurê jinika mirî bû. Ji me xwest ku em wî bibin ser gorra dayika wî. Em çend cihêl ketin bin milê wî û me ew heta ser gorrê bir. Ji me pirsî ka dayika wî çawa miriye. Dilê me negirt em derewê lê bikin. Hal û meseleya dayikê me jê re got. Wî çi got tu dizanî? Got: Madem dayika min li ser vê gorrê giriyaye divê ez jî têkevim vê gorrê!” Berger û sergera me tu kêr nekîr. Li ber serê dayika xwe rûnişt, bê xwarin û vexwarin heta ku can da. Hespê wî jî heta ku siwarê wî li wir bû ji cihê xwe neqeliqî, ne xwar û ne vexwar. Em hatin me tirba vala vekir, kur tê de bi cih kir. Wê hingê hespê wî hêz da xwe û bi cihê hatî ve meşiya û çû. Kesek bi dû hespî neket û kesî ew negirt.

Ev e halê me kekê min. Hê jî di nîvê şevan de ji nişkan ve dengê şihîniya hespekî ji vir tê. Gellek caran me pa, lê çavê me pê neket. Em li halê xwe digirîn, lê çi fêde.

Bi Nêta Cenabet-hildanê Berê'm li Şi'îrê Kenanê Nado

"Mixabin mirovahî cenabet e!"

Du tas avên cemidî
Xewnên tarîreş dicirifînin
Dî çelavên gilover de qirêjîyê diweşînin

Qirêjiya...
Ku tiştên sik ji mêjûyan naheçheçikînin
Şeveq, sibeh, roj diherikin
Lê mixabin...

Mirovahî cenabet ma!

Nûh'î cihê xwe dît, rûnişt
Bîrahîm'î ji êgir av guvaşt
Îsmail'î li çolê qurban peraşt
Ûsiv'î bi yanzdeh stêrkan gurek kuşt
Meryem'ê bi tasek ava vaftîzê serê Îsa'yî şûşt
Lê mixabin...

Mirovahî serpîs ma!

Pêşiya avê Feqî'yî girt
Tîrên eşqê ber bi ezmên ve Mela'yî avêt
Bi destê bav Rênas'î keç kuşt
Ev helbest dubare min nivîşt
Lê mixabin...

Mirovahî cenabet ma!

01.08.2010 02:00

Otmeyên Hêviyê

Ar-da Janxwar

Çirîşk
88

Dêwûd, merivekî qamqût û bejnqalind bû, çapana devê wî weke gûndorekî neqirandî bû. Di besta kokimê pozê wî de û ji heta stûkûra hundirê firnikên wî tijî mûyên reşbelek bû. Çavekî wî betanekî spî xwe dabû ser. Mijankên wî weke şûran bûn, xwe li ser kodika çavên wî reşbadayî bûn. Xortekî kej û porr sor û zêrî bû. Pîrr ji xwe hez dikir werwer şehikên wî yên lekînî û mirêka wî ya girover li paş wê ji sûreta bêrîvayîna wî tim û tim pêre bû, bi wextê dirêj li ber neynikê radiwestiya. Carinan rastika temberîka xwe di kêlekê de, carinan jî di nav qotê serê xwe de rast dikişand, lê ew herdu çifta porr di pêşenîka wî temberîka wî li gorî dilê wî rastkêş nedikişand. Sal duwanzmeh li kêfa xwe digeriya û lê dibaniya. Meraqa wî li ser sîlehan pîrr hebû. Mehê xwe nedigihast mehê şehk, goreyek, bêhnok, demançeyên çardehderb, tizbiya ji kevirê Erziromê jê kêr nedibû, di her çar demsalên salê de, xwe li gorî mehên demsalê kincên xwe nuh dikirin. Dêwid, li nava gundî mirovekî pîrr qerfdar û heneksaz bû. Gundî çêj ji qerfê sazîya wî digirt.

Bêhnok, tizbiya bi kevirê deqdeqî a Erziromê dibiriqand, çend gurûze pelê cixareyê yên îbelo, çeqmaqê ji kevirê çeqçeq li ser kirasê çaqmaqên xwe çermê pezkoviya belek hatibû xemilandin û demançeya wî ya beçîka ya çardehderb xist bêrîka dexlika qomidînê, bêrik delda dexlikê, xist hêlina wê, mifte û kilît rahiştê çend birme lêxist. Rahişt qomidîna xwe perdeya reşbelek a kûlînê ji ber destê xwe bi aliyê rastê de şeqitand, qomidîna xwe danî li tenîştê boxçikên dev girêdayî, hinek potik û motikên kevn li ser qomidîna xwe belav kir. Doşeka rûyê wê yê hibrên birdik birdikî ji bo mêvanan hîn nehatiye şixulandin danî ser qomidînê. Lihêfên bişelte pê werkir, mifta xwe rame-da nav doşeka mêvandaran.

Debara xwe bi dayîna demamiya hemiya, xerzikên mêmê dikir.

Bi tenê du parçe zeytûnê wî û çend hemiyên darên berrû mazî, çend xerzikên tîrî yên ji bavûkalan mabû hebû. Ne emaret li xerzikên mêmê û darên mazî dikir û ne jî lê miqate bû. Zikê kafiran bi van xerzikan dihat, tenê bi emerata bavûkalan û bi xêra kedan wan tim xerzên wî yên mêmê çend goşiyên tîrî yên biriqandî jê re texsîr nedikir. Lê zeytûnên wî tim bê av bû, tiqînî ji qirrika şîneroke darê dihat. Dora avdana zeytûnan, ronahiya rojê ji siya zinara xwe berra ser miskara dida ewçax av digirt heta roj diçû ava. Ava bi dorê têra pariyekî dikir, ên din têrê nedikir. Cêfinê darên zeytû-

nan weke hêlîna çivîkan hûrik jî çêkiribû lê dîsa ji têr av venedixwar. Ên rewşa wan a aborî hebûn bîr li nav rez û baxên xwe xistibûn. Ava kaniyê hinekî kêmbûbû, çî kom avên li dor hebû dikişand binê xwe, lê bîrên xurt ên qultênên mezin li binê erdên ava kiribû kaniya reben bi çend hêsirên xwe yê guvaştî jî xistibû nav ava diçû, li ser rez timî jî velêv velêv bû. Lê feqîrên xerzê zeytûnan ji ber hişkesaliya sê salane, hêşîna zeytûn tim çilmisiye û guvaştiye, çavî navperokiyê, qelişteken axê tim bi ûfardarê dilopek ava cêfinê cîranê xwe bû, adaniya zeytûna qet tûne bû, ên hebû weke bişkulan hişk, bêgoşt, bêzeyte bû.

Reprepa çend pêgên kesan li ser xaniyê axîn hat, axê ji nav beştê xênî re xwe berra kortika destarên kevirên daxik daxikên damarok û sore da.

Bîskek çû teqteqa dêrî hat. Dêwûd'î fêhm kir ku çend mêvanê wî hatin. Bez da xwe, birma dêrî ji ber kişand, deriyê darîn vekir, mêvanê xwe ber bi odeya jorîn a herî dawî ya kadînê ve birê kir. Deriyê darîn kişand, birma wî dîsa weke berê kir, darekî dargûlikî, stûr û qalind da pişt dêrî ku jê re bibe qewet.

-Ji hevalên xwe xêr hatin xwest. Rewş û halên wan pirsî, barên li ser piştan wan ji destên wan girt, danî qoziyeke ku pêk û meşa kesî pê nekeve.

Çirîşk
89

Dêwûd çû ji kulînê tejikeke ku rûyê wê bi nexşê pezkoviyan hatiye xemilandin û hîn nehatiye bikaranin derxist li ser dîka bi axa zerîn hatiye seyandin raxist, kulavê nexşînî danî ser tejikê û çend balgîfên guhik nexşik û rû rengê birdik birdikî danî li pişt hevrêyên xwe.

Dêwûd'î, xwe berra ber kulînê da, ji qomidîna xwe ew cureyên demançeyan derxist, anî li ber hevrêyên xwe danî, çend derb dor bi dor li binê êxur cerriband. Berî ku xatir ji hevdu bixwazin hevrêyên wî;

- Dêwûd li xwe miqate be, bi tenê tu otimeyê me ye, van rojan gur pirr digerin, de bi xatirê te.

Hevrêyê pêşeroja xortaniyên welatê wî ji ber çavan dûr ket.....

Berbangî sibehê bi rewrewa sê û kûçikan Dêwûd bi xwe hisiya, ser dilê wî kir gurgurp wî fêhm kir ku tişteke heye, lê tam pê dernedixist, gelo leşkerê Romê wê dîsa bide ser kîjan malê, hîn di dilê xwe de difikîrî qirpînî ji dêrî hat, zar û zêç ji tirsan her yek ji nav nivînan pengizî derekê. Netirse law û qîzên min, tişteke tune ye. Zarok çav li leşkeran ket xwe bi dawa dêya xwe girt û ket pişt dêya xwe.

Bû zûrezûra kûçikan, Tolo kûçikê mala Dêwûd'î pirr bîaqil bû, wexta ku leşker dihat dinasî pêga wan, bi hewtehewt qirrik li xwe diqetand. Lê vê derbê leşker bi tev-dîr hatibû ewila ewil derbeke bêdeng berra ser kezeba Tolo'yî dabû, kûzîniyek pê ket, erd û ezman xwîn dibarî.

Dêwûd bertena bêcemayê daxik daxikî, fanêreyê gewrikî, herdu destên wî li paş di qeydê de, lingên wî di dehfikê de, bergiya çavkortên wî bi potekî gennî û mişt qirtikî

girêda li pêşiya leşkerî, ji lehiyên hêsirên evîndarên xwe bi dûr ket.

Dêwûd anî, xist jûreke tarî û dest bi pirsan kir.

-De bêje te ew sîleh ji ku anî? Navnîşanê bide. Hûn çend hebin? We bi çi awayî dianî? We dida kê ew demançeyên han? Hevalê te kê ye? Zû bêje em dest te nadin. Em ê te berdin, tu yê herî nav gedekên xwe, de zû bêje.

Di nav re dengê wajewaja insên, bêhna kerafiyê, dengê sewta dengjiguhêra, bi dewla ava cemidî li ser serê sorûzerî ba dikir. Hingizê darin dor bi dor li pehniya wî, li nav kaviyê parsûyên wî, li derzika piştê wî, li kelaha sînga wî, henaseyê wî bi hiştinkan lê dida û didewisand. Lê kirtî ji devê Dêwûd'î dernediket. Wî zanîbû heger bigota "kirt", wan ê ew bikerritanda, wan ê evîn û evîndarên wî bikirina ardûyê keritandinê.

Bêhna verşiyê û potêkê, gemaroka qirtik girtî li ber bêvilê, stûna bêvila wî pûç kiribû.

Êşkencekar qirçinî ji deriyê hesinî yê nezaretê anî û du tîlên ji êgir bi nav çîpên Dêwûd'î de vexistin, çîzinî ji heyaya wî hat, keldûman ji kewara dilê wî fûridî, çêrr û gef lê qewitand.

-Me gellek weke te dît, lê dawiyê tîr di qûnê de hilnedihat, zirtzirta qûna wan bû, tu xelasiya te ji destê me tune ye, tu herî erş û fersî tu yê werî ber gunnikê reş, de zû li xwe mikurr bê, ji vê ezayê xelas be.

Êşkencekêr, bangî hevalê xwe yê êşkencekar kir û got ka hingizê darin bîne û em wî belot bikin.

Hingizê darin di nav telşê herdu hêtên kulîmekên wî de bir û anî, heta ku ji xwe çû, çend dewlê ava zeşgarokî û cemidî li gewdeyê wî ba da.

-Kî bûn ew hatin mala te? Zû bi axive.

Dêwûd, ne kesek bû ew derewinî reşayî ye, tu haya min ji va haweyan tune ye.

Dêwûd, agir bi laşê wî ketibû, lê ew li ber êşa gewdeyê xwe nediket li ber êşa xayînen şikêrok tebatî nedihatê.

Êşkencekar, ka bi axive, xwe û me ji vê êşkenceyê xelas bike, em bi rehetî ji te re dibêjin, dev ji vê eksa xwe ya çors berde, tu bi rehetî nebêje, tu bi lêdanê bi axive.

Dêwûdê gundorekî dûqatî di şûna cantê de derbas kir, gola xwînê di newala tekerî de kom bû, peqikê xayîntiyê digindirî û dipekiya. Lê Dêwûd di belegoşka wan de bûbû dêwek, di aşên şikêrên xayînan de bûbû sîx û balona kêfa dilê wan dîtand.

Gewdeyê wî mîna ku dan di ber hevdu de bû kutan, gewdeyê wî reş û şîn bûbû, lê derûniya wî weke polayî zindî bû, êşkencekar tê de ji kaştî de ketibû.

Pireka wî destê xwe jê şûstibû. Hewserê wê pîrî nazik bû, jixwe tu kar û îş ji jê nedihat. Ne germ lê dihat ne sar lê dihat. Mirovekî zivistanî mîna germyanî û havînî ji zozanî bû. Piştî deh rojan bi şûnde zîlamê wê hat berdan. Dêwûd di êşkenceyê de bûbû weke darikekî, ku tu pîf bikê wê bête xwar. Kêf û coşiya zarokan dikira bifirriya, lê piştî ku bavê wan hat û çav li bavê xwe ketin wan ew nas nekir. Ji halê însanetiyê derketibû, lê wan şikir ji wê re ji re anî û çûn destê bavê xwe, hilorikên gewrik gewrikî li ser hinarokên wan dibariya

Çavê Mirinê

Nazê Yerlîkaya

Xweza bi lez şanoya xwe dilîze her êvar
Dizîvirre tê şeytanê pirrzane
Di pey de govendê digirin melekên nezan
Kevn dibe di nava roniyê de jîyan
Çavên mirinê vedibin di dewsa tariya bêdengiya mezin de
Hin kes şîpê ne, hin kes jî di şanoya xwezayê de di xewê re çûne

~~Çavê~~

91

- Beriya evînê û piştî mirinê
Bi hev re yek e nepenîya gerdûnê
Şeytanê zana dilîze bi ramanên me
Di dilên me de govendê digirin melekên nezan -

Dibe dafîkek di çavên me de bayê ewrên hênîk
Weke berf bibare, qeşa bigirin lêvên me yên qelişî
Bi dûre di destên me de belav dibin bayên hişk
Li ser janan dilerizin bihar û stranên havînê
Çavên mirinê vedibin di werza xemgîniya mezin de
Hin kes şîpê ne, hin kes jî di şanoya xwezayê de di xewê re çûne.

- Beriya evînê û piştî mirinê
Bi hev re yek e werza payîzê
Bayên hişk dilîzin bi ramanên me
Di dilên me de govendê digirin bayên ewrên hênîk -

25 Rezber 2010 - Stenbol

Tu û “Xwe” ya Te

Hecî Nehsan

Tu hîn li vir dipeyivî. Bi sorahî, bi zerahî, bi rengçilmisîn. Lê dîsa payîzê got merheba, pelên daran yek bi yek dev ji daran berda û wan bi bayê hênîk re bar kir. Darên hewşa te şilfitazî man.

Ezmanekî bêdeng û xemgîniyeke bêreng ji te re ma. Pirr werz di ber vê şibakeyê re çûn û hatin, roj weke çivîkan bihurîn û çûn, te timî li derve dinihêrî, te digot qey hemû roj, hemû sibeh wekhev in. Te digot qey, ê ku her roj li ber vê şibakeyê li derve dinihêre hertim tu yî.

Çirîşk
92

Heya duh li pirtûkxaneyê, dema ku te berga pirtûkekê qulapt di bin berga de wisa nivisîbû: “Divê mirov bi tenê di şibakeyê re li jiyane û li dinyayê nenihêre.”

Hingê te ji xwe pirsî: “Gelo çend şibake di jiyane de hene.” Tişteki din hate bîra te, te got di mirovekî de çend jiyane hene û çend rengên mirinê hene?

Û dem;

Dem çi ye? Ew jî timî li ber vê şibakeyê sekiniye gelo? Ew li çi dinihêre? Bi çi sebra xwe tîne? Diçe û tê an diçe û diçe? Pelên daran, ava çeman, bêhna gulan, êşa dîlan, hêvî û derdan bi ku de dibe û ji ku tîne?

Te dîsa ji xwe pirsî, werz li pey hev diçin û tên an bi tenê yek werz heye ew jî kefenî diguhere û dikeve timtêla çar werzan?

Niha bi tenê di şibakeyê re dinihêrî. Tişteki dipeyî. Destpêkekê yan jî dawiyekê. Ji xwe te emr wisa bir nivî. Hîn jî li benda çûyîn û hatina werzan î. Lê a bi êş hîn jî nizanî tu gihîştîye ser sînorê nivemrê xwe. Emrî, tu bi nivî kirî, tu qet kirî, tu taliwandî, tu hilwerandî.

Di hinavê te de dengêki dirêj heye, dengê ku serê her peyva bijan dikişîne. Ê te nihêrînek te heye, nêhêrîna ku toz û dûxana dilê te tev radike. Xewnên te tev zivistan in li ser nivînên te, ricifînên te bê salveger in. Carinan xwe li xwe qedexe dikî, ji xwe dixeyidî da ku aliyekî xwe yî din nebînî. An jî xwe nexî şûna xwe. Lê tu xwe dixî şûna

herkesî û çîrokên hinên din dibêji.

Carinan ji xwe ji ber hinên din sûcdar dikî. Carinan di cendekên hinên ku qet nas nakî de dimirî, carinan li ber wan cendekan rûdinî û ji ber hemû dayikan didî girî. Tu wisa yî...

Tu dixwazî ku kevok û başoke têkevin milên hev, dixwazî ku çivîk û kevir bi hev re bifirrin, dixwazî ku gur û mîh bi hev re biçêrin.

Tu li ber wê yek pencereyê jiyanan û cîhanan lê dikî û hildiweşînî. Di îskana çayê ya di destê te de roj hiltê û diçe ava, lê tu ji xeyalavakirinan têr nabî, tu dûr û dirêj li asoyê dinihêrî û timî hin tiştan dipêyî.

Carinan fikr û nêrînen te weke perperokên bêdemsal in, li ber bayê hestên te yên yek rojîn û du rojîn.

A niha payîz hate ber şibakeyê, roj kurt bûn sî dirêj bûn.

Peyv li ser zimanê te diçilmisin. Dengê te li erdê dikeve çî gava ku ji yekê re dibêji "neçe" lê bi dûre dibêji teqez hertişt bi rêya xwe de diçe.

Çirîsk
93

Bi piştî xwe diavêji bextê pirtûkan, da ku te ji ber demê birevînin ber bayê bêdemiyê! Ji ber hindê tu dixwazî ku li cihekî ji xwe dûr bisekinî. Tu dawîya dawîn tê digîhîji ku dem tişteki wisa ye: Hertiştî posîde dike. Dike ku dar ji ber keskahiya xwe, çem ji ber pêl û xûşîna xwe, ewr ji ber xumîna xwe, ba ji ber gobîlîna xwe bireve.

Ma ne te bi xwe gotibû, mirov dikare hertiştî kedî bike ji bilî xwe. Ji lewre herku mirov xwe his dike dîwarekî din di navbera xwe û "xwe" de lê dike.

Heger tu şibakeyeke din di dîwarê xwe de vekî dibe ku qala nejîyîneke dîtir bikî, dibe ku xeydên xwe vebriqînî û bêriya ruhê xwe bikî.



Marka
Rênas Jiyan


Çirîşk
94

navbera herdu lêvên min biqasî gellek " m^2 "yî
hêrsa min "*VIP*"
rûyê min diqelaşt bayekî "*BMW*"yî
peyvên te yên "*ROCH*"î dihatin bîra min a "*UZI*"yî
kenê te "*NOBEL*",
rûyê te "*DWD*",
bi xêra van tiştan ez dibûm "*LCW*"
şeveke "*LEE*"
tanî bîra min "*U2*"yeke "*IRA*"yî
ez bê "*HSBC*"
stûşikestekî "*OECD*"
kesî tu "*IMF*" nedida tukesî
tevî hertîştî jî
bi qurretiyeke "*USA*"yî
& bi kêfeke "*FIFA*"yî
diherikim kolanên "*NATO*"yî
digeriyam bi gavên "*IBM*"î
rewşa min & a dinyayê rewşeke "*WC*"yî
"*UN*" di destên mezinên biçûk de pêlîstokeke şikestî
"*UE*" bi rûjkirina lêvên xwe mijûlbûyî
kesî eşên me nedîtin layiqî tu "*OSCAR*"î
min xwe jî jiyanê "*MP3*" dîkir
min xwe jî cîhanê "*NASA*" dîkir
"*PKK*"eyekê bêdengî "*Dr.*" dîkir
li min hatibû xezebê pêkhatineke "*TC*"yî
ez "*DNA*" dîkirim tenêtiyeke "*AIDS*"î
dimirim, ne hêja bû ku mirina min bibûya "*BBC*"



Destana Şerrê Kundan û Qijikan

R. Yılmaz Gernas Koçer, weşanên Nûbihar'ê, lewnê wê; destan-çirok, 231, 2007, 14 tl.



Biblo Hayat

Metin Aydın, weşanên Babil'ê, lewnê wê; cerribîn, r. 256, 2010, 15 tl.




Dengbêjê Piçûk

Abbas Abbas, weşanên Pêrî'yê, lewnê wê; roman, r. 96, 2005, 7 tl.



Zaman İçinde Bediüzzaman

C. Canlı, Y. K. Beysülen, weşanên İletişim'ê, lewnê wê; jînenîgarî, r. 648, 2010, 25 tl.



Sûka Mirinê

Mehmet Deviren, weşanên Ava'yê, lewnê wê; helbest, r. 63, 2010, 7 tl.



Siyasal İktisat

Dawid Ricardo, wer; Barış Zeren, weşanên İş Bankası'yê, lewnê wê; aborî, r. 385, 2008, 18 tl.



Şerefxanê

Şerefxanê Bedlîsî, wer; Ziya Avcî, weşanên Avesta'yê, lewnê wê; dirok, r. 662, 2007, 60 tl.




Başka Bir Estetik

Alain Badiou, wer; Aziz Ufuk Kılıç, weşanên Metis'e lewnê wê; felsefe, r. 165, 2010, 15 tl.




Zapatista Hikâveleri

Subcomandante Marcos, wer; Çiğdem Dalay, weşanên Agora'yê, lewnê wê; çirok r. 222, 2003, 15 tl.



Cami'eva Risalevan û Hikayetan

Mela Mehmûdê Bazîdî, amadekar; Ziya Avcî, Weşanên Lis'e, lewnê wê; çirok, r. 492, 2010, 17 tl.



Labîrenta Evîna Sêwî

Mehmet Çakmak, weşanên Ronahî'yê, lewnê wê; çirok, r. 111, 2010, 10 tl.



Arapların Gözünden Haçlı Seferleri

Amin Maalouf, wer; Ali Berktaş, weşanên YKY'e, lewnê wê; dirok, r. 265, 2006, 15 tl.

FERHENGOK

Kurdî-Tirkî
Türkçe-Kürtçe

Amadekar: Asya Genim

belki

"Weşanên Belkî"yê

Ferhengok - amadekar; Asya Genim, ziman, 207 rûpel - 5 tl

Kooperatifler Mah. Tren Yolu Sk. Bağırın Apt. No: 1 Ofis/Diyarbakır

Tel&Fax: (0412) 224 47 72 e-mail: cirusko@hotmail.com

www.wesanbelki.com

Kelegiriyên ji bo Simbilên Neserridî/Hamid Omerî
Kî Dizane Huner Çi ye?/Fewzî Bîlge
.../Diyarî Asur
Hestên Naylonî/Feratê Dengizî
Betalî/Bêzar Germ
Piyesa Çirokekê/Hesenê Metê
Marcel Duchamp û "Ready-Made"/Asya Genim
Hevditineke Kaotîk/Robîn Şerna
Çirûskên Nûjeniyê di Helbesta Bakur de -Mem Ronga-/Berken Bereh
Bi Keça Mîr Celadet'î Sinemxan'ê Re Li Ser Bavê Wê Hevpeyvînek
Xerîbek li Gundê Me/Yunus Eroğlu
Hêvî/Paul Eluard
Bir-Çiroka Metoyê Dîn-/Bawer Ronahî
Li Malê.../Marîn Rehman
Şeva ku ji Her Şevan Reştir/Çîdem Baran
Karwanên Stêrkên /Jan Ziryan
Kuştina Cerdonekî/Şengul Ogur
Modernîzm 2/Sidîq Gorican
Ravek/Bahoz Baran
Bûka Qelen Qelew/Bîrbir Birûsk Aryan
Di Helbestê de Çirûskîzm/Janez Sar
Xew(n)a Li Berojka/Înan Eroğlu
Xalê Zilfo/Wehab Mistefazade
Xanax/Janbijan Ar
Girrê Xwedê/Bajar Mîrzeman
Li Ser Wêjeyê bi Nivîskar Ferhad Pîrbal'î re Hevpeyvînek
Medos û Maçên Mîtolojîk/Cihan Roj
Anatomiya Aciziyekê/Rojîn Xewn
Xezo/Seydo Ozkan
Kurdîaxivîn/Sadiq Şen
Jarê/Umît Esen
Dê û Kur/Ehmed Osman
Bi Nêta Cenabet-hildanê Berê'm li Şî'îrê/Kenanê Nado
Otmeyên Hêviyê /Ar-da Janxwar
Çavê Mirinê/Nazê Yerlîkaya
Tu û "Xwe" ya Te/Hecî Nehsan
Marka/Rênas Jiyân

